



Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

MELA, WEKÎ TÎPEKÎ PÊKENOKÊN KURDÎ

Eşref BURAN

15711017

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn

2018

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî Yê Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

MELA, WEKÎ TÎPEKÎ PÊKENOKÊN KURDÎ

Eşref BURAN

15711017

Şêwirmend
Doç. Alk. Dr. Necat Keskin

Mêrdîn

2018

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Mela, Wekî Tîpekî Pêkenokên Kurdî” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- ☐ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim/Projem sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.


.../.../2018

Eşref BURAN

KABUL VE ONAY

Eşref Buran tarafından hazırlanan “**Mela, Wek Tîpekî Pêkenokên Kurdî**” adındaki çalışma, **02/02/2018** tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

Yrd. Doç. Dr. Canser KADAR 
(Başkan)

Yrd. Doç. Dr. Mustafa ASLAN 
BYE

Yrd. Doç. Dr. Nevat KESKİN 

Onay

Enstitü Müdürü

Doç. Dr. M. Nesim DORU

PÊŞGOTIN

Ev tez, melayên ku bûne tîpekî pêkenokên kurdî vedikole û li ser çar beşan hatiye pêşkeşkirin herweha destpêk, encam û çavkaniyên tezê jî hene. Di beşa destpêkê de; agahiyên giştî hatine dayîn. Di beşa yekem de mijar, armanc, çarçove, rêbaz û pirsgerêkên tezê hatine diyarkirin.

Di beşa duyem de; termên folklor, edebiyata gelêrî, tîp û karakter, pêkenok, taybetiyên pêkenokan û taybetiyên pêkenokên kurdî hatin nasandin û di beşa taybetiyên pêkenokên kurdî de, bi mînakên kurdî ev taybetî hatin şênberkirin. Digel vê, derbarê têkiliya pêkenok û cureyên din ên edebiyata gelêrî de agahî hatine dayîn.

Beşa sêyem a bi navê 'Pêkenokên Kurdî' riwange û sepandineke nû ye derbarê pêkenokên kurdî de çimkî xebatên heyî, yan berhevkariyên têkilhev yan jî berhevkariyên tîpî ne. Cara yekem e ku qala polînkirina pêkenokên kurdî hatiye kirin. Qala pêvajoya polînkirina pêkenokan li dinyayê hatiye kirin û cerebeyeke polînkirina tîpî ya pêkenokên kurdî hatiye amadekirin. Piştî şablona polînkirinê, mînakên pêkenokan lê hatin zêdekirin.

Beşa çarem beşa vekolîna pêkenokên melayan e. Derbarê pêkenokên ku mela tê de tîp in û pêkenokên ku mela tê de karakter in mînak hatin dayîn. Di vê beşa vekolînê de, pêkenokên melayan di bin heft binbeşan de hatin vekolan. Pêkenokên melayan; ji aliyê ken, ziman, peyam, rist, dem, cî û karakteran ve hatin analîzkirin, ji bo palpiştîyê mînak lê hatin zêdekirin û şîrove li bin hatin nivîsîn.

Li dawiyê jî encamên ku ji xebata min derketine û pêşniyar hene. Çavkaniyên tezê jî dabeşî sê beşan hatin kirin da ku mifa bêhtir jê bê wergirtin.

Di pêvajoya nivîsîna vê xebatê de gelek kesan bi zanîn û karîna xwe, rê li ber min vekirin, bawerî dan min ku ez ê bikarim pêk bînim û hertim hewla domandina kar li ber min xweş kirin. Di serî de spasdarê mamosteyê xwe yê şêwirmend Doç. Alk. Dr. Necat Keskîn im ku wî bi pêşniyar, xwendinên hûrbîn û hişyariyan rêya min ronî, mêjiyê min zelal kir.

Herweha spasîyên xwe pêşkeşî Cemîl Şelazî, Hoşeng Nîzar Nûh dikim ku yekî ji Başûr yekî jî ji Rojava derbarê pêkenok û xebatên çapkîrî de ez agahdar kirim

û bersiv dan pirsên min. Digel van, spasdarê Mehpûs Serhedî, Mem Mukriyanî, Bahoz Baran, Zozan Güçlü, Abdulkadîr Bîngol, Resûl Geyîk û gotoxên pêkenokan im ku ew bûn alîkar û piştevanê min.

Hevjîna min Bêrîvanê û Arya Laleşa ku berdilka min e, sebreke mezin nîşan da ku ez bikarim karekî serkeftî bikim. Spasiyeke ji dil û can ji bo her duyan.

Wekî ku Seydayê Xanî dibêje; “Vî zemanî her kes mîmarê dîwarê xwe ye.” me got em jî bi vê xebatê kevirekî dayînin ser dîwarê xwe. Hêvî heye ku ev kevir ne şaş û çewt hatibe danîn; xweş hatibe şekirin û bikare bibe qurniyek.

Eşref BURAN

Mêrdîn, 2018

KURTE
MELA, WEKÎ TÎPEKÎ PÊKENOKÊN KURDÎ
Eşref BURAN

Pêkenok, di kurdî de yek ji wan cureyên çalak û berbelav ên edebiyata gelêrî ye. Terma pêkenokê, herçend kenînê bîne bîra mirov jî di paşila vê termê de digel ken, nîşaneyên eş û azar, xem, şadî, mirin, tirs, serkeftin ango hemû hest û hizrên mirovî yên heyî, hene. Mijara vê tezê, pêkenokên kurdî û di pêkenokên kurdî de tîpê mela ye.

Armanca vê xebatê jî; li gor xebatên berdestî yên pêkenokan, diyarkirina tîpên pêkenokên kurdî û teswîrkirina tîpê mela di pêkenokên kurdî de, ye. Sînorê vê xebatê jî pêkenokên ku bi kurdî hatine çapkirin in. Digel palpiştên nivîskî carna sûd ji çavkaniyên devkî jî hatiye wergirtin.

Girîngiya vê xebatê jî ew e ku; ji aliyê rêbaza xwe ve derbarê pêkenokên kurdî de yek ji wan xebatên pêşîn e. Ev xebat bi dane, mînak û encamên xwe xebateke teswîrî ye. Di vê xebatê de, ji aliyekî ve di edebiyata kurdî de danasîna cureya ‘pêkenok’ê hatiye kirin û ji aliyê din ve jî behsa tîpbûna mela ya di pêkenokên kurdî de hatiye kirin.

Piştî van karan diyar bûye ku mela di pêkenokên kurdî de tîpekî berçav, berbelav û naskirî ye. Nîşaneyê vê yekê jî ew e ku li ser melayan gelek pêkenokên kurdî hatine vegêran.

Peyvên Sereke: Kurd, Pêkenokên Kurdî, Tîp, Mela.

ÖZET

KÜRT FIKRALARINDA HOCA/İMAM TİPİ

Eşref BURAN

Fıkra, Kürt Halk Edebiyatının en yaygın ve yaşayan türlerinden biridir. Fıkra kelimesi her ne kadar gülme eylemini çağırırsa da bu türün detaylarına inildiğinde fıkranın gülmeyle birlikte; acı, üzüntü, kaygı, ölüm, korku gibi bütün insani duygu ve düşünceleri barındırdığı görülür. Bu tezin konusu, Kürt fıkraları ve Kürt fıkralarında hoca/imam tiplmesidir.

Kürtçe yayınlanmış fıkra kitaplarındaki Kürt fıkra tiplmelerini belirtmek ve hoca tipinin bu tiplmeler arasındaki yerini ve önemini betimlemek bu çalışmanın temel amacıdır. Tezin sınırı yayımlanmış Kürt fıkralarıyla sınırlı olup nadiren sözel kaynaklardan yararlanma yoluna gidilmiştir.

Kürt fıkraları hakkında yazılmış detaylı çalışmalardan biri olması, bu çalışmanın asıl önemini oluşturmaktadır. Veri, örnek ve sonuçlarıyla betimleyici yöntemden yararlanılan bu çalışmada, bir taraftan fıkra kavramı ve türü hakkında bilgi verilirken diğer taraftan ‘mela’nın nasıl bir fıkra tipi olduğu belirtilmiştir.

Çalışmanın sonucunda, ‘mela’nın Kürt fıkralarında yaygın ve bilinen biri olduğu ve tiptiği; ‘mela’ tipi üzerinden anlatılan birçok fıkranın da bunu destekler mahiyette olduğu görülmüştür.

Anahtar Kelimeler: Kürt, Kürtçe Fıkralar, Tip, Hoca/İmam

ABSTRACT
THE HODJA STERETYPE IN KURDISH ANECDOTES (JOKES)

Eşref BURAN

Anecdote is one of the most common and living type of Kurdish Folklore. Although it evokes the act of laughing, the details related includes suffering, sadness, anxiety, death, fear, all human emotions and thoughts. The subject of this thesis is the type of hodja/mollah in Kurdish anecdotes.

The objective of this study is to indicate the Kurdish anecdotes types in the published Kurdish joke books and to define the position of the hodja's type among these various types and the main themes. The limit of the thesis is restricted to published Kurdish anecdotes and verbal sources rarely has been used.

The fact that it is a detailed and one of the study about the Kurdish anecdotes constitutes the main significance of this study. This study, which utilizes descriptive method with data, examples and conclusions, it, on one side, gives information about the concept and type of an hodja, while on the other side, it states how "hodja's" is an anecdote.

As a result of the work, 'hodja' is a shared and well-known person in Kurdish anecdotes, it has been seen that many of the fictions that are described through the hodja's type also support this.

Key Words: Kurd, Kurdish anecdotes, Type, Mollah/Hodja

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	III
ÖZET	IV
ABSTRACT	V
NAVEROK	VI
KURTEBÊJE	IX
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	4
MIJAR, ARMANC, RÊBAZ	4
1.1. MIJARA LÊKOLÎNÊ	4
1.2. ARMANC Û GIRÎNGIYA LÊKOLÎNÊ	5
1.3. SÎNOR Û ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ	5
1.4. RÊBAZ Û TEKNÎKÊN LÊKOLÎNÊ	7
1.5. PIRSGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ	8
BEŞA DUYEM	10
ÇARÇOVEYA TÊGEHÎ Û TEORÎK	10
2.1. FOLKLOR	10
2.1.1. Edebiyata Gelêrî	12
2.1.2. Pêkenok	14
2.1.2.1. Taybetiyên Pêkenokê	16
2.1.2.2. Taybetiyên Pêkenokên Kurdî	18
2.1.2.3. Têkiliya Pêkenokê bi Cureyên Din ên Edebiyata Gelêrî re	21
2.1.2.4. Têkiliya Pêkenokê bi Çîrokan re	21

2.1.2.5. Têkiliya Pêkenokê bi Biwêj û Gotinên Pêşyan re	22
2.1.3. Tîp û Karakter	23
2.1.4. Mela	26
BEŞA SÊYEM	29
PÊKENOKÊN KURDÎ	29
3.1. PÊVAJOYA POLÎNKIRINA PÊKENOKAN LI DINYAYÊ	29
3.2. PÎVANÊN POLÎNKIRINA PÊKENOKAN	32
3.2.1. Polînkirina Mijarî	33
3.2.2. Polînkirina Ristinî	34
3.2.3. Polînkirina Tîpî	36
3.3. CEREBEYEKE POLÎNKIRINA TÎPÎ YA PÊKENOKÊN KURDÎ	36
3.3.1. Şablona Polînkirina Tîpî ya Pêkenokên Kurdî	37
3.3.2. Şîrove û Mînakên Şablonê	38
BEŞA ÇAREM	66
MELA WEKÎ TÎPEKÎ DI PÊKENOKÊN KURDÎ DE	66
4.1. KENÊ PÊKENOKÊN MELAYAN	67
4.1.1. Rewş û Bûyera Kenokî	68
4.1.2. Peyv û Hevoka Kenokî	68
4.1.3. Tîpê Kenokî	69
4.2. ZIMANÊ PÊKENOKÊN MELAYAN	70
4.2.1. Gotinên Pêşyan û Biwêj	71
4.2.2. Gotinên Qetanî û Dijûn	73
4.2.3. Gotinên Birîtm	76
4.3. PEYAMÊN PÊKENOKÊN MELAYAN	78
4.3.1. Pêkenokên Bêpeyam	79
4.3.2. Pêkenokên Bipeyam	79
4.3.2.1. Rexnekirina Tiştên Nebaş	80
4.3.2.2. Pesindana Tiştên Baş	81
4.4. RISTA PÊKENOKÊN MELAYAN	82
4.4.1. Destpêka Pêkenokên Melayan	82
4.4.2. Geşedana Pêkenokên Melayan	83
4.4.3. Encama Pêkenokên Melayan	85
4.5. DEMÊN BÛYERÊN PÊKENOKÊN MELAYAN	86

4.5.1. Pêkenokên Melayan ên Demdiyar	89
4.5.2. Pêkenokên Melayan ên Demnediyar	90
4.6. CIYÊN PÊKENOKÊN MELAYAN	91
4.6.1. Pêkenokên Melayan ên Cîdiyar	92
4.6.2. Pêkenokên Melayan ên Cînediyar	94
4.7. KAREKTERÊN PÊKENOKÊN MELAYAN	94
4.7.1. Karekterên Mirov	95
4.7.1.1. Lawê Mela	97
4.7.1.2. Jina Mela	99
4.7.1.3. Yara Mela	100
4.7.1.4. Melayên Din	100
4.7.1.5. Feqiyên Mela	101
4.7.1.6. Cîranên Mela	102
4.7.1.7. Cimaeta Mela	103
4.7.1.8. Hin Karekterên Din	103
4.7.1.9. Karekterên Bênav	105
4.7.2. Karekterên Ajal	106
4.7.2.1. Ker	107
4.7.2.2. Golik	108
4.7.2.3. Hin Karekterên Din	109
ENCAM	111
ÇAVKANÎ	113
MALPER	122
KESÊN JÊDER	123
PÊVEK	124
BÎBLIYOGRAFYAYA PÊKENOKÊN KURDÎ	124

KURTEBÊJE

amd. : amadekar

ber. : berhevkar

bd. : bêdîrok

bnr. : binêrin

ed. : edîtor

îng.: îngilîzî

kur.: kurmancî

r. : rûpel

trk.: tirkî

wd. : wekî din

wer. : werger

vgz. : veguhêzer

DESTPÊK

Kurd, yek ji wan gelên Rojhilatê Naverast e ku digel gelên din ên Rojhilata Naverast hîn jî li ser erd û axa xwe dijî. Di vê pêvajoyê de gelek tiştên curbicur hatine serê vî gelî; carna bûye serfirazê şer û pevçûnan carna jî bûye qurbanîyê talan, ferman û komkujiyan. Derbarê kurd û dîroka kurdan de zanyar Lazarev di wê fikrê de ye ku, “kurd neteweke niştacî û eslî ya Rojhilatê Naverast e.” (2001:9).

Ev gelê dêrîn xwedî folklor û edebiyateke gelêrî ya dewlemend e û “pisporê folklorê yê ermenî A. T. Ganalanyan vê dewlemendî û rengîniya folklorê kurdî wekî ‘ansîklopediya civata kurd ya jiyanê’ bi nav dike (vgz Alakom, 2013:11).

Xebatên derbarê folklor û edebiyata gelêrî ya dewlemend de digihên heta bi Mela Mehmûdê Bazidî (Keskin, 2017; Yıldırım, Pertev û Aslan, 2013). Ji Bazidî heta bi îro piraniya xebatên derbarê edebiyata gelêrî ya kurdan xebatên berhevkarîyê ne. Christine Allison derbarê vê mijarê de weha dibêje:

“Piraniya karên ku folklorzanên kurd kirine, tenê girêdayî berhevkirina mijar û materyalên zargotinê ye û wan kêman caran lêkolîn der barê wan mijar û materyalan de pêk anîne. Li gel ku wan qeydkirinên girîng der barê zargotinê de dabûn kirine, lêbelê ew kar bi piraniya xwe ji cemawerên ku berê van cureyên xwecihî nas dikin û ji piraniya kesên biyan re jî neşirovekirî mane.” (2016).

Edebiyata gelêrî ya kurdan digel ku bi rêk û pêk nehatiye berhevkirin jî dîsa mirov di her cureyê de rastî gelek keresteyan tê. Keresteyên hin cureyên edebiyata gelêrî -gotinên pêşîyan, biwêj, pêkenok, çîrok, mamik, nîfir û dia, mesele- berbelav in û gelek kes dikarin nimûneyên wan bidin; hin jê jî -destan û kilam- ne ewçend berbelav in; vegêran û îcrakirina wan her kes nikare. Pêkenok yek ji wan cureyên berbelav e ku di cîmaet û xweşbêjan de xelkê ew vegêrane û neqlî nîfşên nû kirine.

Her kesê ku pêkenok vegêraye, rengê xwe daye vê keresteyê. Geh tîpê pêkenokê guhertine, geh karakter guhertine, geh cî û geh jî peyvên pêkenokê. Bi van guhertinan, ji pêkenokekê gelek varyantên din derketine. Zêdebûna varyantên pêkenokan bûye sedema alozî û gengeşiyên polînkirina vê cureya edebiyata gelêrî. Ku mirov li xebatên heyî yên polînkirina pêkenokan dinêre; polînkirinên mijarî, ristinî û

tîpî, polînkirinên berçav û sereke ne (Uçar, 2011:92; Akpınar 2007:20; Özünlü, 1999:47-159).

Folklornasên ku viyane pênasêya pêkenokê bikin, li ciyekî pênasêya xwe amaje pê kirine ku pêkenok di ser tîpan re tên vegêran û bi dûvdirêjî qala rola tîp a di vegêrana pêkenokê de kirine. Herçend barê zêde li ser tîpên naskirî be jî barekî ku hay û baya kesî jê tune li ser piştê tîpên herêmî û deverî û yên din e. Cîguherîna tîpan a li dever, herêm, welatan wekî taybetiyeke sereke ya pêkenokan e.

Di pêkenokên kurdî de mela tîpekî pêkenokan e. Gelek pêkenokên kurdî di ser vî tîpî re hatine vegêran. Ji ber ku mela di nav civaka kurdan de ‘tîp’ekî xuya ye, ev yek bi rêya wî hatine gotin. Di pêkenokan de mela carna bi xwe dibe ‘obje’ û carna jî ‘subje’ya pêkenokê. Pêkenok wekî keresteyeke edebiyata gelêrî, di xwe de gelek mînakên keresteyên zimên jî dihevin.

Ji ber ku hemû keresteyên edebiyata gelêrî li ser hîmê zimên pêk hatine, divê bala mirovî li ser zimên be. Di pêkenokan de jî mirov rast li gelek tiştan tê. “Hinek hevokên ku ji pêkenokan mane, bi wextê re bûne gotinên pêşyan û biwêj.” (Ekici, 2009). Di hinek pêkenokan de jî *gotinên qetanî*¹ û hin dijûnên wisa hene ku mirov fedî dike ku wan bibihîse. Herçend ev gotin tê de hebin jî, li nav cimeatê bi eşkerayî tên gotin û hemû kesên hazir -çi jin çi mêr- pê dikenin. Digel van taybetiyên zimên ên pêkenokên melayan, xaleke din heye ku divê bête behskirin. Ev jî dem û ciyê bûyera pêkenokê ye.

Çawa ku di hemû *vegêranên*² gelêrî de dem û ciyê vegêranê yên cuda cuda hene, ev di pêkenokan de jî wisa ye. Di hinek pêkenokan de cî û dema rewş û bûyerê nehatine diyarkirin, di hinek pêkenokan de jî cî û dema rewş û bûyerê diyar e; ev cî û dem geh bi peyvekê geh bi hevokê geh jî bi rêya hin bîrxistanan hatine diyarkirin.

Divêtî pê heye ku mirov bi çend gotinan behsa karakterên pêkenokan bike. Çimkî tîp û karakter carna tevlihev dibin lewra lazim e mirov hûrbîn be. Karakter ‘alîkarên tîpan’ in û di pêkenokê de rola sereke ya ‘tîp’an e. Mela carna bûne ‘tîpên pêkenokan’ carna jî bûne ‘karakterên pêkenokan’. Karakterên pêkenokan du beş in; hin jê mirov hin jê jî ajal in. Ji bo karakterên mirov lawê mela, jina mela; ji bo karek-

¹ Gotinên qetanî: Peyv û qalibên taybet ên ku ji aliyê mirovên ji rêzê ve tên bikaranîn. Zimanê gelêrî yê bêsansur û rasterast. Îng: Slang. Trk: Argo.

² Vegêran: Vegotin, tiştên ku tê vegotin û qalkirin, ên mîna çîrok, mesele, destan û pêkenokê. Îng: Narrative. Trk: Anlatı.

terên ajal jî ker û golik dikarin wekî mînak bîn nîşandan. Piştî van kurteagahiyan jî bo kûrbûna lêkolînê divêti pê heye ku mijar, armanc û rêbaza xebatê bîn diyarkirin.



BEŞA YEKEM

MIJAR, ARMANC, RÊBAZ

Di vê beşe de bi giştî behsa mijar, armanc û girîngiya lêkolînê, sînor û çarçoveya wê, rê û rêbazên ku hatine bikaranîn û herweha pirsgrêkên ku di pêvajoya nivîsandina xebatê de derketine meydanê, hatiye kirin.

1.1. MIJARA LÊKOLÎNÊ

Pêkenok wekî cureyeke edebiyata gelêrî, “neynika civat û gelan e. Ew, problem û daxwazên gel bi awekî kenîn û yarî tîne zimên û qerektêrêkî netewî dide wan. Pêkenî rexneyên gel in. Lê rexneyên ne adetî ne, yên lêzêde û mezinkirî ne.” (Tîgrîs û Motkî, 1989:5).

Yıldırım jî wisa qala pêkenokê kiriye; “Pêkenok, bi saya kompozîsyona xwe ya cuda ji cureyên din ên edebiyata gelêrî vediqete. Di nav vê kompozîsyona wê de; awayê şayesandinê, hîlbijartina mijarê, awayê diyalogan, diyarkirina armancan, cudatiyê bexşî vê cureyê dike (1998:221). Digel pêkenokên xelkên din, pêkenokên kurdî jî cureyeke berbelav e di nav edebiyata gelêrî û xelkê de.

Di nav kurdan de pêkenok cureyeke hezkirî ye, Bozarslan derbarê vê de dibêje ku, li Kurdistanê ciyê ku pêkenok lê tunebin û civata pêkenok lê neyê gotin tune ye (2007:5). Di pêkenokên kurdî de, tê dîtin ku gelek pêkenok derbarê melayan de tên gotin. Di pirtûka *Cami'eya Risaleyan û Hikayetên Bi Zimanê Kurmancî* a Mela Mehmûdê Bazidî de -ku ev pirtûk yek ji wan pirtûkên sereke yên folklora kurdî ye- tê dîtin ku sê hikyat derbarê melayan de hene (2010:59-69).

Mela, alimê diyanetê (Demîrhan, 2007:241) di nav piraniya kurdan -ku bawermendê ola îslamê ne-³ de xwedî roleke girîng in. Ev girîngiya wan ji ber peywira wan a di ola misilmantiyê de ye ku rêberîyeke dînî dikin ji bo xelkê. Secadî ev girîngî, “wekî maleke ku bavê wan mirî û tim qala bavê xwe dikin” diyar kiriye û gotiye, “kurd di axaftina xwe de gelek caran dibêjin, mela wisa kir an mela wisa got, an jî mela got filan û bêvan” (2007:8).

³ Derbarê hejmara kurdên misilman de daneyek berdest tune ye, gelek caran tê gotin ku; “piraniya kurdan baweriyê bi dînê îslamê tînin.” Omerxalîyê jî gotiye ku; “Îro bêhtir ji sêyan duyê hemû kurdan bawerî li îslamê tînin. Piraniya kurdên misilmanên sunne ne, lê nifûseke kurdên şî'e jî heye (2007:13).

Herçend kurdan ev qedr û qîmet dabe melayên xwe jî, di ber de nîrê rexneyê jî ji ser stûyê wan nedaye alî. Melayên kurd bi başî û nebaşî, bi zanabûn û nezani, bi ehlaq û bêehlaqiya xwe ango bi hemû xêr û gunehên xwe bûne kesekî berçav ên vê civakê.

Ev berçavbûna melayan a di nav civakê de, ji rewşên şênber derbasî rewşa razber jî bûye. Rêz, hurmet û qedirgirtina berçav neqlê edebiyata gelêrî jî bûye. Me jî xwest em; bi dane, mînak û şîroveyan *riwangeyeke*⁴ din bidin pêşiya xwe û bidin pey pîrsa, ka gelo mela di pêkenokên kurdî de wekî tîpekî çawa cî digirin û ev cure pêkenok ji aliyê naverokê ve xwedî çi taybetiyan in?

1.2. ARMANC Û GIRÎNGIYA LÊKOLÎNÊ

Armanca vê xebatê; li gor xebatên berdestî yên pêkenokan, diyarkirina tîpên pêkenokên kurdî û teswîrkirina tîpê mela di pêkenokên kurdî de, ye.

Girîngiya vê xebatê jî ew e ku; derbarê pêkenokên kurdî de lêkolîneke birêkûpêk nehatiye kirin herweha tîpên pêkenokên kurdî nehatine diyarkirin, pêkenokên kurdî nehatine polînkirin. Di vê xebatê de, ev xal yek bi yek hatine veçirandin; bi mînak û şîroveyan çarçove hatiye qeyîmkirin.

1.3. SÎNOR Û ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ

Çarçoveya giştî ya vê xebatê di sernavê xebatê de herçend hatibe diyarkirin jî, ji bo sûdwergertineke baştirîn divêtî bi eşkerakirina hûrguliyên heye. Di rêzkirina van sînoran de em ê ji tixûbê fireh ber bi tixûbê teng ve bên.

Divê bê gotin ku piraniya vê xebatê li ser berhemên çapbûyî ye. Pêkenokên ku di pirtûk, kovar, înternet û rojnameyan de hatine çapkirin bingeha vê xebatê ne ji lew re di gelek ciyên xebatê de amajê pê hatiye kirin ku ‘li gor xebatên berdestî’ tişt hatine gotin. Teqez gelek tîp, tîpên mela û pêkenok hene di nav civatê de, lê ji ber ku derbarê wan de xebat nehatine kirin, me ew li derveyî xebata xwe hêlan. Lê belê carnan pêdivî pê çêbûye ku mifa ji xebatên neçapbûyî, berhevkarîyên neçapkirî jî hatiye girtin.

Piraniya kurdan, di nav pênc netewe-dewletan de dijîn û ji aliye ol, bawerî, çandê ve cudabûn di navbera kurdan de heye. Riwangeya vê xebatê ne zaravayeke

⁴ Riwange: Perspektîf.

kurdî, ne jî bi tenê baweriyêke kurdan e; kurd, wekî gelekî mijara vê xebatê ne. Helbet ji ber ku zimanê teze bi kurmançî ye bêhtir sûd ji kurmançî hatibe girtin jî lê ti zarava nehatiye piştguhkirin. Bi qasî ku derfetan rê daye berhemên bi van zaravayan hatine nivîsîn wekî çavkanî hatine bikaranîn. Herweha wergera van jêgir û mînakên ji zaravayan jî nehatiye kirin çimkî di wergerê de îhtimal heye ku pêkenokê xerab bibe û hêmana ken wînda bibe.

Kakilê vê xebatê ‘pêkenok’ e. Herçend di hin beşan de ji bo zelalkirina mijarê berawirdiyek di navbera cureyên edebiyata gelêrî de -çîrok û pêkenok, çîrokên gelêrî û pêkenok- hatibe kirin jî mijara eslî ‘pêkenok’ in. Hemû pêkenokên ku navê mela tê de derbas dibe jî nakevin çarçoveya vê xebatê lê pêkenokên ku mela tê de wekî tîp in di sînorê vê xebatê de ne.

Di vê xebatê de, ji terma ‘pêkenokên kurdî’ divê her pêkenoka bi kurdî hatibe gotin bê famkirin. Ji lew re jî pêkenokên kurdî yên ku bi zimanekî din hatine çapkirin û nivîsîn li derveyî sînorê vê xebatê ne.⁵

Di vê xebatê de bal li ser ‘mela’yan e. Melatî peywireke olî ya misilmanan e û mela jî ew kes in ku bi wê peywîrê radibin. Di nav gelê kurd de wekî bawermendên ola îslamê bawermendên hin ol, bawerî û terîqetên din jî hene. Kurdên yaresanî, kurdên elewî, kurdên êzidî, kurdên cihû û kurdên zerdeştî jî hene (Omerxalî, 2007; Amedî, 1991; Minorsky, Boîs û MacKenzie, 2004). Ji ber cudabûna ol û baweriyê, wan bawermendan hin navên din li peywîrdar û berpirsên bawerîya xwe kirine. Pêkenokên derbarê ‘şêxên êzidî’, ‘babayên yarsanî’ û ‘pîrên elewî’yan de ji derveyî xebatê ne.

Hûrguliyêke din jî heye ku pêwîst e qala wê jî bê kirin. Di nav kurdan de bikaranîna berbelav a vê peyvê “mela” ye. Digel vê ji vî kesê dersdar û peywîrdarê ola îslamê re ‘**seyda, îmam, mele, melle**’ û ‘**xoce**’ jî tê gotin. Pêkenokên ku ev nav tê de wekî tîp in di nav çarçoveya xebata me de ne.

Herweha ev xebat, xwe ji pîrs û nîqaşên “ev pêkenok a kîjan gelî ye?”, “Gelo Mela Nesredîn kurd e, tirk e yan ereb e?”, “Filankes li ku hatiye dinyayê?”, “Ev tîp, tîpekî kurdî ye yan yê gelekî din e?” û “Kê ji kê diziye?” dûr disekine.

⁵ Li ber destê me sê pirtûkên bi vî awayî hene: Alhuseynî, Ş. T. (2009).; Altıntaş, (1995).; Ermiş, (2000). Pirtûka ewil bi erebî hatiye nivîsîn ên din bi tirkî hatine nivîsîn û çapkirin. Di van her du pirtûkên dawîn de, di piraniya pêkenokan de, kurd tîpekî; nezan, paşverû, perehez û ezezok in.

1.4. RÊBAZ Û TEKNÎKÊN LÊKOLÎNÊ

Her xebatek zanistî divê piştî xwe bide rêbaz û teknîkên zanistê. Di xebatên derbarê zanistên civakî de, carna ne tenê rêbaz û teknîkek, rêbaz û teknîkin digel hev jî dikarin bî bikaranîn. Di vê xebatê de jî ne tenê rêbazek hin rêbaz digel hev hatine bikaranîn.

Mijarên di vê xebatê de bi rêbaza *deductionê* ango ji hikmên giştî ber bi darazan, ji darazan ber bi mînakên, ji mînakên ber bi tîp, karakter û hevokan, ji hevokan ber bi peyv, kîte û herfan, hatine vegotin.

Digel vê rêbazê, rêbaza *teswîrî* (description) hatiye bikaranîn ku ew jî li gor xebatên berdest -li ser deqan- teswîrkirina pêkenokên kurdî û herweha destnîşankirina tîpê mela ye. Loma ji xebateke berawirdiyê bêhtir xebateke teswîrî ye. Lê digel vê jî bi mijarê ve girêdayî, li hin ciyan berawirdî hatiye kirin. Li ser deqên pêkenokan jî *analîza binyadî* hatiye kirin.

Di vê xebatê tê de bi sê teknîkan agahî hatine bidestxistin. Teknîka ewil û gelemper ew bû ku ji pirtûk, gotar, rojname û înternetê agahiyên weşandî/çapkirî hatin girtin. Teknîka duyem jî ew e ku bi rêya înternetê ji kesên agahdariya şexsî hat girtin, a sêyem jî ew bû min bi xwe -5 pêkenok- berhevkarî kir.

Di vê xebatê de, ji 21 pirtûkên ku bi navê pêkenok çap bûne sûd hatiye wergirtin. Ji van 21 pirtûkan 16 bi kurmancî, 4 bi kirmanckî, 1 jî bi soranî ye. Digel van pirtûkan jî gelek pêkenokên kurdî di nav guldesteyên zargotinê de jî hatine weşandin. Ji wan pirtûkan jî sûd hatiye wergirtin û hejmara wan jî 9 e; 6 bi kurmancî ne, 2 bi zaravayê kirmanckî, 1 jî bi zaravayê soranî ye ku ev pirtûk -*Rîştey Mirwarî*- wekî 8 cildan hatiye çapkirin û tê de bi sedan pêkenokên derbarê melayan de hene. Digel van kêmbê jî ji pêkenokên di kovar û rojnameyan de çap bûne jî sûd hatiye wergirtin.

Di vê xebatê de bi giştî ji zaravayên cuda 123 pêkenok hatine bikaranîn. Ji van 123 mînakên pêkenokan 10 bi soranî, 5 bi kirmanckî, 108 jî bi kurmancî ne. Sebeba kêmbê bikaranîna mînakên ji kirmanckî û soranî hem kêmbûna çavkaniyan hem jî zimanê teze bi kurmancî bû.

Ji 123 pêkenokan, 118ê van pêkenokan; di pirtûk, kovar an înternetê de hatine weşandin, 5ên mayî jî berhevkarîyên neçapbûyî ne. *Gotox*⁶, dîrok û berhevkarên van berhevkarîyên neçapbûyî jî hatine nîşandan da ku bibin çavkaniyeke zanistî.

Divê ev xal jî bê destnîşankirin ku, di bikaranîna pêkenokan a nav xebatê de, bi ti awayî desttêwerdan nehatiye kirin, çewtiyên nivîsê hebin jî wekî xwe hatine hiştin û ji bo ku pêkenok bi gotinên din re têkel nebin jî îtalîk hatine nivîsîn.

1.5. PIRSGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ

Di pêvajoya nivîsîna vê xebatê de, pirsgirêka ku ewilî derket pêşîya min -bi min girîngtirîn pirsgirêk bû- nebûna arşîveke kurdî ya xebat û pirtûkan bû. Ji lew re fersenda bidesxisitina hin pirtûkên ku diviya teqez min ew bixwendina neket destê min. Ev pirtûkên han ku li başûr çap bûne; pirtûka Ehmed Şukrî ya bi navê *Pêbkene* ku di sala 1959an de çap bûye, pirtûka Gîwî Mukriyanî a bi navê *Melay Meşhûr* ku di sala 1976an de çap bûye û pirtûka ku derbarê tîpê Xale Receb de Cemal Baban nivîsiye, hin ji wan pirtûkan in. Digel vê hin pirtûkên pêkenokên kurdî ku li Ewropayê çap bûne jî nehatin peyda kirin; pirtûka Gabar Çiyan a bi navê *Ji Dîna Dîntir* ku di 1995an de çap bûye, pirtûka Mahmûd Lewendî a bi navê *Mala Xwedê* ku di sala 1992yan de çapbûye herweha pirtûka Şoreş Reşî ya bi navê *Dilopok Ji Pêkenokên Kurdên Anadolê* ya ku di sala 2012an de çap bûye sê mînakên vê rewşê ne. Bi-destxistin û xwendina wan dê sûd bidaya vê xebatê.

Herçend gelek pirtûkên kurdî bi navê vê mijarê hatibin nivîsîn jî derbarê analîz, şîrove, girîngî û teoriya vî cureyî de; ji xeynî gotarekê û hin pêşekan⁷ tiştekî berdest tune bû. Nebûna rêbereke teorîk û akademîk bû sebeb ku gelek caran asê bibim û di nav deryaya pêkenokan de wekî nemelevanekî bimînim.

Di pirtûkên berdest ên pêkenokên kurdî de rast lê hatim ku, ka çawa nûserên van berheman herçend berhemên xwe bi navên xebatên berhevkarîyê çap kiribin jî di eslê xwe de pir kêr nûseran berhevkarîyeke rasterast -Heciyê Cindî yek ji wan e- kiriye; piraniya nûseran, pêkenokên di pirtûkên xwe de ji nû ve -ne ji devê xelkê, ji devê xwe- nivîsîne; carnan peyv û qalibên nû xistinê, carna hin peyv sansur kirine

⁶ Gotox: Gotinbêj, bêjer, kesê jêder, çavkanî; vebêjerê/a keresteyên edebiyata gelêrî.

⁷ Gotara dûrdirêj a Î. M. Resûl di pirtûka *Edebî Folklorî Kurdî* de. Pêşekên M. Emîn Bozarslan ku di du pirtûkên -*Masîyên Bejî* û *Melayê Meşhûr*- wî yên berhevkarîyê de hatine nivîsîn, pêşeka Gîwî Mukriyanî ya pirtûka *Bo Pêkenîn* û hinên din. Jixwe di gelek ciyên vê xebatê de mifa ji van çavkaniyan hatiye girtin.

carna jî bi awayekî edebî ji nû ve nivîsîne. Ango bi zanabûn an jî bêzanabûn xebatên xwe yên folklorê kirine *fakelore*.⁸

Di pirtûkên berdest de tê dîtin ku weşangerên kurd beyî ku derbarê mijara hatiye ber destê wan de lêkolînekê bikin, rasterast ew weşandine; di pêvajoya xebatê de rast lê hatim ku gelek pêkenok ji hev hatine girtin -kopîkirin- navê herê, tîp û karakteran hatiye guhertin û bi vî awayî hatine çapkirin. Ev yek jî wisa dike ku mirov nema dizane kîjan ji kîjanê hatine girtin û ev jî ji xebatên zanistî re dibe asteng.

Piştî van gotinan, lazim e ku kêmasiyên xebatê jî bînin gotin. Ji ber nebûna derfetan, min nekarî sûdê ji pêkenokên zaravayê hewramî bigirim. Herweha ji kurdên Îranê -çi kurmanc, çi soran- pêkenok negihîştin ber destê min. Ev her du xal divê wekî kêmasiyên vê xebatê bînin qebûl kirin.

⁸ Fakelore: Folklorê qelp, materyala folklorê a ku hatiye guhertin. Ev têgeh cara yekem folklornasê Amerîkî R. M. Dorson di gotara xwe ya kovara *American Mercury* de (1950) bi kar aniyê.

BEŞA DUYEM

ÇARÇOVEYA TÊGEHÎ Û TEORÎK

Di vê beşê de, bi giştî derbarê termên folklor, edebiyata gelêrî, pêkenok, tîp, karakter û mela de agahî hatine dayîn herweha derbarê taybetiyên pêkenokê û taybetiyên pêkenokên kurdî de jî agahî hatine dayîn û bi mînakên hatine şîrovekirin. Digel vê yekê jî têkiliya pêkenokê ya bi cureyên din ên edebiyata gelêrî re hatiye destnîşankirin.

2.1. FOLKLOR

Folklor, hem bi nav û pênaseya xwe hem jî naverok û têkiliya wê ya bi zanistên din re bûye behs û mijara germ a civatên zana û folklornasan. Yek ji van nîqaşan jî ew e ku destpêka xebatên folklorê ye. Boratav destnîşan dike ku, dîroka berhevdana keresteyên folklorê bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e (2011:7). Hin lêkolîner jî vê dîrokê dibin heta Pausanîsê Yewnan. Ramazan Pertev derbarê vê mijarê de weha dibêje:

“Herwekî tê zanîn xebatên li ser folklorê xwediyê dîrokeke kevin in. Hîn ji serdema antîk ve kesên wekî Pausanis, Herodot, Strabon, Plutarch çavdêriyên xwe yên li ser gel û erdnîgariyên cûrbicûr nivîsîne.” (Pertev, 2015:248).

Arnold van Gennep jî weha behsa destpêka xebatên zanistî yên folklorê dike: “Mirov dikare mêtîjûya xebatên zanistî heta xebata Thomas Brown a li Îngîlîstanê di sala 1646an de derçûye û xebata Jean-Baptiste Thiers a li Fransayê di sala 1667an de derçûye, bibe.” (2011:153).

Dorson jî yek ji wan folklornasên navdar e ku wî jî weha qala folklor û sehaya folklorê kiriye; “Di sedsala 19emîn de, gava antîkvanên (kevnezan, kevnedar) li Ingîlîstanê û zimanzanên Germenîstanê jî nêzikayî ve dest bi nêrîna li terza çînen xwartir kirin, folklor wek sehayeke xwendinê derket holê.” (2017:21).

Derbarê bikaranîna terma folklorê de mirov dikare bibêje ku; folklor, ji du peyvên zimanê îngîlîzî pêk tê. Folk, gel e û lore jî zanîn, agahî ye. Ev her du peyv jî bi hevdu re peyva “Zanîna Gel” diafirînin. Ev peyv cara yekem di sala 1846’an de ji

aliyê folklornasê Ingilîz William John Thoms ve hatiye bikaranîn.” (Çobanoğlu, 2012:19; Yıldırım, 1998:39; Keskîn, 2013).

Antropolog Bascom, folklor wekî “antropolojiya çandî” (2006:53), Propp wekî “hemû afirandinên civakê û diyardeyeke navneteweyî” (1998:11-12), Sokolov jî wekî “çek û derbirîna şerê çînî” bi nav kiriye û gotiye “Folklor, ne tenê olana rabirdûyê ye, herweha dengê berz ê îro ye jî” (2009:21).

Dan Ben Amos, derbarê pênasikirina folklorê de weha dibêje; “Pênaseyên folklorê, wekî guhertoyên çîrokeke ku baş tê zanîn zêde û ji hev cuda ne. Dijwariyên ku di pênasikirina folklorê de derdikevin, dijwariyên rastî û bingeîn in û sebaba van dijwariyan jî di xwezaiya vê zanistê de heye.” (2006:27). Ben Amos piştî vê tespîta xwe ji bo berterafkirina van dijwariyan berê xwe daye xalên hevpar ên van pênaseyan û rêyeke nû li ber xistiye.

“Digel van cudahiyên di pênaseyan de, sê xalên bingeîn ên van pênaseyan hene ku hemû pênase li ser hemfîkr in; folklor ji van sê tiştan yek e: tevayiya agahiyan, awayekî hizirînê yan jî cureyeke hunerê ye.” (Ben Amos, 2006:29).

Digel nîqaşên li ser xebatên destpêkê, nîqaşa nav û naveroka folklorê jî bûye mijara nîqaşê. Hikmet, sebaba vê yekê wekî “firehiya bêsînora a têgiha folklorê nîşan daye.” (2016:17). Gotara Alan Dundes a bi navê *Folklor Çi Ye?* (2005)⁹ bûye çavkanîyeke sereke ji bo lêkolînên derbarê naveroka zanista folklorê de. Dundes, di vê gotara navborî de, di lîsteya ku daye de ji mîtan bigere heta gotinên ji bo ajalan tînin gotin, ji nîfir û diayan bigere heta bi nexşên çîten dora malan, berfireh kiriye naveroka vê folklorê.

Helbet bi derengî be jî kurd jî bûne haydarê vê zanistê. Celadet Elî Bedirxan di Hawarê de weha qal dike:

“Ev bêje di eslê xwe de îngilîzî ye. Lê îro ketiye hemî zmanên dinyayê. Ji lewre me jî ew xistiye zmanê xwe. Ji xwe kurdên Qefqasê beriya me ev bêje xistine zmanê me û kitêbek bi navê “Folklorê Kurdmançî” belav kirine. Folklor tevayiya adet, çîrok û stranên miletekî ye. Ew adet, çîrok û stranên ko ji nav xelkê bi der ketine û di dora nîşan de bi ser ve ketine û gihaştine nîfşên nû.” (1941:514).

Sadiq Bahaeddîn Amêdî jî weha şîrove kiriye folklor û naveroka wê: “Folklor, bi rastî şehristaniya rasta miletî ye. Folklor wekî xwe binkê ye (...) yan jî wekî nîvîşteka xumalî ye, hemî zanistêd millî tê da tene xwendin.” (2013:11).

⁹Ev gotar, di pirtûka *The Study of Folklore* de, di sala 1965an de hatiye çapkirin.

Ev kurtepênaseya Bascom a ku dibêje; “folklor, nasîna xelkê ye” (2014:35) çarçoveya vê têgehê bi giştî dikare îzah bike.

2.1.1. Edebiyata Gelêrî

Edebiyata gelêrî, ew edebiyat e ku afirînerê wê xelk e. Elçin, hemû keres-teyên edebî yên kolektîf û gelêrî wekî ‘edebiya gelêrî’ bi nav dike (2004:4). Derbarê edebiyata kurdî ya gelêrî de Öztürk dibêje ku; “Edebiyata kurdî ya gelêrî cureyên cihewaz di nava xwe de dihevwîne ku, ev cure taybetiyên zanistê û hunerê digel hev dihundirînin. Cureyên wekî çîrok, xeberoşk, qewlêrk, gotinên pêşyan, mamik, pêkenok, zûgotinok hwd. ji hêlekê ve xwediyê hêmanên hunerê ne.” (2016).

Di kurdî de digel vê, terma ‘zargotin’ê jî tê bikaranîn. Peyva *zargotinê*¹⁰ wekî bêjeyeke xwemalî ya kurmanciyê bixwe jî ji nav zarê xelkê hatiye û bûye termeke ku wateya gotinên bidevkî, gotinên bizar neqlê nifşeke din dibin, dide. Ev bêje ji du bêjeyan pêk tê; zar û gotin. Wekî ku tê zanîn ‘**zar**’ di kurmancî de maneya ziman -çî bi deng çî bi nîşan- û dev dide; (Botî, 2006:756; Farqînî, 2004:2087; Saadallah, 2000:626) ‘**gotin**’ jî jixwe maneya wê hîn wekî xwe ye. Terma ‘edebiyata gelêrî’ wekî qebûleke giştî bêhtir tê bikaranîn, ji lew re di vê xebatê de jî ev term hatiye bikaranîn.

Dema mirov bala xwe dide berhemên derbarê vê mijarê de, tê xuyan ku hin caran terma ‘**edebiyata gelêrî/zargotinê**’ ji dêvla terma ‘**folklor**’ê ve hatiye bikaranîn.

Folklornas Heciyê Cindî, yek ji wan kesan e ku termên folklor û zargotinê ji dêvla hev bi kar anîne. H. Cindî di pêşeka pirtûka xwe *Hikyatêd Cimeta Kurda* de weha dibêje:

“Nava çanda kurda da zargotina (folklor) wêye kevne-teze, ya ku gelekî dewlemend û pirjanir¹¹ e, cîkî herî layîq digire. Ew sal bi sal dewlemend bûye, şax vedaye, gul vedaye. Nimûnê efrandinêd wê notlanî¹² kitêbxanekê ser hev-dudahey zêde bûne, nava gelda bela bûne, hatine hasil kirinê, şimşat kirinê. Di vê xezna nehesabkirî da, bawer bike, emekê her nefereke wî gelî heye. (...) Ewî gelî bi ahil û cahil, bi xort û qîz, bi kal û pîrê xweva li ser zargotina xwe karekî mezin kiriye, ruhê xwe kiriye nav, hel kiriye, qurne pey qurnê mak û dewlemend kiriye û aniye gîhandiye me. Zargotina me, çawa cewek, nava sal

¹⁰ Zargotin: Edebiyata gelêrî, beşa folklorê ya zarkî. Wêjeya ku bêtî nivîsê bi devkî derbasî nîşan dibe. Wêjeya devkî. Bi soranî jê re edeba folklorê tê gotin. Terma zargotinê piranî ji aliyê kurdên Sovyetê ve hatiye bikaranîn.

¹¹ Pirjanir: Pircure, multîgenre.

¹² Notlanî: Nola, mîna, wekî, fena.

û zemana da bûye çemekî mezin, sal bi sal teze bûye û eynî wî xeysetiye, çi ku gel bi xweye, bûye neynika dilê wî yî sidqtemiz.” (2005:5).

Keskîn di gotara xwe ya bi navê *Pirsgirêkên Giştî Yên Xebatên Folklorê Kurdî û Çend Pêşniyaz* de diyar kiriye ku, pênasekirin bandorê li naveroka xebatên qadê dike. Keskîn di gotara navborî de, wisa qala pirsgirêka pênase û naveroka terma folklorê kiriye;

“Hîn jî di binavkirinê de lihevhatinek tune. Xebatên li Ermenîstanê carna wek “folklor”, carna jî wek “zargotin” tê bikaranîn. Li Herêma Kurdistanê gelek caran ev xebat di bin navê “edebî folklorî” de an jî “edebiyata gelêrî” de tên kirin. Wekî din dîsa li Herêma Kurdistanê têgeha “kelepor” jî tê bikaranîn ku ew jî di nav xwe de xebatên “folklor”ê dihewîne. Li nav kurdên Tirkîyeyê têgeha folklorê, bi bandora zanîngehên Tirkîyeyê, tê bikaranîn, lê careke din naverok wek “edebiyata gelêrî” ye.” (Keskîn, 2017).

Piştî nîqaşên folklornasan baş zelal bûye ku edebiyata gelêrî şax an jî beşeke folklorê ye. Hetta mirov dikare wisa jî bibêje dê di cî de be; her keresteya edebiyata gelêrî folklor e, lê her keresteya folklorê ne edebiyata gelêrî ye. Jixwe çarçoveya pênaseyên folklorê, di xwe de diyar dike ku folklor ne edebiyata gelêrî ye û ev kurteşîroveya Utley vê arîşeyê çareser dike: “Folklor, ne tenê edebiyata devkî ye.” (2014:25).

Öncü bal kişandiye ser girîngiya edebiyata gelêrî û qala bandora wê ya li ser gel kiriye;

“Zargotin, pergala bîr û bawerîya gel e, jiyana gelan teşeyî dide û bi babetekê siruştî û li gorî hêmayên xwe bi rêdixe. Di demên modern de zargotin, êdî zanistek e û li bîr û bawerî, çand û kelepor, nirx û kevneşopiyên gel û neteweyan hûr dibe. Zanista zargotinê, mirêkeke ku şewqa dil û hinavê gelan dide, mirov di wê mirêkê re dirûv û taybetiya wan gel û neteweyan dibîne, derbarê wan de dibe xwediyê zanîneke kûr. Di roja me de nasîna gelan bi zargotinê diyar dibe, lewma hewcetiyêke pirr mezin bi zanista zargotinê heye” (2014:15).

Taybetiyêke keresteyên edebiyata gelêrî ew e ku bi rêya devkî belav dibin, her ku di nav xelkê de belav dibin, ji aliyê guhdarên ku paşê dibin veguhêzer ji nû ve tên afirandin. Lewre xwediyên eslî (çavkaniya yekem) yê van berhemên nediyar in. Ew bi rêya veguhastinê dibin kolektîf û dibin malê milletê. Birayên Celîl li ser rola veguhestina edebiyata gelêrî weha dibêjin; “Zargotina kurdan bext û mirazê millet, çerx û feleka wê bi helalî paravekir. Ewê xwe li ber gele talîtengiya li ber gele çetinaya girt û nek tenê xwe girt, lê bi dur û cewahirê nû va xwe xemiland.” (Celîl û Celîl, 2013 a:11).

Alakom jî weha pê de çûye; “Xelkê bi xwe ev edebiyata afirandiye. Nivîskarên vê edebiyata tune ne. Ev edebiyata bi salan li ser zar-ziman maye, xwe parastîye, xwe nû kiriye, dewlemend kiriye û bûye malê xelkê kurd.” (2013:12).

Heciyê Cindî di pêşeka pirtûka xwe ya *Folklorê Kurmanciyê* de weha qala folklor û edebiyata gelêrî ya kurdî kiriye:

“Cimaeta Kurmancan di nava salan û zemanan de gelek cûrêd folklorê li hev anîye û afirandiye. Bi zargotina bedewiyê ew ê şabûn û halê xwe yê çetin şikil kiriye, temamiya emrê xwe yê koçeriyê û riatiyê, edetêd kevin û teze, rabûn û rûniştandina xwe, şerkariya xwe ya azadariyê pêşîya zorba, zevtekçiyêd hukûmetêd dereke, xûnxûr û kedxurêd xwe yê hundir daye eyankirinê.” (2016:17).

Şerefxan Cizîrî bal kişandiye ser girîngiya edebiyata devkî û civakbûna mirovê kurd û weha pê de çûye; “kesê kurd xwe bi alîkariya berhemên edebiyata devkî nas-dikirin, nakokiyên civata xwe fêr dibûn û der heqa wan de dibûn xwedî dîtin.” (2011:24).

Arîşeyeke din jî heye ku heta îro listeyeke têkûz a binbeşên edebiyata gelêrî diyar bike nehatiye amadekirin. Çîrok, çîrokên gelêrî, gotinên pêşîyan, biwêj, stran, destan hin ji van cureyan in. Pêkenok jî wekî cureyekî di nav edebiyata gelêrî de cî digire. Bêyî ku em bikevin nava vê niqaşê¹³ em ê qala binbeşeke edebiyata gelêrî ‘pêkenok’ê bikin.

2.1.2. Pêkenok

Di kurmancî de bi qasî hatin tespît kirin, peyvên ‘galte/gelte, laqirdî, letîfe, mesele, meselok, mesqeretî, mijûlî, qelîbotk, nikte, pêkenî, pêkenîn, pêkenok,

¹³Î. M. Resûl edebiyata gelêrî ya kurdan weha senifandiye: Beşekanî Edebî Folklorî Kurdî: 1.Efsane 2. Dastan/Îposya/Beyt 3. Çîrok/serguzeşt/Hikayet 4. Pendî pêşîyan 5. Qisey nesteqî 6.Honrawey lîrik/Goranî 7. Galtewgep 8. Metel (1970:11).

Berhevkar Mehmet Öncü di pirtûka xwe ya “*Çîrokên Efsaneyî yên Kurdan*” de, wêjeya devkî wisa polîn kiriye:1. Xevroşk (Çîrok) 2. Serhatî 3. Serborî 4. Metelok 5. Gotinên Pêşîyan 6. Îdyom (Biwêj) 7. Helbest 8. Hevalok 9. Landik 10. Jimarok 11. Tiştanok (Mamîk) 12. Dûrik (Heyranok) (2014:16).

Yıldırım û hevalên xwe jî listeyeke weha amade kirine: Edebiyata Gelêrî: 1. Destan 2. Menqîbeyên dînî û tesawîfî 3. Dengbêjî 4. Çîrokên gelêrî 5. Çîrçîrok/Xeberoşk 6. Pêkenokên gelêrî 7. Gotinên pêşîyan û biwêj 8. Kilam û stranên gelêrî 9. Qewlêrk/Dûrik 10. Mamîk/Tiştanok 11. Zûgotînok/Çîvanok 12. Lawîk/Zêmar 13. Lorîk 14. Stranên zarokan 15. Keresteyên ziman(argo/zimanê qetaniyan an zimanê girdegewran û wd.) 16. Nîfir, niyaz, dia û wd. 17. Lîstikên temaşeyî yên gelêrî 18. Lîstikên şahî û werzîşê 19. Şanoya gelêrî 20. Lîstikên zarokan (Yıldırım, Perteve û Aslan, 2013:143-144).

pêkenokên gelî, qerf, tevzok, yarî, xweşîpêkirin'(Botî, 2006:515; Chyet, 2003:447; Farqînî, 2004:1397; Ferhenga Yekbûn a dîjîtal; Îzoli, 1991:318 û 588; Kocadag, 2010:879; Malmîsanij, 2012:209; Rizgar 1993:144; Paşa, 1978:236) hatine bikaranîn. Di zaravayê kirmanckî de peyvên mîna **'fiqrayî, meselayî'**(Aldatmaz, 2014:80) û **'yarenîyî'**; di zaravayê soranî de jî peyva **'galtewgep'** an **'qisey xoş'** tên bikaranîn (Resûl, 1970).

Dema mirov çav li berhemên derbarê vê cureyê de hatine nivîsîn û ferhengan digerrîne, bi piranî termên **'pêkenî, pêkenîn'** û **'pêkenok'**ê hatine bikaranîn. Ji bo ku xebata me di nav vê gengeşiyê de nefetise lazim bû tiliya xwe ber bi yekê bike û bi wê terme bê nivîsîn; tercîha vê xebatê jî bû terma **'pêkenok'**ê.

Derbarê pênasêya vê cureya edebiyata gelêrî de, gelek pênasê hatine kirin û her lêkolînerekî/ê aliyekî vê cureyê deraniye pêş. Hinan jê behsa ken û kenandina pêkenokan kiriye, hinan jî bala xwe daye kurtbûna wan, hin lêkolîneran jî bes qala tîpên van pêkenokan kirine.

Max Luthî wisa pênasêya vê cureyê kiriye; “pêkenok ew cure vegêran e ku armanca wê kenandina mirovan e.” (2006:222). Sakaoğlu jî pêkenok weha pênasê kiriye:

“Pêkenok ew cure kurtevegêran e ku cî dide motîfekî tenê û armanceke vegotina wê heye. Carna ji bo zelalkirina meseleyekê tên gotin carna jî ji bo xweşbêjê. Hinek me dibîşirînin, di hinekan de jî dibe hîrehîra me. Hinek jî hene tenê mirovan dihezirînin û ji bo famkirina hinekan jî lazim e guhdar xwedanzanîn be li ser wê mijarê.” (Sakaoğlu, vgz Bayatlı 2013:24).

Bozarslan jî derbarê pêkenokan de bal kişandiye ser taybetiya pêkenokan a kenandina mirovan û gotiye;

“Di pêkenokên gelî yên kurdî da tiştê girîngtirîn yanî tiştê ku hin peyvên ji peyvên adetî cuda dike û dike pêkenok, digêre pêkenok, bêguman “unsurê kenê” ye. Mexsed ji “unsurê kenê” ew tişt e ku dibe samedê kenê, rê ji kenê ra çêdike, kenê tîne meydanê.” (2007:14).

Sadinî bal kişandiye ser sedema derketina pêkenokan û rola pêkenokan a ku dersekê didin mirov û dibêje;

“Pêkenok ew bire çîrokên ku ji mijareke jiyanê ya qewimiye çêbûye û di nava gotina wê de henek, gelte, qerf, hicîw û pêkenîn hebe û mirovan bi ken baldar û birdar bike. Herweha tiştê bi şêklê îmayê nîşanî mirovan bide ku mirov ji bo xwe dersekê jê bigire.” (2012:13).

Derbarê sebeba derketin û belavbûna pêkenokan de, berhevkar Ronî War jî dibêje ku;

“Çawa ku civakê bi çîrok, çîrçîrok, meselok, efsane, destan û stranan dema xwe derbas dikir, bêhna xwe fireh dikir, aciziya xwe diavêt hêlekê, tiştên ku nikaribû bigota jî bi devê hin lehengan derdibû û li wan dikir mal, bi pêkenokan jî heman tişt kiriye.” (2013 a:5).

Metîn Karadağ jî bal kişandiye ser taybetiyeke din a pêkenokan; “Pêkenok her tim bûne qerfa girtîbûna civakê. Tiştên ku eşkera nehatine gotin, di ser pêkenokan re hatine belavkirin.” (1999:234).

Rohrich qala taybetiya pêkenokan a mecazî dike û dibêje, “Pêkenok jî wekî gotinên pêşyan û mamikan xwedî wateyeke mecazî ne, carna duwateyî ne; çimkî di pêkenokan de “ehmeq”ek ne tenê ehmeq e, ew şenberiya aqil û rastiye ye.” (2006:155-157).

Piştî van taybetî û hûrguliyên mirov dikare weha pênase bike pêkenokê; ew cureya edebiyata gelêrî ye ku kêmasî, neyînî, xeletî, nakokî, dijberî, rewşên komîk û eletewşyan bi awayekî kenokî, qerfî û rexneyî; piranî bi tîpekî bi awayekî boştirîn û kurttirîn vedigêre.

2.1.2.1. Taybetiyên Pêkenokê

Wekî her cureyeke edebiyata gelêrî pêkenok jî xwedî hin taybetiyên xas in. Bi saya van taybetiyên xwe yên xas kariye bi awayekî devkî bigihê heta roja me. Di gotar û pirtûkên derbarê mijarê de bi giştî qala van taybetiyên pêkenokan hatiye kirin. Taybetiyên pêkenokan bi giştî ev in:

1. Pêkenok pexşankî ne (Karadağ, 1999:235). Pêkenokên helbestkî tune ne lê di hin pêkenokan de bes beşên biçûk ên biderb helbestkî ne (Bozarslan, 2007:16-18).
2. Şayesandinên dûrdirêj di pêkenokan de tune ne (Akçar, 2010:22).
3. Di piraniya pêkenokan de, bûyer alîkariya tîp tê vegêran. Ango pêkenok li ser tîpekî ava bûne (Aça, 2008:637).
4. Pêkenok kurt in û bi saya vê taybetiya xwe di bîra civakê de mane û bi sedan sal in hatine gotin (Ekici, 2009).
5. Zimanê pêkenokan hêsan, zelal û herikbar e; ziman, zimanê nava gel û zimanê herêm û deverê ye (Kılınç, 2010:13; Yıldırım, 1976:10).
6. Bûyerên ku tên qalkirin an rast in an jî nêzî rastiye ne (Yıldırım, 1976:21).

7. Hin pêkenok hene bes kesên ku ji wê dever û herêmê yan jî pîşedarên hev jê bêhtir tê digihên. Erman Artun di wê baweriyê de ye ku; ji bo kesên din, wateya wan pêkenokan kêmtir e (vgz Avadallah û Uylaş, 2010).

8. Hinek tîp li erdnîgariyeke berfireh belav bûne û hinek jê jî herêmî û deverî ne.

9. Zemanê bûyerên pêkenokan bêhtir nayê zanîn. Piranî qalibên wekî ‘rojek ji rojan, zemanekî, rojekê, carkî, wextekê û wd.’tên bikaranîn (Yıldırım, 1976:21).

10. Hin hevokên pêkenokan bûne gotinên pêşiyên û biwêj (Ekici, 2009).

11. Hinek pêkenok jî hene ku li ser heman mijarê tîp gotin û li gelek ciyên din-yayê bi guhertinên biçûk tîp gotin.

Ev pêkenokên li jêr hemû jî derbarê mîrên serjinik de ne. Ku bi saya van pêkenokan tê dîtîn ku heman mijar li nav neteweyên cuda bûye bingeha pêkenokê û sedema ken. Mînaka vê yekê ev pêkenok in:

Pêkenoka çîniyan:

“Dibêjin rojekê zîlamên çînî soz û peymanê didin hevdu ku li ciyekî fireh ê ku jin lê tune ne rûnî û paşgotiniya jinên xwe bikin. Ku di germiya xweşbêjiya wan de ber-pîrsê gazînoyê yê mizawir dikeve hûndir û qîr dide dibêje; ha ho jinên we hatin! Mêr mîna nokên ser tehtan belav dibin û her yek dikeve qulekê. Piştî bîskekê tê famkirin ku jin tune ne, her yek ji stara xwe dertê û dibînin ku zîlamêkî girs ê mîna fêrisan li ciyê xwe rûniştiye. Her kes di heyr û mitalê de ye ka ev çi camêr e ku ji jîna xwe natirse: lê nêzîkiyê dîkin ku dibînin ji tîrsa miriye.” (Kasnak, 1987:11).

Pêkenoka qoreyîyan:

“Rojek ji rojan dadgerekî qoreyî gazî zîlamên herêmekê dike û dibêje wan; heçî yê serjinik e bila xwe bide aliyê rastê. Hemû diçin hêla rastê ji xeynî zîlamêkî. Dadger pesn û zîrtê vî zîlamê dide û şîretê li yê serjinik dike ku ew jî wekî viyê han bibin mêr û paşê ji zîlamê li aliyê çepê dipirse; Gelo tu çawa wisa gihîştî vê serbestbûnê, bêje me? Zîlamê feqîrok û xînonok dibêje; weleh jîna min ji min re gotiye neçe ciyên qelebelix, min jî wekî wê gotî kir.” (Kasnak, 1987:11).

Pêkenoka kurdî:

“Li qehwê yekî ji hevalên xwe re got; yên ku ji jina xwe ditirsin bila hemû rabin ser piyan! Yek tenê ne tê de hemû rabûn ser piyan. Ji yê ranebûyî pirsîn:

-Welê xuya ye ku tu tenê ji jina xwe natirsî?

-Na wele, jinikê wê rojê darek welê li kulîmeka min xistiye ku ji êşa wê ez nikarim rabim ser xwe!” (Sadînî, 2012:144).

2.1.2.2. Taybetiyên Pêkenokên Kurdî

Pêkenokên kurdan bi gelek taybetiyên xwe wekî pêkenokên cîhanê ne, di hin xalan de jî tê dîtin ku hin taybetî jî hene ku di pêkenokên kurdî de hene. Ji pirtûkên berdestî em gihan van taybetiyên pêkenokên kurdî:

1. Piraniya pêkenokên kurdî pexşankî ne lê di hin pêkenokan de bes beşên biçûk ên biderb helbestkî ne. Dawiya vê pêkenokê beşeke helbestkî ye.

“Zilamekî ¹⁴gundî, hingî kar û xebat kirîye, gelek westîyaye û ji jîyana xwe kerixîye, ji mêritîya xwe jî bêzar bûye. Rojek di wextê betlanê da xwezîya xwe bi jinan anîye û di dile xwe da gotîye “Jin hêsa ne. Gerçî ew jî karên malên xwe dikin, lê ew kar ne zor in, jin bi wan karan pirr nawestin.”

Mêrik bi wê pêjna xwezîanîne vezelîyaye û wek ku dîya wî li pêşberê wî be, deng li dîya xwe kirîye û weha gotîye:

Ax dayê, ax dayê!

Te çima ez nêr anîm dinyayê!

Te az banîma dinyayê mê

Û salê du caran bidima mêrê çê!

Buharan te ez bidama mêrekî xwedîpez!

Payizan jî te ez bidama mêrekî xwedîrez!” (Bozarslan, 2007:60-61).

2. Piraniya pêkenokên kurdî di ser tîpan re tên vegêran. Tîpên mîna; Mela Nesredîn, Behlûl, Mela Meşhûr, Apê Mûsa, Kak Akrim Kanî, Botî, Eyndarî, Cilînî, mela, merên serjinik û dîn hin ji wan tîpan in.

¹⁴ M. Emin Bozarslanî di bikaranîna alfabeya kurdî de xwedî hin tercîhên cuda ye. Bozarslan herfa ‘î’yê û ‘î’yê bi vî awayî dinivîse: ‘î’ û ‘î’. Mînak: Pirtuk, Eyndari, aqilmend. Ji bo ku xwîner bikarin bêhtir sûdê ji xebatê wergirin ev destwerdan li ser deqên wî hatiye kirin ango ‘î’ û ‘î’ya Celadet Be-dirxan hatine bikaranîn.

3. Piraniya pêkenokên kurdî kurt in. Herçend pêkenok formeke kurt a vegêranê bin jî di kurdî de hin deqên dirêj jî bi navê pêkenokan hatine çapkirin. Lê em xwe di wê zanînê de nabînin ku bibêjin ew pêkenok in an na.¹⁵ Ev pêkenok mînak e ji bo pêkenokên kurt.

“-Axx! Çiqas helaw xweş e!

-Ma te helaw xwarîye?

-Na welleh, min nexwarîye, lê belê dema bavê min çûbû êş, li ser nanê yekî dîtibû.”

(Bîngol, 2013:88).

4. Zimanê pêkenokên kurdî hêsan, zelal û herêmî ye. Ziman, zimanê nava gel e û di pêkenokan de nîşaneyên devokên herêman hene. Mesela di vê pêkenokê de, ji dêvla lêkera ‘**karîn**’ê ve lêkera ‘**şenake**’yê hatiye bikaranîn û ev jî taybetiyeke devoka kurdên Anatoliya Navîn e.

“*Rokê muxtarê gund gotiye: Congeyî gund hendi şenake manga avis bihêle û çûye conge daye xesandin û biriye bazarê, firotiye, pere jî ji xwe ra xerc kiriye, xariye.*

Xelkê gund bi vê hesîne û pir bi hêrs ketine, çûne mixtar gilî kirine. Mehkemê jê ra şeş meh ro biriye û mora mixtariyê jî ji dest girtiye. Vir da we da, şeş mehê mixtêr xelas bûne û mixtar dîsa hatiye gundî xwe. Le mixtar di hundir da hinek guheriye, dest bi limê (nimêj) kiriye û doza misilmantiye dike.

Ew meh jî meha rojiye bûye. Êş û Pirtêş jî li pêş mala xwe runiştîbûn û hinik pirpar û pelpusunk bi nani hişkeva kiribûn qozi û xweş xweş dixwarin.

Mixtarê kevn bi dur va ew halê wan dibîne û mîna bruskê xwe digihêje hindê wan û diwêje: "Hun qe fedî nakin, ji xwedê natirsin û vê royê bimbarek (pîroz) nen dixwin?"

Êş û Pirtêş bi hev ra; "Lo te congê gund firot, xwar, ji te ra ne guneye, me pariyek nanî tisî xweriye ew li dilî te nê ye!" (Polatlı, 1998).

5. Diyarkirina xwediyê pêkenokan –ya vî gelî ye yan jî ya gelekî din e- tişteki zor e. Boratav dibêje ku; “pêştirîn û baştirîn rêya diyarkirina xwediyê pêkenokekê –an jî çîrokekê- lînêrîna biwêj, qalibên vê vegêranê ne.” (2014:84). Bi saya taybetiya

¹⁵ Ji bo deqên dirêj ku navê pêkenokê li wan hatiye kirin li van her pênc pirtûkan binêrin: Bozarslan, (2011). *İlmê Tûrik*.; Bozarslan, (2013). *Mela Kulî*.; Bozarslan, (2013). *Bûka Gulsûn*.; Çamlıbel, (2006). *Gulê Were Binê Tûyan*.; Çamlıbel, (2011). *Tew Lolo*.

zimên mirov dikare hin pêkenokên ku tenê aîdê kurdî ne bibîne. Ev pêkenoka jêrîn bi awayekî wisa hatiye ristin ku mimkûn nîn e bi zimanekî din be. Ew malê xas ê kurdî ye.

“Kabrayekî Kurd mîwanî malêk bû, şew le diway nanxwardin be xanexwêkey wit: Demim¹⁶ tale eger heye şîrînîyekim bo peyda ke. Xanexwêke wîti: Xurmaman heye û mewîjîşman heye, kamyana arezû ekey bot bînim? Kabraş wîti: Xurmij! (Secadî, 2007:13).

6. Hin hevok û qalibên ku ji pêkenokeke kurdî mane bûne biwêj û gotina pêşîyan. Ev biwêja ha -zirara wê ji pêz re heye- ji pêkenokekê maye (Bozarslan, 2009:53). Bi kurtî pêkenok weha ye: Rojekê yekî bêrtî ji zozanan dadikeve berîyê. Ji bo pêdivîyan rêya wî bi bajêr dikeve. Digihê bajêr ber mizgeftê ku dengê tê, dengê azanê ye. Zilamê bêrtî heta wê gavê azan seh nekirîye, ji tîrsa ziravî wî qetiyaye û di dora pezê xwe re çûye û hatiye. Hingê dibîne ku zilamek dikeve deriyê mizgeftê. Dibêje, ev dengê çi ye? Zilam dibêje azan e û dûvdirêj qal dike. Lê yê bêrtî fam nake û dibêje zirara wê ji pêz re heye yan na? Zilam dibêje, na. Hingê yê bêrtî dibêje, ku zirara wê ji pêz re tune be, bila biqîre.

7. Hevok û diyalogên pêkenokan kurt in. Wekî ku di pêkenoka jêrîn de jî diyar e, hevokên kurt tên tercîhkirin. Di vê pêkenokê de tê dîtin ku hevoka herî dirêj şeş (6) peyvî ye. Herweha diyalog jî zehf kurt in.

“Mêrik diçe leşkeriyê. Leşkeriya xwe diqedîne. Diçe malê. Qure bûye. Ji leşkeriyê çûye malê. Jina wî jê dipirse, dibêje:

-Mêro tu hînî tirkî bûyî? Mêrik dibêje:

-Tu eyb nakî. Ez hînî her tiştî bûme. Jinik jê dipirse, dibêje:

-Mêro navê kêçê çiyê? Mêrik dibêje:

-Wele min tiştê piçûk nepirsî. Jinik dibêje:

-Mêro navê hêştirê çiyê? Mêrik dibêje:

-Wele min tiştê mezin jî nepirsî. Jinik mêzedike. Na. Jinik jê re dibêje:

-Mêro navê gûyê min çi ye? Mêrik dibêje:

-Wele li ser zimanê min e.” (Akyol, 2006 a:83).

¹⁶Dem: Dev.

8. Hin pêkenokên kurdî hene li hin herêm û deverên kurdî bêhtir tên nasîn, gotin û hezkirin. Ev pêkenoka jêrîn, bi qasî ku kesên herêma Botanê dikenîne, kesên herêmeke din nakenîne. Çiku ew devoka wê herêmê ji sedî sed fam nakin û dibe ku hin edet jî li cem guhdêr û xwendevanan cuda be.

“Sibehî yekî Garsî¹⁷ radibe diçe ‘îş. Dinya hê welê tehrî ye, diçe lê rêne ser wê tehtkê tiştê reş heyî. Bêje eve ha wela meramûws¹⁸ i, diya mi çêkirî ji mi ra aniyî dayniyî hire qene ez bixwim. Dest davêji çentê, nanê xwi, keve ser wê meramûwsê dixwi. Heta dinya ronahî dibi, lê dirêne, ne meramûws e; hirçê ji bo kewzan xwariyî rîtiye ser wê tehtkê. Vêca welê hê germ, hê welê hilim jê diçûya û gotiyî qey meramûws i.” (Gotoxê 1.).

2.1.2.3. Têkiliya Pêkenokê bi Cureyên Din ên Edebiyata Gelêrî re

Pêkenok wekî cureyeke edebiyata gelêrî têkiliyeke wê ya xurt bi zanistên din û bi cureyên din ên edebiyata gelêrî re heye. Ji ber ku wekî cureyeke edebiyata gelêrî ne, mijara pêkenokan mirov bixwe ne; rêya hemû zanistên ku mirov bixwe û pirs-girêkên mirovan ji xwe re kirine mijar bi pêkenokan dikeve. Bivê nevê têkiliya wê bi dîrok, civaknasî û etnolojiyê heye; lê ji ber ku ev ê bi serê xwe bibe mijara xebateke din; bes em ê qala têkiliya wê ya bi cureyên din ên edebiyata gelêrî re bikin.

Taybetiya sereke ya vê cureyê ew e ku ew jî wekî piraniya cureyên edebiyata gelêrî cureyeke vegêranê ye. Lewre li gelek ciyan ew û cureyên din ên edebiyata gelêrî dikevin nav hev û mirov nema tê derdixe ka kîjan pêkenok e kîjan çîrok û mesele û fabl e. Kurt Ranke pêkenokê dişibîne ‘firaxeke helîner’ (vgz Luthî, 2006:222) ku her tişt dikare bikeve nav pêkenokê û pêkenok wan tiştan dihelîne dike nav xwe.

2.1.2.4. Têkiliya Pêkenokê bi Çîrokan re

Pêkenok û çîrok herçend du cureyên cuda yên edebiyata gelêrî bin jî, carna pêkenok wekî binbeşeke çîrokan jî hatine nîşandan. Sê xalên sereke hene ku bûne sebebên têkilheviyê. Helbet mirov bi giştî lê binêre pêkenok kurt û çîrok dirêj in û bi vê taybetiya xwe dikarin ji hev bîn nasîn. Lê hin pêkenok hene dirêj û hin çîrok jî

¹⁷Garsa: Devereke ji navçeya Dihêya Sêrtê. Gundên Êkend, Kuçnis, Kevzin, Hût, Tirî, Tal û Xerxur wekî Garsa tên hesibandin.

¹⁸Meramûws: Xwarineke herêma Botan a ku ji kewzanan (kizwan) çê dibe. Kewzanan dikutin û piştê donê germ berdidin serê û weha dixwin.

hene kurt in; ev e sebeba yekem a têkilheviyê. Sebeba duyem a têkilheviyê jî ew e ku lêkolînerên Ewrûpî (Aarne 1910; Stith Thompson, 1928 û 1955). Pêkenok wekî bin-beşeke çîrokan hesibandine. Bascom di xebata xwe ya derbarê vegêranên gelêrî de dibêje; “mimkun e ku mirov pêkenokan, ji ber şeweya wan ji vegêranên din û çîrokan cuda bike; lê heta vêga jî ez nizamim ku ev yek hatiye kirin an na” (2006:117).

Sebeba sêyem jî ew e ku hin tîpên pêkenokan bûne tîpên çîrokan, hin tîpên çîrokan jî bûne tîpên pêkenokan. Heman alozî di edebiyata gelêrî ya kurdî de jî hene.¹⁹ Deqeke ku lêkolînerêkî/ê wekî çîrok nîşan daye, lêkelonînerêkî/e din wekî pêkenok nîşan daye. Keskîn derbarê vê rewşê de amaje pê dike ku;

“Divê were gotin ku li ser mijarên edebiyata gelêrî bi xwe jî lihevhatinek tune ye. Binavkirin, pênasekirin û tesnîfa van mijaran jî ne bi rêkûpêk e. Wekî mînak, destan çi ye? Çîrok çi ye? Çîrokên gelêrî çi ne? Cudahî û hevmanendiyên wan çi ne? Yanî bi awayekî din dikare were gotin ku pîrsa “cure” (genre) jî di xebatên kurdî de zêde nehatiye nîqaşkirin.” (2017).

Behlûlê Dane/Zane/Dîwane li hin ciyan wekî tîpekî pêkenokan li hin ciyan jî wekî karekterêkî çîrokan hatiye nîşandan. Ji van tîpên wisa re mirov dikare bibêje ‘tîpên xapînok ên vegêranan’ lewre lazim e lêkolîner ne tenê li tîpê vegêranê li taybetiyên din ên vegeiranê jî binêrin û bi vî awayî vegêranê bi nav bikin.

Cudatiyeke çîrok û pêkenokan jî ew e ku rewş, bûyer û tîpên çîrokan bêhtir derasayî ne lê yên pêkenokan yan rast in yan jî nêzî rastiyê ne (Yıldırım, 1976; Uçar, 2011). Herweha cudatiyeke din jî heye ku di tîpên çîrok û pêkenokan de xuya dibe. Tîpên çîrokan hertim yan baş û xurt in yan jî nebaş û qels in, tîpekî çîrokan nabe ku di çîrokekê de baş di yeke din de nebaş be; lê tîpên pêkenokan dikarin hem baş hem jî nebaş bin (Topal, 1999:46). Di çîrokên kurdan de mirov dikare, ‘**Mîrza Mihemed**’ nîşan bide ku ew tim û tim yekî serkeftî ye, jêhatî û baş e. Berovajî vê yekrûbûna tîpên çîrokan, tîpên pêkenokan dikarin hem baş hem nebaş; hem zana hem nezan bin.

2.1.2.5. Têkiliya Pêkenokê bi Biwêj û Gotinên Pêşîyan re

Pêkenok herçend vegêraneke kurt be jî di vegotina bûyerên vê vegêranê de beşa ewil, beşa navîn û beşa dawîn heye; û beşa dawîn girîngtirîn beşa pêkenokê ye çiku peyv û hevoka biderb di vê beşe de tê bikaranîn. Ev pêkenok, hingî di nav gel de

¹⁹Ji bo agahiya berfireh li van her sê pirtûkan binêrin û van sê vegêranan bixwînin: Bozarslan, (2013). *Mela Kulî*. 73-91.; Îşler, (2014). *Mîrza Mihemed û Çavreşa Qîza Mîrê Ereban*. 113-124.; Zinar, (1989). *Xwençe Cîlda 1*. 117-120.

hatine gotin, ev hevokên wan ên biderb di bîra mirovan de mane û piştî demekê beyî ku pêkenok bê vegêran ev hevok hatine bikaranîn û bi vî awayî bûne gotinên pêşyan û biwêj (Ekici, 2009). Di van du pêkenokên ku li jêr wekî mînak hatin dayîn de tê xuyan ku ka çawa ev gotin bûne biwêj û gotinên pêşyan.

Hevoka dawîn a vê pêkenokê - *Kê xwarîye savarê, bila ew biçe hewarê*- bûye gotina pêşyan û ji bo kesên bêxîret û xwexwaz tê emilandin.

“Carek li gundekî Bedlîsê ziyafetek hatiye dayîn. Lê belê çawa bûye bûye, xwedîyê mala ku ziyafet daye, gundîyek ji bîr kirîye û nexundîye ziyafetê. Ziyafeta wan ji goşt û savar bûye. Piştê ku ziyafet hatiye xwarin û mêvan belav bûne, xeber ji gund ra hatiye ku hin talanker çûne avêtine ser garana gund û talan kirine. Gundî hemî bi lez û bez çûne hewara garanê. Lê ew zîlamê ku li derê ziyafetê maye neçûye, tew xwe nelivandîye jî. Gundîyek deng lê kirîye û gotîye:

-Malava, tu çi sekini? Ma tu nizanî ku hewar e?

-Mêrik gotîye:

-Kê xwarîye savarê, bila ew biçe hewarê.” (Bozarslan, 2007:49-50).

Biwêja vê pêkenokê -das li ku, tir li ku- jî di kurmancî de ji bo kesên ku qala du tiştên bêeleqa dikin, tê gotin.

“Serekê paleyana rojekê dasê li linge xwe dixê. Yekî pale jê re got:

-Tu dibêjî ez zîrek im, te çawa das li xwe xist malxerab!

-Ma te çima wê rojê tirek kir?

-Tew tew, das li ku tir li ku?”²⁰ (Sadînî, 2012:254).

2.1.3. Tîp û Karakter

“Tîpê pêkenokê, karaktereke/î pêkenokê ye, lê di pêkenokê de ji yekî bêhtir karakter hene; ji van karakteran yek dertê pêş û dibe temsîlkarê xelkê. Mirov ji wî tîpê ku xelkê temsîl dike re dibêje ‘tîpê pêkenokê.’ (Yıldırım, 1976:16).

²⁰ Ev biwêj bi vî awayî jî -tir li ku, das li ku?- tê gotin. “Di nîvê werza zivistanê jinik li mal hevîr distirê. Mêrê wê jî li balê rûniştiye. Ji ber zora hasilkirina hevîr, ba bi ber jinikê dikeve. Jinik ji şerman xwe şaş dike nizane çi bibêje ku balê bikişîne cihekî din. Hema ew dasa wan a ku havîna derbasbûyî wînda bûye dikeve bîrê. Bi lez ji mêrê xwe dipirse: “Mêrik, ka te ew das nedît?” Mêrik rewşê baş dişopîne, di derka şerm û tewata jîna xwe de ye, bi awayekî pir rehet jîna xwe dibersivîne: “Jinik, tir li ku, das li ku?” (Borak; 2005).

Uçar jî derbarê temsîlkirina tîpan de dibêje ku;

“Hûnandina bûyerên gelek pêkenokan li ser karekterekî tîpîk e û ev karekter temsîlkarê vê civakê ye û pêkenok jî li ser wî saz dibe. Ev karekterên diyar ên pêkenokan jî bo naverok, peyama û kakilê pêkenokê pir girîng in. Heta mirov dikare bibêje ku pêkenokê ev karekter diyar dikan.” (2011:111-112).

Tîpên ku temsîl û berdevkiya civat û civaka jê hatine dikan, digel tiştên baş tiştên nebaş jî diyar dikan. Hizra Uçarê ya li ser mijarê jî ev e;

“Tîpê pêkenokan li gor daxwaza hevpar a xelkê şikl digirin; carna civak roleke erênî li wan bardike carna jî rolên neyînî. Divê bê zanîn ku tîpê pêkenokan tenê taybetiyên erênî nîşan nadin. Heta mirov dikare bibêje ku civak neyîniyên ku dibîne -çikûsî, ehmeqî, zexelî, çavbirçîtî- li van tîpan bar dike û bi saya van tîpan pîvanên civakê dide ber wan kesên ku van tiştan pêpes dikan. Civak bi vê rola neyînî ya tîpan rêya rast li ber însanan dixê û wan perwerde dike. Lewre divê bê gotin ku tîpên pêkenokan hem li gor civakê şikl digirin û taybetiyên wan nîşan didin hem jî xwedî li taybetiyên civakê derdikeve û wan diparêze.” (2011:112).

Di nav pêkenokên kurdî de jî tîpên curbicur dikarin werin dîtin. Ji ber ku bi giştî xebatên berhevkarîyê nehatine kirin, hejmara tîpên pêkenokên kurdî ne zêde e. Bi wextê re hin tîpên pêkenokan tên ji bîr kirin an jî hinek tîpên guhertin. Gelek caran jî em rast lê tên ku pêkenokeke derbarê tîpekî de li herêmek din, li ser tîpekî din tê gotin. Ev jî dibe sedema derketina gelek varyant û versiyonan. Derbarê varyant û versiyonên pêkenokan de Arvas dibêje; “Her gotox li gor zanîna xwe pêkenokê dirêj yan jî kurt dibêje, peyv û hevokên pêkenokan diguherin lê destpêk, geşedan û encama van varyant û versiyonan piranî yek in (2012).

Guherîna tîpan wekî rastiyeke vê cureyê hatiye qebûlkirin. Nexwe mirov dikare bigihê wê baweriyê ku hem pêkenok hem jî tîpên pêkenokan guncavî guherînê ne. Sakaoğlu derbarê guherîna tîpan de gihiştîye van encaman:

1. Guherîna pêkenokeke hezkirî û xweş, bi ser herêm û tîpekî herêmî ve.
2. Guherîna pêkenokên ehmeqiyê li ser du gund, gund-navçe wd. ji bela berberiyê ku derbarê hev de dibêjin.
3. Guherîna tîpên neberbelav ber bi tîpên nû, naskirî û berbelav ve.
4. Guherîna tîpekî berbelav, ber bi tîpekî neteweyî û herêmî ve.
5. Guherîna tîpekî biyanî, ber bi tîpekî neteweyî û herêmî ve.
6. Guherîna du tîpên ku dişibin hev (vgz Civelekoğlu 2010:19).

Bi van du mînakên tê dîtîn ku pêkenokek bi du tîpên cuda çawa li nav du gelên cîran -kurd û tirk- tê gotin.

Pêkenoka kurdî

Tîp: Behlûl

“Ji Behlûl pirsyar kirin:

-Seyda, gelo dema darbesta mirî li ser milê mirov be û mirov ber bi goristanê ve biçe, mirov li aliyê rastê be, yan li aliyê çepê, yan li pêşiyê, yan li paşiyê be çêtir e?

-Hema ne di nava darbestê de bin, hûn li kîjan aliyê bin baş e, zerar tune.” (Bîngol, 2013:47).

Pêkenoka tirkî

Tîp: Nasreddin Hoca (Mela Nesredîn)

“Rojek ji rojan nasekî mela Nesredîn ku xwest zanîna wî biceribîne û gotê:

- Seydayê min, tu zanî, dê rojek bê em ê hemû bimirin. Lê pirsek heye ku ji aqilê min dernayê; dihizirim nahizirim min bersiv nedî. Gelo piştî ku me nimêja kesê mirî kir, em xwe bidin ku dera darbestê?

Mela Nesredîn bîskeke dihizire û dibêje:

-Hema ne di hundirê wê de, li ku dibî bibe.” (Sakaoğlu û Alptekin, 2014:207).

Karakter, digel tîpên pêkenokê hêmaneke sereke yan pêkenokan e. Karakter di pêkenokê de alîkariya tîpan dikin ku vegêran bê temamkirin. Di pêkenokan de, şayesandina karakteran nayê kirin ku qala taybetiyeke wan bê kirin jî teqez roleke wê taybetiyê di wê pêkenokê de heye. Di vê pêkenokê de ‘**mela**’ tîp e û ‘**feqî**’ jî karakter e. Karakterê pêkenokê ‘**feqî**’ ye û birçîbûna feqiyan wekî taybetiyeke pêkenokê xwedî rolekê ye di pêdaçûna vê pêkenokê de.

“Li gundekî Kurdistanê melayek ligel feqiyên xwe derdikeve nava gundan. Çi mala diçinê ji wan re xwarinê tîne. Lê dema mele dest bi xwarinê kir û got “Bismillah” feqe jî xwarinê dixwin. Dema mele got “Elhemdulillah” jî tev dest ji xwarinê berdidin. Lê feqî mirovên zigurd in, têr nabin. Rojekê li ber çem seydayê xwe digirin û lê dixin, dibêjin: “Te mala me xera kir, ji birçîna kuştin. Heta em têr nexwin nebêje elhemdulillah.” Mele jî soz da wan û dest bi karê xwe kirin.

Dîsa çûne malekê mêvaniyê. Ser sifrê tijî goşt û savar e. Mela soza xwe ji bîr kir û piştî çend loqman got “Elhemdulillah” feqiyê li kêleka wî qurîncokê lê dide û dibêje “seyda çembillah.” Çawa ku behsa çem tê kirin seyda tê ser xwe û dibêje “Teww! Estexfirullah, teze bismillah.” (Sadînî, 2012:191).

Peywireke karakteran jî ew e ku bi tîpê pêkenokê re dikevin diyalogê. Bi saya vê diyalogê gotin tê heta dawiyê û tîpê pêkenokê di derbekê de bi gotinekê yan kirinekê pêkenokê bi encam dike. Di vê pêkenokê de sebeba hebûna ‘nobedar’ ew e ku rastî mela bê û pirsê jê bike.

“Şevê xewa Melê revîyaye. Hingê rabûye ji malê derketîye û dest pê kirîye di kuçan da gerîyaye. Qasek wisa gerîyaye, nobedarê taxa wî rastê wî hatiye û jê pirsîye ku çima wisa di kuçan da digere. Melê bersiva wî daye û gotiye: -Xewa min revîyaye; ez li xewa xwe digirim.” (Bozarslan, 2004:24).

Digel mirovan ajal jî wekî karakterên pêkenokan tên hesibandin ku ew jî di pêkenokê de xwedî rolekî ne. Hetta di çavkaniyekê de ‘tiştên derasayî’ yên mîna cin, û şeytan (Akçar, 2010:91) jî wekî karakter hatine nîşandan.

2.1.4. Mela

Mela wekî dersdar û peywirdarê ola misilmantîyê xwedî giraniyekê ye di nav civaka misilmanan de. Ji ber pîşeya wî ya dînî, misilmanan gelek qedr dane vê pîşeyê. Ev qedr û qîmet di nav kurdên misilman de jî wisa ye. Zeynelabidîn Zinar di pirtûka xwe ya bi navê *Xwendina Medresê* de weha qala mela û melatîyê dike; “Li Kurdistanê hertim pîşeya herî giranbiha û pîroz meletî bû. Siyaneta meleyan li nava xelkê pir hebû. Ji ber wê yekê, her kesî dixwest ku wê pîşeyê bi dest xîne û bibe melle.” (1993:28).

Mela Birhanê Tarînî wateya peyva mela weha şîrove kiriye; “mela, reha wê molla ye, bi wateya tijî û dagirtî. Ango meşhur e, nav didin bi melayê danzdeh ‘ilim.” (2011:16)

Kamêran Botî pênaseya peyva mela wekî, “zanayê ola îslamê” (2006:431), Celadet jî wekî, “kesê ku ilmê şerîetê heya kitêba Mela Camî dixwîne, ji hemû zanayên dîn re tê gotin” (Bedirxan, 2009:201), kirine.

“Kurd ji van kesên ku dersê didin re, dibêjin “seyda”. “Sey” tê wateya derse “da” jî tê maneya dayînê.” (Zinar, 2012:259).

Ev peywirdarên ola îslamê bûne tîpekî pêkenokên kurdî. Gelo ev peywirdarên olê digel vê rola xwe ya pîroz û girîng çawa bûne tîp û bûne benîştê devê xelkê? Herwekî ku di nav civakê de mirovên baş-nebaş, zana-nezan, jîr-ehmeq, xebatkar-tiral, çavtêr-çavbirçî, dilnizm-quire-, comerd-çikûs, xêrxwaz-xêrnexwaz, rastgo-derewkar hene, civakê ev berberiya van kesan di ser tîpê mela re kirine pêkenok û gotine.

Em geh rast tîpekî melayan tên ku li pey keç û jinên xelkê digere geh jî dibînîn ku ehmeqekî dihetikîne û paşê şîretêkê lê dike. Mirov dikare bibêje ku mela bi xêr û gunehên xwe bûne tîpên pêkenokên kurdî; ew bûne *pêkenîyên*²¹ civakê. Secadî weha şîrove dike rola melayan di nav civata kurdan de;

“Ebê ême ewe bizanîn ke lenaw kurda mela desteyekî diyar û aşkira bûn, berey xwêndînewar û zanyar her ewan bûn. Le hemû wextêkaw le hemû şiwênêka be pençe penceyan bo rakêşawin. Em desteye lenaw merduma ta ewperî be çawî gewreyî û rêz lêgîrawîyewe temaşe kirawin, le îşî biçûk û zilda pîrs bewan kirawew ewan birîwyanetewe. Tenanet nawî mela be corêk berz botewe nawî hîç çînekî tîr nebiwe beranberî be nawî ewan bika.” (Secadî, 2007:8).

Wekî ku folklornas Secadî jî amaje pê kirî, ti çîneke din a di nav gelê kurd de ewçend neketiye nav hemû rehekên civakê. Di nimêjê de ew li pêş, di aşta şer û pevçûnan de dîsa ew li pêş; û ew e pêşengê rêya felata ji felaket, tofan û hişkayîyan. Wî nivişt û berbejn çêkirine ji jinên bêzarok an jî zarokên nexweş re, wî daxwaza baranê kiriye ji Xwedayî ji bo gundiyan baranxwaz. Ku karê gundiyan pêk be, mela mezintir dibe di çavê gundiyan de; ger ku pêk neye jî ew dibe reşê çavê wan.

“Gundiyan zad çandine û li benda baranê ne lê tu baran nabare. Rûspiye gund dibêjin: Ji mele re bibêjin bila xwe amade bike, sibê êvara îne ye, em ê dibe herin duaya baranê. Gundî diçin ji mele re dibêjin, xwe amade bike em ê sibê herin duaya baranê. Sibetirê rûspiyê gund û mele didin pêşiya gundiyan, diçin piştê gund ser girê bilind û dest bi duaya baranê dikin, ji nişkan ve dibêje ‘guş’ û dibare: wisa baranek dibare ku hemî pez û dewarên gund di ber avê re diçin. Bi destpêka baranê re mele diçe dikeve şikeftê. Gundî bînavber li mele digerin. Di dawiyê de mele dibînîn û wî tînin cem rûspiyê gund. Rûspî:

- Mele ma te jê re çî got ku mala me xirakir?

- Welahî min bi tenê ‘fatîheyek û sê qulûwelahû ehed’ xwendin.

²¹ Pêkenî: Kesê ku xelk pê dikene û henekên xwe pê dike.

- *Min zanîbû, min zanîbû ku tu dest pê bikî tu nasekinî, ma fatîheyek û qulûwelahûyek têrê nedikir, te ewqasî dirêj kir.*” (Uyar, 2016).

Jixwe di nav tîpên pêkenokên kurdî de para herî mezin a melayan e; ev rewş di wêjeya kurdî ya nivîskî de jî wisa ye. Di wêjeya nivîskî ya klasik de jî kêr helbestvan hene ku navê melatîyê ne li ber navê wan ê eslî ye. Zinar derbarê vê de dibêje ku;

“Ew medreseyan kevnare ji sedsalan ve ye ku li Kurdistanê hebûn û ji wan pir kesên zana, rewşenbîr derketine ku hejaye pesn û serbilindiya Neteweyê Kurd in. Lewra bi kar û xebata wan Herîriyan, Cizîriyan, Bateyiyan, Teyraniyan, Xaniyan û gwd. Ev bi sedsalan e ku zimanê kurdî xwe bi reşbelekîyan rûqalê mejû kiriye.” (1993:10).

Melayên ku li medreseyan li ber destên melayên kurd perwerde bûne, bûne veguhezêrên bîr û zanîna kurdayetiyê. Wekî ku Epözdemir jî dibêje “çand û ziman û edebiyata kurdan bi saya xwendin û perwerdeya medreseyan hatiye parastin û geşkirin” (2015:15).

Wekî encama vê beşê dikare bê gotin ku, termên mîna folklor û edebiyata gelêrî gelek caran ji dêvla hev ve hatibin bikaranîn jî, ji hev cuda ne û edebiyata gelêrî beşeke folklorê ye. Pêkenok jî binbeşeke edebiyata gelêrî ne û xwedî hin taybetiyan e. Yek ji van taybetiyan jî vegêrana wan a di ser tîpan re ye.

BEŞA SÊYEM

PÊKENOKÊN KURDÎ

Pêkenokên kurdî; ji sala 1939an ve ye (Bozarslan, 2004:8) bala lêkolîner, berhevkar û folklornasên kurd kişandiye û gelek pirtûkên pêkenokan hatine çapkirin. Ku mirov bala xwe dide van pirtûkan, piraniya wan pirtûkên berhevkarîyê ne û mirov li xebatên çapbûyî yên pêkenokên kurdî dinêre; pêkenokên kurdî bi sê awayan hatine çapkirin:

1. Di nav guldesteya edebiyata gelêrî de, mînakên pêkenokan.²²
2. Berhevdana pêkenokan bi awayekî bêserûber û bêpolînkirin.²³
3. Berhevkarîyeke li gor tîpê pêkenokê.²⁴

Pêkenok wekî beşeke sereke ya edebiyata gelêrî cureyeke çalak û zindî ye û ji bo mirov bizane ka rol û mîsyona pêkenokan çi ye; divê ewilî ev pêkenok bi awayekî bîn polînkirin çimkî; “Şerta pêşî û bingeha lêkolîneke berfireh ew tişt e ku ew zanist bê polînkirin. Di heman demê de polînkirin encama lêkolînên hûr û kûr e. Polînkirin tê maneya diyarkirina mijarê û danîna hîmên serekeyî yên çînî, cureyî û teşeyî.” (Propp, 1998:65).

Di vê beşê de, dê qala pêvajoya polînkirina pêkenokan, cureyên polînkirinê û şablona polînkirina pêkenokên kurdî bê kirin.

3.1. PÊVAJOYA POLÎNKIRINA PÊKENOKAN LI DINYAYÊ

Dema ku Ewrûpiyan bi awayekî rêkûpêk berê xwe dan folklorê, ewilî keres-teyên folklorê berhev kirin û çapkirin. Piştî demekê ev xebat gihastin wê radeyê ku diviya ev kereste bîn polînkirin û ji bo vê polînkirinê jî divê pîvan hebûna. Çiku wekî ku Bauman jî dibêje; “awayê cure û polînkirinê bandor li perwerdehî, koleksiyon û arşîvkirina folklorê dike.” (2006:109). Hema hema her ekoleke folklorê serî li rêbazeke polînkirinê daye û her êkolê tiştek yan hin tişt ji xwe re kirine pîvan. “Ye-

²² Pirtûka Cindî (2009); a Mazî (2014) û ya birayên Celîl (2013 b) û mînakên bi vî awayî ne.

²³ Pirtûka Mukriyanî (1975), a Bozarslan (2007), a Tîgrîs û Motkî (1989) û ya Heydo (1996) hin mînakên bi vî awayî ne.

²⁴ Pirtûka Mukriyanî (1976), a Bozarslan (2004), a Ustun (2017) û ya Can (2017) hin mînakên bi vî awayî ne.

kemîn polînkirina birêkûpêk a çîrokan a Antti Aarne ye ku wî di sala 1910an de kiriye. Aarne wekî cure çîrok hîlbijartîye û pîvana polînkirina wî jî “tîp” in. Polînkirineke din a Stith Thompsonê xwendekarê Aarne ye ku pîvana wî jî “motîf” in.” (Çobanoğlu, 2012:127-128).

Herçend pêvajoya polînkirina pêkenokan wekî cureyên din ên edebiyata gelêrî be jî ji ber têkiliya wê ya bi ken û qerfê re ev pêvajo digihê beriya mîladê. Çiçero di *De Oratoreyê* de, qerf kiriye du beş û weha gotiye; “qerf dibe du beş: qerfa rastîyan û qerfa peyvan. Dema ev her du dikevin nav hev mirov dikenin.” (1942:383).

Di xebatên sedsala 20. de pêkenok wekî binbeşeke çîrokan hatiye nîşandan. Antti Aarne di xebata xwe ya 1910an de pêkenok kiriye binbeşeke çîrokan û hejmar jî daye wan. Polînkirina Aarne bi vî rengî ye:

Çîrok:

- a) Çîrokên ajalan
- b) Çîrokên esil ên gel
- c) Pêkenok (vgz Luthî, 1997).

Aarne di vê polînkirina xwe de binbeşên pêkenokan jî nivîsîne ango bi hêsanî be jî wî pêkenok polîn kirine. Polînkirina wî ya pêkenokan weha ye:

“Pêkenok : 1200-1999

1200-1349 bêedebî

1350-1439 henekên derbarê kesên zewicandî

1440-1524 henekên ku lehenga wan serekê jin e

1525-1874 henekên ku lehengê wan serekê mer e

1525-1639 merê qurnaz

1640-1674 şens û siud

1675-1724 bale

1725-1874 henekên derbarê keşeyan

1875-1999 çîroken derew û derewînan” (Aarne, vgz Demir, 2016: 17).

Piştî 18 salan di 1928an de xwendekarê Aarne, Stith Thompson ev polînkirina wî berfirehkiriye lê wî jî wekî mamosteyê xwe pêkenok kiriye binbeşeke çîrokan. Li gor Thompson jî polînkirina çîrokan weha ye:

- a) Çîrokên ajalan
- b) Çîrokên esil ên gel
- c) Pêkenok
- d) Çîrokên rêzîn
- e) Çîrokên polînnekirî (Thompson, vgz Çobanoğlu 2012:127-128).

Thompson di vê xebata xwe ya derbarê motîfan de hin xalên din li polînkirina xwe zêde kirine û di çapa berfirehkirî ya 1955an de pêkenok jî wekî beşeke sereke ya çîrokan nîşan dane. Di vê xebata berfirehkirî de binbeşên pêkenokan jî digel rêza wan hatiye nivîsîn. Polînkirina beşa pêkenokan weha ye:

“X. Pêkenî

X0– X99. Pêkeniya derbarê nerehetiyê de

X100– X199. Pêkeniya derbarê kêmendamiyê de

X200– X599. Pêkeniya derbarê çînên civakî de

X200– X299. Pêkeniya li ser bazirganan

X300– X499. Pêkeniya li ser pîşeyan

X500– X599. Pêkeniya derbarê çînên din ên civakî de

X600– X699. Pêkeniya derbarê netewe an nîjadan de

X700– X799. Pêkeniya derbarê zayendê de

X800– X899. Pêkeniya derbarê serxweşiyê de

X900– X1899. Pêkeniya bi derew û mubalexeyan

X910– X1099. Derew: zîlamê pir hêja

X1100– X1199. Derew: nêçîrvan û masîgirê pir baş

X1200– X1399. Derewên derbarê ajalan de

X1400– X1499. Derewên derbarê dar, şînahî û nebatan de

X1500– X1599. Derewên derbarê erdnîgarî û topografîyê de

X1600– X1699. Derewên derbarê hewa û avhewayê de

X1700– X1799. Derew: absurdiyên mantiqî

X1800– X1899. Derew û mubalexeyên curbicur” (Thompson, vgz Demir, 2016:269).

Yıldırım, derbarê vê polînkirina Thompson de rexneyan li vê polînkirinê dike û dibêje;

“Her ku derbarê pêkenokan de xebat hatine kirin, pêkenok ji bin siya çîrokan derketine û wekî cureyeke cuda ya edebiyata gelêrî hatiye qebûlkin. Di çîrokan de piranî ji yekê zêdetir mesele û bûyer hene, zincîra bûyeran heye. Şayesandin û hûrgulî di çîrokan de xwedî ciyekî fireh in. Tişt bi dirêjî tîn vegotin. Ji aliyê kompozîsyona xwe û mijarên xwe ve berfireh in. Lê di pêkenokan de berovajiyê vê rewşê heye, vegotineke boş û kurt heye. Tişt ku divê bê gotin carna bi peyvekê gelek caran jî bi hevokekê tê gotin. Herweha şayesandin û hûrgulî di pêkenokan de, ne xwedî qîmet in.” (1976:11).

Uçarê jî weha qala cudatiya pêkenok û çîrokan kiriye: “Teşe, rêbaza vegotinê, ciyê vegotinê, cî, kadroya karakteran, armanc û karîgeriya çîrokan ji yan pêkenokan cuda ye, herçend di katalogan de li rex hev bin jî divê ew wekî du cureyên cuda bîn hesibandin.” (2011:90).

Îro roj di piraniya nivîsên derbarê polînkirina edebiyata gelêrî de, pêkenok wekî cureyeke serbixwe tê pejirandin. Piştî qalkirina pêvajoya polînkirina pêkenokan li dinyayê, pêdivî pê heye ku qala pîvanên polînkirinê bê kirin.

3.2. PÎVANÊN POLÎNKIRINA PÊKENOKAN

Bersivên pîrsa ‘pêkenok çawa bîn polînkirin û pîvanên vê polînkirinê dê çi bin’ ji yekê zêdetir in. Uçarê bersiva vê pîrsê, weha daye;

“Meseleya polînkirina pêkenokan herçend hêsan bixuyê jî lê ne wisa ye, ev karekî zehmet û têkilhev e û her zanyarek li dû wê rê ye ku bikare polînkirineke herî kêrhatî çêbike ji bo mijara xwe. Lê îro hîn jî polînkirineke navneteweyî ya bi giştî zanyaran li ser li hev kiriye tune ye.” (2011:92).

Mirov dikare gelek rêbazên nû bibîne ji bo polînkirina pêkenokan lê bi giştî dema çav li xebatên curbicur ên polînkirinê tê gerandin ev pîvanên polînkirinê dertên.

- a) Polînkirina pêkenokan li gor teoriyên kenî
- b) Polînkirina pêkenokan li gor mijara pêkenokê
- c) Polînkirina pêkenokan li gor armanca pêkenokê
- d) Polînkirina pêkenokan li gor awayê rista pêkenokê
- e) Polînkirina pêkenokan li gor teşe û awayê pêkenokê
- f) Polînkirina pêkenokan li gor tîpê pêkenokê
- g) Polînkirina pêkenokan li gor karîgeriya pêkenokê

- h) Polînkirina pêkenokan li gor karîna wergera wan (Uçar, 2011:92; Akpınar 2007:20; Özünlü, 1999:47-159).

Dê behsa van hemû polînkirinan neyê kirin, bes wê qala sê polînkirinên ku zêdetir hatine emilandin, bê kirin. Ev polînkirin, ev in:

3.2.1. Polînkirina Mijarî

Li gor vê polînkirinê ‘mijara pêkenokê’ stûna pêkenokê ye. Yê ku ev rêbaz bi kar anîne yan jî pêşniyar kirine (Barskiy, vgz Uçar, 2011; Kuipers, vgz Uçar, 2011; Çotuksöken, 2003 û 2004) angaşt dikin ku pêkenok ji bo ku şîretekê, rexneyê li ke-sekî, civatekê bikin tên gotin. Dursun Yıldırım pêkenokên tirkên li gor mijarên wan kirine sê beş:

- a) Derbarê ol, terîqetên olî, edet, qedexa û rewresmên olî, hurafe û rêberên olî de
- b) Derbarê bûyerên navbera gel û rêveberan de
- c) Nelihevî û cudatîyên navbera kesan (Yıldırım, 1976:6).

Lêkolînerê Rûs L. A. Barskiy derbarê mijara pêkenokan de, di sala 1994an de berhemek nivîsiye û wî pêkenokên Rûsan li gor mijarên wan polîn kirine. Bi kurtasî polînkirina Barskiy a mijarî wisa ye:

- a) Pergala siyasî
- b) Polîtîkaya neteweparêziyê
- c) Aborî
- d) Leşkerî
- e) Jiyan û qeder
- f) Çand, huner û zanist
- g) Jiyan rojane
- h) Malbat
- i) Nexweşî û bijîşkî
- j) Jiyan cinsî (vgz Uçar, 2011:109-110).

Civaknas Giseline Kuipers jî polînkirineke mijarî kiriye, polînkirina wî jî weha ye:

- a) Cinsî
- b) Mirin û êş
- c) Ol
- d) Dewlemendî
- e) Erk û hêz
- f) Kêmasî û jirêderketinên civakî
- g) Dijayetî û biçûkxistina kesên cuda (Kuipers, vgz Uçar, 2011:111-112).

Herçend mijarên hevpar ên van polînkirinên mijarî hebin jî hin mijar jî hene ku xasma yê gelekî ne. Heta îro hin jî kurdan wekî gelekî polînkirineke tematik(mijarî) amade nekiriye.

Sadinî di pêşeka pirtûka xwe ya derbarê pêkenokan de weha qala mijarên pêkenokên me kirine;

“Pêkenok di kelepura kurdî de li ser gelek babetên jiyanê hatine gotin. Li ser rêveberan, şêxan, mamosteyan, dêûbavan, zarokan, jinan, mêran, eşîretan, serokeşîran, axan, xulaman, şivanan, gavanan, karkeran, gundiyan, bajariyan, deveran û hwd. Di van salên dawiyê de jî gelek pêkenokên li ser serdestan û peywirdarên wan hatine gotin rewacdar in.” (2012:15).

Lêkolîner û berhevkarê pêkenokan Bozarslan jî derbarê mijarên pêkenokên kurdî de dibêje ku;

“Pêkenokên gelî yê kurdî li ser şol û babetên cure cure hatine afirandin. Ji şolên abûrî heta şolên siyasî, ji babetên civatî heta babetên herêmî, çu şolek, çu babetek ji ber pêkenokên gelî nefilitîye. Celebek pêkenok jî hene ku çu navrokên wan ên civatî tunin.” (2007:9-10).

3.2.2. Polînkirina Ristinî

Di vê polînkirinê de lêkolîneran bala xwe bêtir daye awayê ristin û bikaranîna peyv, qalib û hevokên ku di pêkenokê de hatine emilandin. Ji ber ku ‘peyv’, ‘qalib’ û ‘hevok’ hemanên ziman in, aliyekî vê polînkirinê digihê zimên jî. Vê polînkirinê li nav elmanan şax vedaye û Theodor Lipps û Freud du polînkirinên hûrgulî amade kirine. Divê bê gotin ku hîmê polînkirina her duyan jî ‘esprî’²⁵ ye.

Polînkirina Lipps gelek berfireh e û serbeşên vê polînkirinê ev in:

²⁵ Esprî: Di kurmançî de ji bo berginda vê peyvê, peyvên ‘esprî, henek, qerf, yarî, nikte’ tên bikaranîn. Bi me, cudatiyeke biçûk heye di navbera esprî û van peyvên din de, esprî bêtir girêdayî zimên e; henek û ev peyvên din di xwe de tevgerên mirovî jî di hewînî. Ji lew re têgeha ‘esprî’yê nehat wergerandin bo kurmançî.

- Espriya peyv û têgehan
- Peywendiyên têgehên esprîk
- Hizrên esprîk
- Peywendiyên hizrên esprîk
- Encamên esprîk (vgz Uçar, 2011:96).

Peyrewê Lipps Freud, gazinc û lomeyan ji lêkolînerên beriya xwe dike ku wan di lêkolînên xwe de heqê espriyan nedaye û agahiyên wan xebatan jî wekî ‘parçeyên belavbûyî’ bi nav kiriye (2012:46). Freud polînkirina têkel a Lipps hêsan kiriye û xalên ku piştî espriyê didan hizrê deranîne. Polînkirina Freud li ser sê serbeş û yazdeh binbeşan e:

1) Civandin

- a) Hevedana peyvan
- b) Guherîna peyvan

2) Bikaranîna pirjimari ya keresteyekê

- c) Tevahî û qetqetî
- d) Ristineke cuda
- e) Guhertineke sivik
- f) Halên vala û tijî yê peyvê

3) Cotwateyî

- e) Wateya nav û tiştetekî
- h) Wateya rastîn û mecazî
- i) Lîstika peyvan
- j) Cotwateyiya cinsî
- k) Di ber re avêtin (Freud, 2012:73-74).

Ev cure polînkirin -polînkirina rastînî- “dibe alîkar ji famkirina vaca espriyê, xasma gelek sûdewar e dema ku her esprî û pêkenok yeko yeko bên şîrovekirin. Belam ev polînkirin armanc û sedema giştî ya espriyan ronî nake û derbarê karîgeriya wan de, agahiyên zêde nade.” (Uçar, 2011:98).

3.2.3. Polînkirina Tîpî

Li gor vê polînkirinê jî tîpê pêkenokê dertê pêş. Di pêkenokan de herçend ne tenê kesek bêhtir kes hebin jî stûna pêkenokê ew kes e. Ew kesê ku ji nav karekterên pêkenokan derdikeve ‘tîp’ e. Herwekî ku berê jî hatibû qalkirin, tîp dibin berdevkên civata xwe; dibin pîrbêjên derd û kul û keseran, dibin nîşanderê jîr û jêhatîbûna wê civatê. Uçar derbarê girîngiya tîpên pêkenokan de dibêje;

“Tîpên pêkenokan ji bo pêkenokê pir girîng in. Bi saya tîpan vegêrandina pêkenokan hem hêsan hem jî kurt dibe. Û tîpên pêkenokan pêkenokekê bêhtir xweş dikin çiku ew li gor daxwaza guhdaran dikarin bîr guhertin. Tîpên pêkenokan dibin neynika taybetî, hêvî, bendewariyên çandî û civakî yê civaka ku ji nav hatine.” (Uçar, 2011:114).

Aça jî di derbarê derketina tîpên pêkenokan û rola wan a di vegêrana pêkenokê de dibêje ku;

“Wekî hemû vegêranên gelêrî pêkenok jî di ser tîpekî re tên vegêrandin. Afîrînerê tîpên pêkenokan gel e. Lê di afirandina wan de bi qasî rola gel rola taybetiyên “tîp” jî hene. Kesên jîr, qerfok û gotinên wan di paşilê de; bi van taybetiyên xwe yê tîpolojîk rê vedikin ku gel wan bike tîp.” (Aça, 2008:639).

Boratav di polînkirina xwe ya tîpî de pêkenokên tirkî kirine du beş û gotiye; “Pêkenokên ku li ser tîpekî diyar tên gotin û pêkenok ku li ser tîpekî nediyar tên gotin.” (Boratav, vgz Altunel, 1990:50). Yıldırım pêkenokên tirkî dabeşî heft tîpan, (Yıldırım, 1976:22) Sakaoğlu jî dabeşî sê tîpan kirine (vgz Gönen, 2004).

Bi qasî me tespît kir di nav kurdan de tekane kesê ku qala mijara tîpên pêkenokan kiriye Îzzedîn Mistefa Resûl e. Resûl bi giştî qala van tîpan²⁶ kiriye: Tîpên rasteqîn, tîpên xeyalî, tîpên deverî û herêmî, tîpên naskirî, tîpên nenaskirî û tîpên hevbeş (1970:123-124).

Qusireke vê polînkirinê ew e ku heman pêkenok li ser navê çend tîpên cuda tê gotin. Mînak; di pêkenokeke ku li Nisêbînê tê gotin de tîpê pêkenokê Behlûlê Zana ye, di pêkenoka ku li Amedê tê gotin de tîpê pêkenokê dibe Mela Meşhûr.²⁷

3.3. CEREBEYEKE POLÎNKIRINA TÎPÎ YA PÊKENOKÊN KURDÎ

Li ser polînkirina pêkenokan li gelek welatên cîhanê xebat hatine kirin. Lê mixabin di kurdî de xebatên taybetî bo vê yekê nehatine kirin, herweha kêmasiyeke din jî ew e ku wergerên derbarê mijarê de jî zêde tune ne.

²⁶ Î. M. Resûl bergînda peyva tîp peyva ‘qareman’ bi kar aniye.

²⁷ Derbarê guherîna tîpan de li rûpela 24an binêrin.

Ji ber ku mijar bi ‘tîp’ ve -mela- girêdayî ye, û li ser ‘tîp’ekî pêkenokên kurdî radiweste, û ji bo ku mijar baş bê famkirin, pêwîstî bi polînkirineke ‘tîp’î ya pêkenokên kurdî derket. Loma li vir polînkirineke bi vî awayî hatiye tercîhkirin.

Wekî her cerebeyekê ev polînkirin jî dibe ku xwedî hinek kêmasiyan be, lê qet nebe şablonek dê bê amadekirin ku ji bo xebatên dahatû yê li ser mijarê jî bibe çavkaniyek. Di amadekirina vê şablonê de sûd ji van çavkaniyan hat girtin: (Bozarslan, 2004 û 2007; Uçar, 2011; Elçin, 2004; Resûl, 1970; Yıldırım, 1976).

Pêkenokên kurdî li ser sê serbeş û dozdeh binbeşan hatin dabeşkirin. Her serbeş bi herfêkê (A-B-C) hat nîşandan û her binbeş jî bi herf û hejmarê (A-1, B-1, C-1) hat nîşandan ku di paşerojê de derfeta lêzêdekirina serbeş û binbeşan li ser şablonê hebe. Herweha ji bo ku polînkirin baş bê famkirin ji bo her xal û bînxalê mînak hatine nîşandan. Derbarê tîpan de agahiyên berfireh nehatin dayîn, çimkî ev tîp her yek bi serê xwe mijara tezekê ne.

3.3.1. Şablona Polînkirina Tîpî ya Pêkenokên Kurdî

A) Tîpên Binavkirî

- A-1. Tîpên Binavkirî yê Berbelav
- A-2. Tîpên Binavkirî yê Neberbelav
- A-3. Tîpên Binavkirî yê Rewşenbîr

B) Tîpên Temsîlkar

- B-1. Tîpên Temsîlkar ên Herêmî û Deverî
- B-2. Tîpên Temsîlkar ên Mezhebî û Olî
- B-3. Tîpên Temsîlkar ên Zaravayî
- B-4. Tîpên Temsîlkar ên Neteweyî
- B-5. Tîpên Temsîlkar ên Eşîrî
- B-6. Tîpên Temsîlkar ên Partî û Rêxistinên Siyasî

C) Tîpên Rasterast

- C-1. Tîpên Rasterast ên Malbatî
- C-2. Tîpên Rasterast ên Pîşeyî û Hunerî
- C-3. Tîpên Rasterast ên Neyînî

3.3.2. Şîrove û Mînakên Şablonê

A) Tîpên Binavkirî

Cudatiya sereke ya van tîpan ev e ku di pêkenokê de ev tîp bi navê xwe tên xwendin. Navê van tîpan tê zanîn. Di destpêka pêkenokê de navê van tîpan tê diyarkirin. Dursun Yıldırım ev tîp wekî ‘tîpên ferdî’ bi nav kirine (1976:21). Ev tîpên binavkirî carna rewşenbîrek e, carna dîwaneyek carna jî melayek e.

“Ev tîp, temsîliyeta civaka jê tên kêr zêde winda dikin û dibin tîpên pîralî û gelêrî.” (Yıldırım, 1976:21). Di tîpên temsîlkar de pîralîbûna tîpî tune ye, ku civakê çî mohr û nîşan li ser danîbe ew her wisa dimîne lê tîpên binavkirî tîpên pîralî ne.

A-1. Tîpên Binavkirî yên Berbelav

Ev tîp, ji aliyê piraniya kurdan ve tên zanîn an jî piraniya kurdan navên van tîpan seh kirine. Nîşaneyê berbelavbûna wan jî ew e ku, pêkenokên van tîpan li hin welatên cuda yên ku kurd lê dijîn, hatine çapkirin. Ev xebat û pirtûkên çapkirî dibin mînak ji berbelavbûna wan re. Derbarê Mela Meşhûr de li Başûr “di sala 1939an de Mihemed Mistefa li Bexdayê pêkenokên wî çapkirine.”, (Bozarslan, 2004:8) û li nav kurdên Sovyetê tê dîtin ku Heciyê Cindî di pêkenokekê²⁸ de cî daye ‘Melle Meşhûr’ (2009:104) û li ser navê Mela Meşhûr li nav kurdên Tirkiyeyê jî gelek pêkenok tên gotin û hin jî van hatine çapkirin (Bozarslan, 2004:8).

Tîpên binavkirî yên berbelav ku ji pêkenokên kurdî yên di çarçoveya vê xebatê de ne, bi vî awayî hatin destnîşankirin: Behlûl, Mela Meşhûr, Mela Nesredîn.

Behlûl: Di pêkenokan de navê wî wekî Balûl, Balûlê Dana, Balûlê Dîwane, Balûlê Zana, Behlûl, Behlûlê Dana, Behlûlê Danende, Behlûlê Dîwane, Behlûlê Mahî, Behlûlê Yekdane, Behlûlê Zana (Sag̃niç, 2002:52) derbas dibe.

Ev “tîp” di nav çîrok û çîrokên gelêrî û de jî tê dîtin.^{29 30} Herçiqasî li ser nasnameya wî ya etnik niqaş hebin jî (Akkuş, 2003) ev niqaş derveyî çarçoveya vê

²⁸ Heciyê Cindî di vê xebata xwe de *-Folklorê Kurda-* ji pêkenokan re gotiye ‘**xweşîpêkirin**’.

²⁹ Ji bo agahdariyê berfireh li van her du çavkaniyan binêrin: Celîl û Celîl, 2013 b:194-198; https://ku.wiktionary.org/wiki/q%C3%AEz_be_tu_dizan%C3%AE,_jineb%C3%AE_be_ez_dizanimji_na_berday%C3%AE_be_ser%C3%AA_hesp%C3%AA_min_berde,_ez_herim. 21.12.2017.

³⁰ Derbarê tîpê Behlûl de tezeke nû hatiye parastin. Lê derfet tune bû ku bê bidestxistin. Kunyeya teze weha ye: Başaran, T. (2017). *Di Vegotinên Devkî de Tîpê Behlûl*. (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî) Zanîngeha Mûş Alparslanê.

xebatê ne. Beyî ku em bikevin niqaşa kî ye û ji kîjan miletî ye, divê derbarê jiyana wî de hin agahî bîn dayîn.

Hamzeh'ee di pirtûka xwe ya derbarê Yarsaniyan de weha qala Behlûl dike; "Nivîskarê Yaresan ê sedsala pazdem Kaka Reda'î, neql dike ku Behlulê Mahî kurdekî Îranê ye û li Mah-Kufeyê hatiye dinê. Ev agahiya ku Reda'î daye ji aliyê ansîklopedînûs Petros Bostanî ve jî hatiye peyitandin." (2008:91-92).

Adak, li ser rola Behlûl a di baweriya Yarsanî de, balê dikişîne ser 'pîrbûn' û 'helbestvaniya wî' û dibêje;

"Li gorî çavkaniyên Yarsan damezrênerê baweriya wan Behlûlê Dana ye û cara pêşî wî ev bawerî aniye nava kurdan û ev bawerî li Kirmanşah û Xaneqînê belav kiriye. Behlûl jî şeş pîrên Yarsanê yên herî zêde xwedî bandor ê yekem e. Li gorî baweriya Yarsaniyan, Behlûl zatê Xuda ye. Diyalogên wî û yaranên wî di "Defterî Dewrey Behlûl" de hatine nivîsandin." (Adak, 2013:123).

Nîyazmend jî bal kişandiye ser xweşbêjî, zanîn û bawermendiya Behlûl û gotiye;

"Ev mirovê hêja ji yekîtiya Xwedê û xizmeta xelkê Xwedê gelekî tije bû. Xeberdanên wî bi tinaz û henek bûn, lêbelê tev heqîqet û şîret bûn û di dîroka Îslamê de wekî çirayê ronahî dida. Misilmanên pak jî ji van gotin û laqirdiyên wî mirovê mezin sûd werdigirtin. Behlûl jî aqilmendên wê demê dihate hejmartin. Bi hazircewabî û henek û laqirdiyên xwe yên şîrîn, di çareserkirina pîrgirêkên dînî de jî xwediyê destekî dirêj bû." (2012:15).

Bi giştî tê dîtin ku Behlûl jî wekî tîpê Mela Nesredîn îro roj tîpekî hevbeş ê gelan e. Wekî ku li jor jî hatibû gotin, herçiqasî li ser nasnameya wî niqaş hebin jî di nav pêkenokên kurdî de jî bi berbelavî tê dîtin.

Metin Akkuş di gotara xwe ya derbarê vê mijarê de ku wî berawirdiya tîpên Behlûl, Cuha û Mela Nesredîn kiriye, gihîştîye van encaman:

- Her sê tîp jî tîpên vegêranên rojhilatê ne.
- Li ser rasteqîniya jiyana her sêyan jî guman heye.
- Her sê tîp jî li heman erdnîgariyê jiyane (2003).

Daneyên li ber dest (Adak, 2013:123); (Sağniç, 2002:52-56) helbestkariya Behlûl îspat dîkin. Digel vê helbestvaniya wî; ew zanayekî ola îslamê ye, (Niyazmend, 2012:15) li gor hin çavkaniyan jî ew dînekî bîaqil e; (Kalkandelen, 2012) lê çî dibe bila bibe; ew bûye tîpekî pêkenokên rojhilatê û di pêkenokên kurdî de jî ew

bûye tîpekî binavkirî. Di vê pêkenoka kurdî de, xelk dixwaze zanabûna Behlûl bipêve û Behlûl bi bersiva xwe wan diheyirîne.

“Ji Behlûl pirsyar dîkin:

-Seyda gelo tu welî yî?

-Belê ez welî me, eger hûn bixwazin ez ê gazî wê dara hanê bikim bila were ber lingê min.

-Temam Seyda, ka gazî bikiyê da em bibînin.

Behlûl sê caran gazî dike darê, bes dar nayê. Li ser vê çendê Behlûl holê dibêje:

-Madem ew nayê, nexwe em herin cem wê. Yê welî be ew xwe qure nake.” (Bîngol, 2013:20).

Mela Meşhûr: Di pêkenokan de bi navên Mela, Mela Meşhûr, Melay Meşhûr, Melayê Meşhûr, Melay Benawbang, Melle Meşhûr, Melay Mezbûre, Mele Meşhûr, Xocê Meşhûr tê nasîn (Bozarslan; 2004; Cindî; 2009:104; Resûl, 1970:123; Penaber, bd.;http://www.mnyekta.com/pekeni/Ji_her_duyan_yek_pe_digire.html. 22.12.2017).

Bozarslan Mela Meşhûr û Mela Nesredîn wekî heman tîp qebûl dike (2004:7). Lê Cindî di pêkenokekê de hem cî daye Mela Meşhûr, hem jî cî daye Mela Nesredîn; ango wî ew wekî du tîpên cuda hesibandine. Bozarslan derbarê zanîn û belavbûna pêkenokên Mela Meşhûr de wisa dibêje;

“Pêkenokên Melayê Meşhûr, wekî hemî welatên Rojhilatê li Kurdistanê jî gelek belav bûne, ketine dev û zaran, di edebiyata devkî û folklorê kurdî da ciyekî gelek girîng girtine. Li her derê Kurdistanê kurd wan pêkenokan ji hev ra dibêjin, bi wan wextê xwe dibûrînin.” (Bozarslan; 2004:8).

Di pêkenokên Mela Meşhûr de dixuyê ku; ew mirovan bi zanîn, awayê fikirîn û bersivdana xwe diheyirîne û şaşwaz dike. Ev pêkenoka li jêr jî yek ji wan pêkenokan e.

“Melayê Meşhûr ketiye xeyalê girarê (mehîrê). Derî lê dixê, keça cîran hatiye:

- Apê Mele, diya min nexweş e, ez hatime badiyek girarê..”

- Ero, ev cîranên min bêhna xeyalan jî digirin hoo..” (Penaber, bd.).

Mela Nesredîn: Di pêkenokan de bi navên Mela, Mela Nisredîn, Mela Nesredîn, Mele Nisredîn, Nisredîn Xoce, Xoce, Xoce Nesredîn, tê nasîn. Tîpê herî berbelav e. Tîpekî hevbeş ê gelên rojhilatê ye. Tîpê Mela Nesredîn li dinyayê ewçend be-

lav bûye ku, ew ji tîpekî mela bêhtir tiştan temsîl dike lê ji ber ku bi navê mela tê nasîn, dîsa jî tîpekî mela ye.

“Xoce Nisredîn carekê çêleka xwe dibe bajêr ku bifroşe. Ewî qetikek xistîye serê çêlekê û duv xwe dikşîne. Rîya Xocê di ber bostanekî re dibuhure. Li nav bostên hinek karker dixebitin û ba Melê dikin:

-Xoce, Xoce! Tu çêleka xwe bi kur ve dibî?

Mele Nisredîn dibêje:

-Ez dibim fîrotanê!

Ew dibêjinê:

-Qanim bêje, bê tîfaq!

Melê dibêje:

-Ma ezê çi bêjim «bê tîfaq», ji xwe va ye ez wê dibim!

Û Xoce rîya xwe didomîne. Ew ji bostan nepenî dibe, di ser çayakê de kir ku derbas be, çêlekê xwe hilavêt. Çima pîyê çêlekê neşikest! Melê çêleka pîşikestî bibe jî, nayête fîrotan. Ji bêgavîya xwe, ew zivirî ku here mal. Xoce giha tangava bostan, wan karkeran dîsa gazî kirinê:

-Xoce, Xoce! Çima tu neçûyê û dizivirî?

Melê dibêje:

-Bê tîfaq! Pîyê çêleka min şikest!

Ew roj hetanî ku Xoce gihaye mala xwe, kî ku pê re bi peyîvîye wî digot:

«Bê tîfaq, bê tîfaq, bê tîfaq!..» (Zinar, 1989:257).

Sakaoğlu di pirtûka xwe ya digel Alptekîn ya bi navê *Nasredîn Hoca* de xebatek derbarê li welatên dinyayê navên Mela Nesredîn kiriye û wî lîsteyeke dirêj a navên Mela Nesredîn amade kiriye. Navên Mela Nesredîn li hin welatan bi vî awayî ne:

“Tirkiye: Nasreddin Hoca

Ezerbaycan: Molla Nesreddin

Tacîkistan: Efendî

Bangladeş: Nasîruddin Hojjga

Êran: Molla Nasreddîn

Risya: Hoca Nasreddîn

Romanya: Nasratîn Hoge

Yewnanîstan: Anastratîn

Elmanya: Hoscha Nasreddîn

Fransa: Nasreddîn Hodja” (Sakaoğlu û Alptekin, 2014:54).

A-2. Tîpên Binavkirî yê Neberbelav

Ev tîp jî binavkirî ne lê ne berbelav in. Li herêm, bajar an gundekî pêkenok li ser navên wan tên gotin. Ev tîp jî ber ku bi herêmekê ve sînardar in, gelek caran tîpên binavkirî yê berbelav dikevin dewsa van tîpan. Ev tîpên neberbelav bi qewlê folklornas Carl Wilhelm von Sydow ve, ‘**ekotîp**’ in. Sydow derbarê têgeha xwe ‘ekotîp’ê de dibêje ku li welatekî gelek herêm hene ku haya wan jî hev nîn e weha didomîne; “Çawa ku rihekek li gor erdnîgarî û cureyê axê diguhere û li her herêmekê hin taybetiyên werdigire, tîpên çîrokan -hemû tîpên vegêranan- jî taybetiyên herêmî werdigirin.” (2014:62-66).

Yıldırım, derbarê tîpên binavkirî yê neberbelav de dibêje; “Ev tîp, tîpên şexsî ne, ji aliyê kêman kesan ve ev tîp tên zanîn.” (1976:26). Ev tîp jî mîna tîpên herêmî û deverî zêde nayên zanîn ji vî aliyê ve dişibin hev lê cudatiya wan heye ji hev. Ev tîp bi navê xwe tên zanîn; lê tîpên herêmî û deverî ne bi navê xwe bi navê herêm û devera xwe tên zanîn. Tespîtkirina tîpên binavkirî yê neberbelav karekî zehmet û dijwar e. Ji bo ku mirov bikare hemû tîpan peyda bike lazim e xebatên berhevkeriyê gelek baş hatibin kirin. Pêkenokên tîpên neberbelav piranî serboriyên wan kesan in.

Di pirtûkên pêkonokan ên ku li ber destê me de, pênc tîpên binavkirî yê neberbelav hene. Tîpên binavkirî yê neberbelav ên ku ji aliyê me ve hatin tespîtkirin ev in: Berces, Îsmailê Dîn, Kak Akrim Kanî, Xale Receb, Xelîlê Pixê. Ji van tîpan Berces, Îsmailê Dîn û Xelîlê Pixê kurmancîaxêv in, Kak Akrim Kanî û Xale Receb soranîaxêv in.

Berces: Li ser navê Berces jî pêkenok tên gotin. Bi qasî ku Bîngol dibêje; ew mirovekî kenoke bûye, geriyaye û pêkenokên wî li Botan û Behdînan tên zanîn (Bîngol, 2013:23). Derbarê Berces de Bingol ev agahî dane me.

“Berces bi eslê xwe ji Şirnexê, ji qebileya Xalûmeran e. Kurê Simaîlê Oso ye. Malbata wan paşê ji Şirnexê koçî gundê Wehsidê yê *Girika Emo*³¹ dikin û li wir nîştêcîh dibin. Derbarê jidayikbûn û wefata wî de mêjûyeke misoger di destê me de nîn e. Bes bi îhtimaleke mezin ew nêzî sala 1960 li gundê Wehsida Silopya çûye ser dilovaniya xwe. Bercesê gorbiheşt digel hunera xwe ya stranan, her weha bi henek û yarî, bi meselok û kenokên xwe ve jî navdar bû. Di sohbetan de şitexalî şitexaliya wî bû û xelkê bi baldarî kenokên wî guhdarî dikir. Her tim hewl dida ku henekekê bike û xelkê bide kenandin.” (Abdulkadîr Bîngol, Agahdariya Şexsî, 8.03.2017).³²

“Berces rojek ji rojan dîsa tê Cizîrê. Lê belê tu nabêjî wê rojê li Cizîrê şer û pevçûn dest pê kiriye, heydedan e, dê xwe li weledê xwe nake xweyî. Berces ji nişka ve xwe di nava şer de dibîne. Ji vî alî, ji wî alî xelk dibezin hev. Berces li wan dinêre. Demekê Berces dibîne ku va ye yek ji wê ve dibeze û tê nav şerî. Bere jî dijûnan dike û agir ji devê wî dibare:

-Hey...telaq û bertelaqê hewe...

Peyvek ya di nav dijûna wî de bala Berces dikêşe: Bertelaq ...Berces dest xwe de diçe bi pistûka wî digre û jê dipirse:

-Birayê ezîz, li qisûra min nenêre. Te dijûnek kir, min fêr nekîr. Ji min re bû meraq. Te got telaq û bertelaq. Em dizanin telaq çi ye lê em nizanin bertelaq çi ye. Ka ji kerema xwe re ji min re bibêje.

-Kuro ka min berde, birayê min kuştin!

Berces ew berneda:

-Bi serê xwe û te, ev ne mimkûn e, heta tu nebêjî min, ku bertelaq çi ye, ez te bernadim.

Yê Cizîrî dema dibîne ku ew wî bernade jê re holê dibêje:

-Xwelîserê gundî, bertelaq diş e, diş!...Te fêr kir!

-Erê min fêr kir, de here îca!” (Bîngol, 2013:23-24).

Îsmailê Dîn: Derbarê jiyana Îsmail de hin agahî li ber destan hene. Îsmail wekî ku ji navnûçikê wî jî diyar e, kesekî dîn e. Ji Amûda Rojavayê Kurdistanê ye. Sadînî derbarê wî de dibêje ku; “Ev sê sal e³³ Îsmailê Dîn çûye ber rehmeta Xwedê.

³¹Girika Emo: Navê navçeya Silopyayê.

³² Nivîskar Abdulkadîr Bîngol ku nûserê pirtûka pêkenokan a bi navê *De Were Nekene* ye ev agahî bi rêya facebookê bi me re parvekirin. Abdulkadîr Bîngol xelkê Cizîrê ye û hîn jî li Cizîrê rûdine. Ez spasdarê wî me ku bersiv da pirsên min ên derbarê Berces de.

³³ Dîroka çapa pirtûkê 2012 e. Sê sal jê derên dibe 2009. Ango li gor roja îro, 8 sal in çûye rehmê.

Lê Îsmaîl di nav gel de dijî. Gotinên wî, metelokên wî mirovan kûr kûr difikirînin. Loma di hemû civatên kurdan de Îsmaîl hazir e.” (2012:142-143).

Li ser pêkenokên Îsmaîlê Dîn ango Simo du *pirtûk*³⁴ çap bûne lê delîveya peydakirina van pirtûkan neket destê me.

“Îsmaîl rojekê çû malekê, kebaniya malê teyîfê mehîr da ber û jê re got: “Îsmaîlo ya ji ber te bimîne tu nerijîni ha.” Îsmaîlo piştî têr xwar lingê xwe li ya mayî da û got: “tiştên ku nayên bîra mirov jî hûn tînin bîra mirov.” (Sadinî, 2012:147).

Kak Akrim Kanî: Derbarê jiyana û kesayeta vî tîpî de, li ber destan agahî tune ne. Di berhema Gîwî Mukriyanî *Bo Pêkenînê* de, heft pêkenok li ser navî wî ne û ew di wan pêkenokan de, ne kesekî ji rêzê ye tîpê pêkenokê ye. Pêkenokên wî bi piranî li Rewandizê derbas dibin, îhtimal e ku ew xelkê derdora Rewandizê be û tîpekî wê deverê be.

“Rojêkî mamosta le Kak Akrim Kanî pirsî; minare nêre ya mêye? Ewîş gutî nêre. Mamosta gutî bo çî? Akrim gutî bexwa dil, derûnîmin helnagrê ke ew minarey bew dirêjî û gewreyîyewe bikeme mêyîne.” (Mukriyanî, 1965:102).

Xale Receb: Derbarê jiyana vî tîpê jî agahiyên berdest tune ne. Tenê tê zanîn ku li Silêmaniyê jiyaye. Pênc pêkenok li ser navê wî hatine tomarkirin û weşandin. Di pirtûka *Bo Pêkenînê* çar pêkenok, di pirtûka *Rîştey Mirwarî* de jî pêkenokeke vî tîpî heye.

“Xale Receb şûtyêkî le bazarî kirî birdiyewe le malî şikandî spî derçû, gutî bexwa min le hemû layenîkewe bextim reşe, tenya le şûtî da spîye.” (Mukriyanî, 1965:90).

Xelîlê Pixê: Ev tîp jî Stilîla Nisêbînê ye. Sadinî derbarê wî de weha dibêje; “Hemşehriyekî Apê Mûsa hebû, navê wî Xelîlê Pixê bû. Ew jî li devera Mêrdîn û Nisêbînê bi qerf û henekên xwe bi nav û deng bû. Heta hinek camêr dibêjin serkaniya pêkenokên Apê mûsa ew bûye.” (2012:15).

³⁴ Alhuseynî, Ş. T. (2009). *Simo Wisa Axivî*. <http://www.semakurd.net/kurdish/article/pirt%C3%BBka-p%C3%AAkenok%C3%AAAn-isma%C3%AEI%C3%AA-d%C3%AEn-ji-we%C5%9Fan%C3%AAn-sema-derket>. 21.12.2017.; Hisên, Y. (2017). *Tûrikê Zêran (Pêkenîn û Kur-teçîrokên Folklorî Kurdî ji Rojavayê Kurdistanê Deverên Amûdê û Qamişlo*. Silêmanî: Enstîtuya Kelepûrê Kurdî.

“Xelîlê Pixê rojekê diçe daran. Daran dibire, piştî darên xwe dibire tîne li kerê xwe bar dike û dide rê ku were gund. Lê ker nameşe înadek bêlome ew girtiye û naçe. Xelîl hindî diajo ker nameşe. Dawiya dawî Xelîl hêrs dibe û darekê li lingê kerê dide, lingê kerê xwe dişkîne. Paşê dike qîr û hewar. Gelek gundî dengê wî dibihîzin û tên cem wî û dibêjin:

- Te xêr e?

- Niha min gote we, min lingê kerê xwe şikand. Êdî divê hûn li ser vê meselê neaxivin. Min ji ber vê hindê kir hewar.” (Sadinî, 2012:203).

A-3. Tîpên Binavkirî yên Rewşenbîr

Ev tîp, rewşenbîr û zanayên civakê ne. Hin pêkenok birra jî yên wan in hin jê jî civakê li ser navê wan xwendine. Bi qasî tesbîtên me heta niha li ser çar rewşenbîran pêkenok hatine gotin: Apê Mûsa, Cegerxwîn, Mela Ehmedê Xasiyê Licê û Şêx Rezay Talebanî. Ji van her çar tîpan ê herî aktuel jî Apê Mûsa yan jî bi navekî din Mûsa Anter e. Beyî ku em qala kitekitên jiyana wan bikin, em ê mînakên pêkenokên wan bidin.

Koçer derbarê Apê Musa, pêkenokên wî û hevşibandina wî ya bi tîpên din de dibêje ku;

“Min gelek caran dîtiye ku, di nav civatê de kesekî/ê weha dest bi meseleyeke henekî kiriye: “Apê Mûsa rojekê... Yanî ev dihat wê maneyê ku Apê Mûsa wekî Behlûl, Melayê Meşhûr, Nisredîn Xoce û wd. bi rabûn û rûniştandina xwe ve, bi henek û meselokên xwe ve ketibû tûrikê folklorê û ji ser zimanê gel danediket.” (Koçer, 2012).

Di vê pêkenokê de, Apê Mûsa bi awayekî wisa bersiva waliyê Mêrdînê dide ku ev hem mirovan difikirîne hem jî dikenîne.

“Sala 1965’an Apê Mûsa li Mêrdînê dibe namzetê mebûstiyê. Piştî demekê din waliyê Mêrdînê gazî Apê Mûsa dike; piştî tehdîdan walî jê re dibêje:

- Di propagandaya hîlbijartinê de kûrtçülükê (kurdperweriyê) neke!

Apê Mûsa jî bi şêwazeke îronîk weha bersiv dide:

- Walî beg, jixwe ji bo ku ez di meclîsa Enqereyê de kûrtçülükü bikim, dibim mebûs.” (Koçer, 2012).

Herweha, li ser navê Cegerxwîn jî gelek pêkenok tên gotin. Yek jê jî bi vî awayî ye:

“Go Cegerxwîn hat Serxetê, li mala melayekî bû mêvan. Evana diaxivin, zimanê wan ji hev da ketiye, peyvek bi Kurdî be didu bi Tirkî ne. Cegerxwîn aciz dibe. Dibe şev, gedê mêrik tê hundir, Seyda mêze dike, potikek bi guhê lêwîk va ye, dibê, “Xêr e?” Mêrik dibê, “Qulaxê wî îltîhap qapmîş kiriye.”³⁵ Seyda bêhna wî teng dibe lê nade der. Dibe sibeh, Cegerxwîn dê bi rê bikeve, ê de melayê me nav û dengê wî û helbestvaniya wî bihîstiye. Mela dibê, “Seyda Kurdîya me çawa ye, ket serê te?” Cegerxwîn dibêje, “Welah Tirkîya we baş e, lê çend peyvên Kurdî tê de mane.” (Baran, 2017:10).

Di vê pêkenoka ku di ser Mela Ehmedê Xasî re tê gotin de, Xasî bi awayekî hostane arîşeyê safî dike.

“Vanê Mela Ehmedê Xasiyê Hezaniyî yê ki Mewlûdê Kirdkî (Dimilkî) nuşt, zaf weşt terriqnaynî, henekî kerdînî: Rojî Mela Ehmedê Xasî ra persay, vato:

- Seyda, cixara şimitiş (antiş) heram o yan helal o?

Mela Ehmedê Xasî vato:

- Ekî helal a ma şimenî, ekî heram a me weşnenî.” (Malmîsanij, 1991:228).

Şêx Riza Talebanî, helbestkarekî Soran e. “Di sala 1842’yan de ji dayîk bûye. Helbestên wî yên evînê, li ser rewşa wî ya hejarî û derbideriyê, li ser stemkariya şêx û derebegan bi pirranî satîrîk in (helbestên tirane û pêkenînê ne.) Sala 1910’an jiyana xwe ji dest dide.” (Kurdo, 2010:271-272).

Di pirtûka Ela’edîn Secadî de dozdeh pêkenok li ser navê wî hatine tomarkirin. Yek ji wan pêkenokan bi vî awayî ye:

“Şex Rezay Talebanî, le diwaxanî Seyid Ebdurehman Neqîb, le Bexda ebê û nan daenên. Legel nanekeda pilawîş daenên, be dem nan xwardinewe qise eken. Dukturêkî Hîndîş Leser sîniyeke ebê, qise lewewe eka ke giyaw daru dewen ronî lê egîrêt û ron û zeyt heye. Şêx Riza elê: Min birwa bem qiseye nakem. Duktoreke elê, çon birwa nakey? Eme be taqîkirdinewe derkewtiwe ke waye. Şêx Riza elê: Minîş be taqîkirdinewe ezanim ku wa niye, eger em qiseye rast biwaye, êste em birincey malî Neqîb ronî tiya ebû!” (Secadî, 2007:97).

³⁵Guhê wî kême/edab girtiye.

B) Tîpên Temsîlkar

Hinek tîp ne xwe, civaka jê hatine temsîl dikin ji lew re navê wan wekî tîpên temsîlkar hat danîn. Ev tîp di pêkenokê de bi navê eşîr, gel, herêm û wd. derbas dibin. Ev tîp dikarin wekî ‘ekotîp’ (von Sydow, 2014:62-66) jî bên qebûlkin.

Ango temsîliyeta çi li ser wan be, bi wî navî tên xwendin. Pêkenokên ku li ser van tîpan ava bûne, di xwe de dijayetiyeke veşartî dihewînin û ev dijayetî jî piranî li ser biçûkxistina aliyê din e. Taybetiyeke tîpên temsîlkar jî ew e ku piranî zilam in, jin kêr caran bûne tîpên temsîlkar.

Bayatlı derbarê van tîpan de dibêje ku;

“Di van pêkenokan de pêkenoka ku koma Ayê li ser koma Byê dibêje; li ciyekî din koma Byê li ser koma Ayê dibêje. Her du alî jî mijara kenî li koma dijî xwe bar dike. Pêkenokên ku kurd li ser ereban dibêjin, ereb jî li ser kurdan dibêjin. Yên ku şîî li ser sinniyan dibêjin, sinnî jî derbarê şîîyan de dibêjin. Ev pêkenoka li jêr li Iraqê, kurd li ser ereban, ereb jî li ser kurdan dibêjin.” (2013:49-50).

“Rojekê kurdek û erebek bi hev re dimeşin ber bi ciyekî ve diçin. Ker dizire û zilamê ereb ji bo yê kurd bihetkîne dibêje; Bira ev kerê ha çi dibêje? Yê kurd lê vedigere û dibêje; wekî ku tu jî zanî ker bi erebî dibêjin û ez ji erebî fam nakim.” (Bayatlı, 2013:49-50).

B-1. Tîpên Temsîlkar ên Herêmî û Deverî

Ev tîpên hanê herêm û devera ku jê ne temsîl dikin. Bi piranî li wan herêman û herêmên nêzî wan herêman tên gotin. Dema parav³⁶ dest bi van pêkenokan dike di serî de dibêje; yekî botî, yekî aşitî, yekî xoşnaw, yekî têrkî, yekî torî, yekî cilînî, yekî kêrsê û wd.

Artun derbarê tîpên herêmî û deverî de dibêje ku; ev tîp dever û herêma ku lê jîne an jî jê hatine temsîl dikin. Ev tîp bi navê erdnigariyekê di pêkenokan de cî digirin lewre jî ew wê herêm û deverê temsîl dikin (2013:4).

Tîpên deverî jî tenê li devereke biçûk tên naskirin û bêhtir şênîyên wê deverê yan jî yên nêzî wê deverê van pêkenokan dizanin. Gelek tîpên deverî bere bere diguherin bi ser tîpên herêmî û berbelav ve. Ev tîp carna bajarek carna jî gund in. Bi taybetî li Kurdistanê di nav du bajar an gundên nêzî hev de ji ber rikê tîpên wisa pir in.

³⁶Kesê ku pêkenokan dibêje. Ji bo agahiya berfireh li Ferhenga Kamêran a Kurdî-Kurdî rûpela 489an binêrin.

Ev tîpên deverî, bi taybetiyên xwe yên neyînî bûne tîp. Di pêkenokan de ev tîp bêhtir wekî ehmeq, nezan, çilek, kawik xuya dibin.

Ji ber ku sînorên herêm û deveran ewçend di nav hev de ne ku zor mesele mirov pê derxe. Ji lew re di vê xebatê de ev her du di bin komekê de hatin nîşandan. Bi qasî ku di materyalên berdestî de hatin tespîtîkirin tîpên kurdî yên herêmî û deverî jî ev in: Aşîtî, botî, têrkî, torî, xerbî, xoşnaw; axbaran, cilînî, cizîrî, ewînî, eyndarî, garsî, helexî, kêrsê, mayindol û qewma.

Tîpê Aşîtî: Tîpê aşîtî, tîpek e ku li nav kurdên Suryê û bi taybet li rojhilatê Qamişlo heta bi sînorê Herêma Kurdistanê tê nasîn. Hoşeng Nîzar wekî kesekî aşîtî derbarê aşitiyan dibêje ku;

“Ev herêm dikeve Binxetê ango Rojavayê Kurdistanê. Bajar û bajarokên li rojhilatê Qamişloyê heta bi sînorê Başûrê Kurdistanê, hemû wekî Aşîtî tên binavkirin. Herçend ew jî xwe re nebêjin Aşîtî jî lê Xerbiyên Binxetê wan wisa pênase dikin. Jixwe van pêkenokan Xerbî li ser wan dibêjin, ew jî li ser Xerbiyan dibêjin. Şêniyên Dêrikê³⁷, Girkê Legê, Rimêlan, Çil Axa, Tirbespiyê Aşîtî ne.” (Hoşeng Nîzar Nûh, Agahdariya Şexsî, 6.10.2017).³⁸

Di vê pêkenokê de tîpê aşîtî yekî safikî û nezan e û ji aliyê yekî ve zû tê xapandin.

“Yekî Aşîtî çêlekeke wî ya pir xerab, diranketî û zîf hebû, zabû û tenê kilok şîr dida. Xwediyê wê jê aciz bû û xwest wê bifroşe. Cîranê wî şîret lê kir û jê re got: “Ger tu bixwazî pereyine baş ji bo wê bistînî, divê tu wê bidî delalekî”³⁹ Xerbî, ji ber Xerbî dizanin tiştan xweş bikin.” Mêrik rahişt çêleka xwe û çû Qamişloyê cem delalekî Xerbî. Yê delal pirsar eybên çêlekê kir. Xwedî got: “Hema giş eyb in: Ne şîr dide, ne diran mane û hestiyê wê derketine.” Yê delal jê re got: “Baş e. Rûnê û îşê te ji tişteki tune.”

Xwediyê çêlekê li ber dîwar rûnişt û destê xwe xist ber çena xwe û ji xwe re dinerî, bê yê delal dê çi bike. Yê delal bi dengê bilind bang kir: “Werin çêleka baş, a malan; rojê sî kilo şîr ji min bixwazin. Lê nenerin ku zîf e; avis e, lê hingî dirêj e, ev yek lê nexuyaye. Diranên wê bi pensan nayên rakirin. Çêlek ev çêlek in. Xelk pesnê yên holandî û danmarkî didin, lê ev giş li ber vê çêleka me netîstek in. Çêlekên wilo hîn

³⁷ Mebest ji Dêrikê, Dêrika Hemko ye, ne Dêrika Çiya Mazî ye.

³⁸ Hoşeng Nîzar Nûh, ev agahî bi rêya facebookê bi me re par ve kirin. Hoşeng ji bajarê Dêrika Hemko ye, ew berhevkarîya pêkenokan dike li bajarê Qamişlo û derdora wê. Ez malavayî lê dikim ku wî alî min kir.

³⁹ Delal: Kesê gazîkêr, bangêr.

çênebûne." Delalî bala xelkê kişand û ew li dor xwe civandin. Piştî pesindana delalî, xwedîyê çêlekê ket wê baweriyê ku gotinên wî rast in. Ew rabû ser xwe û ji yê delal re got: "Ji te 500 wereqe delaliya te û ez nema çêleka xwe difroşim." (Pembo, 2004).

Tîpê Botî: Navê herêma Botanê bûye navê vî tîpî. Di pêkenokên tîpê botî de, taybetiyên devokî yê Botanê diyar in. Ev tîp bi taybetiyên xwe yên çilekî û zimên di pêkenokan de dixuyên. Di vê pêkenokê de tîpê botî kesên ji Botanê temsîl dike û taybetiya çilekî û nefsekiyê li ser wan bar dike.

"Rojekê zilamekê Botî ji bo karekî xwe, xwe berî gundên deştê da. Ew çû ber derîyê malekê û li derî xist, got: -Hûn mêvanan xwedî nakin?

Xelkên deştan ji mêvanperwerîyê re, ne hewqas çê ne! Lê belê ew car li wê malê qewimîbû û ew zîlam li wir bû mêvan.

Mêvan çû hunduru û şîva êvarê jî hazir bû. Şîva wan kutilkên bi kuncî bûn û qelî jî di wan de hebû. Bê hemd dilê meriv dibijîya wanakan.

Jinik ser bergeşê tije kir kutilk û anî danî ber mêvan û mêrê xwe. Ew cara yekemîn e ku mêvan, kutilkên were xweş dibîne û zor dayê. Mêvan bi dilbijandineka were kutilkan dixwo, meriv qey dibê, ku ew ji ber xelayê filitîye!

Mêvan çewa dest bi xwarina kutilkan kir, xwedîyê malê jî hejmartin. Ewî tam bîst heb kutilk xwarin! Jinik û zarûkên xwe ewşev bê şîv man. Bû sibe, mêvan çû û mêrik sond xwar ku êdî hew pêştir, mêvanê ku ji Botan be, nahewîne!

Divê navê de, çend sal diborin. Ew mal dibîne ku waye zilamekê xerîb

Li derê wan da û dibêje, ez mîvan im! Xwedîyê malê diçe ber derî û jê dipirs:

-Birako tu ji kuderê yî?

Mêvan got:

-Babo ez xelkê Bota me!

Gava ku ewî were got, xwedîyê malê lê vegeran:

-Birako wele min sond xwarîye, ez tu caran mîvanê Botî nahewînim!

Û serpehatîya xwe û wî mîvanê Botî yê ku bîst heb kutilk xwaribûn, jêre dibêje. Mivan dibêje:

-Ehhheww ew çi yekî çavbirçi bûye!

Xwedîyê malê, fam dike ku wê ev mêvan hewqas ne xwire be. Jê dipirse û got:

-Birako, ku tu biyana, dê te çend kutilk bixwarana?

Ewî got:

-Wele ez çiqas kutilk bixwim jî, hivde, hijde, nozde!” (Zinar, 1989:191-192).

Tîpê Têrkî: Ev tîp bi kawikî û nezaniya xwe tê zanîn. Di pêkenokan de, tim û tim hatiye biçûkxistin. Vî tîpî navê xwe ji herêma Têrkan a Amedê girtiye.

“Zilamekî Têrkî, rojek ji rojên meha Gulanê, êvarê ji çolê, ji çinîna gîya vegeşîyaye malê. Birayê wî yê ji wî biçûktir çûye perê gund û li pêşîya wî rawestyaye. Dema ku birayê mezin gîhayê wir, birayê biçûk deng lê kirîye û gotîye:

-Keko, dayê mir.

Birayê mezin şaş bûye û pirsîye, gotîye:

-Dayê kengê mir?

Birayê biçûk gotîye:

-Îro mir.

Birayê mezin deng ji xwe nanîye. Birayê biçûk ku dîtîye birayê wî negirîya, ji wê yekê şaş bûye û pirsîye, gotîye:

-Keko, ma tu ji dayê re nagirî?

Birayê mezin gotîye:

-Belê ez’ê bigirîm. Çawa ez’ê negirîm!

Birayê biçûk gotîye:

-Ka tu qet deng ji xwe naynî.

Birayê mezin gotîye:

-Bira, nuha wextê çinîna gîya ye, ne wextê girînê ye. Tu dibînî ku ez nuha ji çolê, ji çinîna gîya tîm. Ez’ê di çend rojan de gîyayê xwe tev biçinim. Paşê wextê çinîna ce tê; ez’ê ceyê xwe biçinim. Paşê wextê çinîna genim tê; ez’ê genime xwe biçinim. Paşê wextê gêrekirina bêderan tê, ez’ê gêre bikim û bêderên xwe hilînim, teneyê xwe bavêjim hundir, kaya xwe jî bikişînim kadînê. Hingê serê payîzê tê û çu karekî min namîne; ez’ê rûnê û ji dayê ra têr bigirîm.” (Bozarslan, 2007:98-99).

Tîpê Torî: Vî tîpî navê xwe ji herêma Torê wergirtiye. Pêkenokên vî tîpê piranî bi botî û cizîriyan re di nav gengeşiyê de ne. Di vê pêkenokê de, tîpbûna toriyan ji ber axaftina wan a cuda ye.

“Yekî Torî nava wî dikeve, diçe ji bo ku yek nava wî hilîne. Evê ku wê nava wî hilîne jê dipirse, dibe hela bê ‘nok.’ Evê nava wî ketî dibê, ‘nahk’. Ê din dibê, wela ez hilînim jî wê dîsa bikeve, ez hilnayim.” (Gotoxê 2.).

Tîpê Xerbî: Ev tîp jî li Binxetê ye. Kesên li rojavayê nava Qamişloyê dijîn û bajar, bajarokên li rojavayê Qamişloyê wekî xerbî tên binavkirin. Ev nava, aşîtiyan daye wan. Bajarên mîna Dirbêsiyê, Serê Kaniyê, Amûdê û Hesekê xerbî ne.

“Yekî Xerbî, li TVyê temaşe dike, pê re pê re, datîne ser kanaleke kurdî, dibîne ku kartoneke kurdî ye, beq meq tê de peyda dibin, hew dibîne ku beqa malê bi kurdî dipeyive, çavên serê wî çêdibin, radibe dibêje: Mala Xwedê ava, me dî ku beqên me jî bi kurdî dipeyivin.” (Hoşeng Nîzar Nûh, Agahdariya Şexsî, 2.11.2017).

Tîpê Xoşnaw: Ev herêm dikeve Başûrê Kurdistanê. Ela’edîn Secadî bi qasî pazdeh pêkenokan berhev kirine li ser vê herêmê.

“Kabrayekî Xoşnaw cutê pêlawî tazêy hebû, çu bo karwan ew deştî “Bêtwên”e tuşî çir û dirk û dalêk bû û pêlawekanî dakend û be pêy pêxawis naye mil dirk û daleke. Kitupir çiqlek çeqê be jêr peyda le ser pêyewe dereçê! Lew kateda ke çiqlekeyan lepê derehêna eywit: Yarebî şukir, her baş bû pêlawekanim le pêda nebû egîna kunî tê ebû! (Secadî, 2007:717).

Tîpê Axbaranê: Axbaran, navçeyek e li Ermenistanê ku kurd lê dijîn.

*“Xorteki Axbaranê dibin eskerye qulixkirine. 3-4 meh derbaz dibin eva dixweze we-
ne⁴⁰ yê xwe dê û bav, xusk-brayen xwere bisîne. Li ware ew qulix dike xort ber k'era
buye , k'era xwey dike. Ew ser k'ereki boz rudine, wek sereskereki weneyê xwe der-
dixe (dikşîne). Ew weneyê xwe dê û bavê xwera dişîne û nema⁴¹ xwe da dinvise: ”
Ewi ser k'ere runistye ezim”
(<http://pekenin.com/more.php/156?url=http://www.nonumber.nl/17.03.2017>).*

Tîpê Cilînî: Cilîn, gundekî di nav devera Ewîna de ye ku girêdayî Stewra Mêrdînê ye. 10 km dûr e ji Ewîna. Cilînî pêkenokên xwe li ser ewîniyan, ewînî jî li ser cilîniyan dibêjin.

⁴⁰ Wene: Wêne, fotograf, suret.

⁴¹ Nema: Name

“Yekî Cilînî, şeveke zivistanê li çolê mabû, ji bo ku li malekê zikê xwe têr bike û di nava nivînên germ da rakeve çû gundekî, li perê gund dageriya malekê, li deriyê malekê xist. Xwediyê malê derî lê vekir. Yê cilînî got:

-Selamunaleykum, ez xwarzîye Xwedê me û dixwazim îşev bibim mîvanê we.

Xwediye malê got:

-Aleykumselam, serseran û serçavan, bide dû min.

Rabû ew bir nava gund û bi tiliya xwe mizgefta gund nîşanî wî da û got:

-Mala xalê te wa ye, here bibe mîvanê mala xalê xwe....” (Xamo, 2013).

Tîpê Cizîrî: Bajarê dîrokî yê bi navê Cizîra Botan navdar ku demeke dirêj bûye navenda Mîrnişîniya Botanê.

“Jinika Cizîrî eprax û dolmeyên xwe dipêçe, datîne ser êgir. Paşê jî ji keça xwe re holê dibêje:

- Keça min ser serê dîya xwe, eve epraxê me li ser tûpê ne. Ez ê herim mala cîran. Dema eprax kelîyan were xeberê bide min.

Û diçe mala cîranê xwe, dikevin sohbetê. Piştî bîskeke, keçik welê bêhnbizdayî tê cem dîya xwe:

-Dayê daye! Zû were malê!

Dîya wê:

-Xêr e, çi bûye keça min!

-Dayê were malê, babê min mir!

-Te heft xwelî li serê xwe kirî! Wele te ziravê min qetand. Min got qey tu yê bêjî epraxên te şewitîn.” (Bîngol, 2013:46).

Tîpê Ewinî/Sirgucî:⁴² Ev tîp bi du navan tê nasîn. Jixwe Sirgucî navê tirkî yê vê deverê ye. Di nav pêkenokên kurdî de tîpê sirgucî û tîpê ewinî heman tîp e. “Devereke girêdayî Stewra Mêrdînê ye. 14 km dûrî Stewrê ye. Tê gotin ku 33 gund bi navê Ewîna tên hesibandin. Navê hin gundan weha ye: Zone, Cilîn, Bernîşt, Tizyan, Şûtê, Qirdîlek, Qerhêta.” (Mem Mukriyanî, Agahdariya Şexsî, 3.05.2017).

“Yekî Surgicî dihere bajêr, lê cîhekî nabîne ku kera xwe pê ve girê bide. Dinehêre ku trê li stasyonê sekiniye. Dibêje; “weleh ji vê baştir tune ye” kera xwe pê ve girê

⁴² Ji bo agahdariyê lê binêrin: <http://mehmetayaz.blogspot.com.tr/2008/02>

dide. Dihere sūkê alavên xwe dikire û vedigere. Lê belê dema tê cîhê kerê, dinehêre ne ker û ne trê. Dibe niçeniça wî û dibêje:

-Hey, hey mirat, ma tu çû çû, ev çima te trêna xelkê bi xwe re bir hîi? ” (Mazî, 2014: 293).

Tîpê Eyndarî: Eyndar, gundekî li rojavayê Hezroya Amedê ye. Nişteciyên vî gundî bi kirmanckî diaxivin.

Îndarî diçin Amedê. Di ber dikanê re derbas dibin. Yek diçe ji dikandar re dibêje:

-Petêxên te bi çiqasî ne. Dikandar dibêje:

-Bi sed kaxidî ne. Yê îndarî petêxê dikire dibe, diçe. Bi rê de ew û hevalên xwe şîl dîkin dixwin. Hevalê wî dibêje:

-Kuro te çima çû vê petêxê bêtam anî. Mêrik dibêje:

-Law hê hang e. Baş negihîştîye. Yek si şûna wan re diçe. Bala xwe didê ji kundirê re dibêjin “petêx. Ji wan re dibêje:

-Law qey hûn dîn in. Ew kundir e, kundir. Yek dibêje:

-De here îşê xwe nezan. Petêx e hê kal e. Hinek jî bigihîştî wê xweştir bûya. Mêrik dibêje:

-Malxerab petêx û van dendikan. ” (Akyol, 2008 a:104).

Tîpê Garsî: Garsa, deverê ji navçeya Dihêya Sêrtê. Gundên Êkend, Kuçnis, Kevzin, Hût, Tirî, Tal û Xerxur wekî Garsa tên hesibandin.

“Yekî gundî Garsî dibe diçite tiraktorekî bîne. Îca go tiraktorê dikire digre têye malê. Xeletî deste wî li derkî dikeve, elektirîk vêdkeve. Îca dikke nakke nizane çawa vemrêne, nizane digma wê kwidê ye. Radbe diçite aliyê malê, dibe pîreka; ka berkik (merşikî) em biavên ser çavên wê. ” (Gotoxê 3.).

Tîpê Helexî:⁴³ Helex, gundekî Midyada Mêrdînê ye ku niha 100 mal lê hene. Gundekî dirokî ye û tê de êzidî, siryanî û misilman pêkve dijîn.

“Rojekê zelamekî ji gundê Helexê (li ba Midyadê) bi şev, ji xewê rabû ser xwe ji bo kû ew herê êzingan ji bo şewata malbata xwe bîne. Piştî kû yê helexî kerê xwe kurtan kir û werqîlên xwe avêtina ser kurtanê kerê, ew hêy çav li xew bû. Bi wê çevlixewîyê,

⁴³ Ji bo agahdariyê lê binêrin: <https://www.facebook.com/search/top/?q=he-lex>.

wî destên xwe di şevreşê de li bivirê xwe gerand, destîyê heskê kevta destê wî, ji yê helexî wera kû ew bivir a, wî heska xwe xista ber werêşê kurtanê kerê xwe û wî kerê xwe da ber xwe û wî berê xwe da çîyê, ji bo kirina êzingan.

Ew giha çîyê, wext hê şev a, wî destê xwe avêta destîyê heskê, ji bo kû ew bi wê heskê, bi nêhta bivir, êzingên xwe bikê. Derba pêşê kû wî hesk li darê xist, destîyê heskê şikest û serê heskê firrî, weka 30 metroyî ji zilêm bi dûr kevt, êzingvan li ser navê bivir, li heska xwe gerîya, ew çiqasî li heska xwe gerîya wî nedît, dawî, ew xisp ma kû ew dûhayan ji xwedê bikê ji bo kû ew heska xwe bibînê. Wî dûha ji xwedê kir: “Ya xwedê, tu bihêla kû ez bivirê xwe bibînim, bi soz ez jî ez ê heskek nîsk ji te ra bidima nêdir.” Bi wê gotina xwey nêdir ra, seriyê heskê kevta destê yê helexî, yê helexî gota xwedê; ev çî xwedêkî bêy sebir, hê min bivir nedîtî ew heskê ditêxa destê min û ew nîskan dixwaza.” (<http://www.ezdaweb.de/and.html>. 16.03.2017).

Tîpê Kêrsê: Kêrs, gundekî bajarî Gimgima Mûşê ye. 10 km dûr e ji Gimgimê û dikeve rojhilatê vî bajarî. Navê wan, bi kêmaqilî, kawikî û serhişkiya wan derketiye. Gelek nişteciyên vî gundî koçî Ewropayê kirine û li wir dijîn.

“Yekî Kêrsê li Ewropayê biye. Çûye ji xwi ra pezekî girtiye bibe here şerjê bike mala xwe da. Dîre tê ber tîranê. Dibê ez ê bibim herim ewê. Goravliyê tîranê dibê, tu nikarî pez bibe here. Hevdu dibin tînin. Ê de zimanê wî jî zaf tune. Yê Kêrsê aciz dibe, dibê:

- ‘Ew ‘ew wî, meh meh no. (Yanê hûn kûçika digrin peza nagrin.) (Gotoxê 4.).

Tîpê Mayindolî: Mayindol, gundekî bajarî Sineyê ye ku dikeve Rojhilat. Navê wan bi kêmaqiliya wan derketiye. Di pirtûka Ela’edîn Secadî de heft pêkenok li ser navê vî gundî hatine tomarkirin.

“Kabrayekî Mayindolî, çwar kerî dabiwe pêş le şarewe bo mal eçiwewe. Geyişte Qerac şar, siwarî yekêk le kerekan bû, seyrî kird sê kerî le pêşeweye, ke dabeziyewe temaşay kird çware, siwarbowe sêye. Serî lê têk çû! Le paşa wîfî: Be pêyan biçimewe kerêk qazanc bikem, lewe baştîre siwar bim û kerêkim le kîs biçê! Be pêyan milî rêy girt, ta çîwiwe malewe nîwe merg bû! (Secadî, 2007:150).

Tîpê Qewma: Qewma, gundekî Dutaxa Agiriyê ye. 30 km dûr e ji Dutaxê. Gundekî çiyayî ye.

“Dibê, carkî ne deh zîlamên Qewma nigê xwe bi hev ra kirine tenûrê. Tenûrê Serhedê jî di erdê da ne. Nigê xwe tevîhev dîkin, lewma jê ra dibên Qewmayê Ker. Ew dibê nigê min, ew dibê nigê min, nigê xwe ji nav hev dernaxin. Yekî bîaqîl tê, dibê çawa bûye, dibên wele em nigê xwe nava hev dernaxin. Maşakî hildide dikeve nava wan, gi direvin; dibê a we nigê xwe nas kirin.” (Gotoxê 4.).

B-2. Tîpên Temsîlkar ên Mezhebî û Olî

Di destpêka van pêkenokan de navê tîp ê li ser nasnameya wî/wê ya olî tê bilêvkirin, wekî; yekî êzidî, yekî fileh, yekî xaçperest, yekî cihû wd. Yıldıırım û Elçîn ev tîp wekî ‘tîpên kêmar’ (Elçîn, 2004; Yıldıırım, 1976) Sakaoglu jî wekî ‘tîpên dînî û baweriyê’ bi nav kirine (vgz Bayatlı, 2013:39).

“Dema yek rûpelên dîroka Kurdistanê diqulibîne dikare hejmareke mezin a dîn û mezhebên cihê bibîne li ser vî erdî (Omerxalî, 2007:13). Wekî ku Omerxalîyê jî destnîşan kiriye, Kurdistan bûye welatekî pirnetewe, pirol û pirmezheb. Zêdebûna van ol û mezheban bûye sebeba gengeşî, alozî û rikê.

Ev ol û mezheb jî bûne tîp. Ev tîp, temsîla ola xwe yan mezheba xwe dîkin. êzidî, elewî, cihû, henîfî, şafî û xirîstîyan wd. Ev pêkenoka han li ser êzdiyan tê gotin.

“Rojekê yekî êzdî dihere mêvandariya yekî Mihemedî. Ji dirêjbûna simbêlên wî devê wî nexuyabû. Ew û mazûvanê xwe rûniştin û li benda xwarinê bûn. Lê çend demjimêr derbasbûn xwarina wan nehat. Carê mazûvan bangî jina xwe dikir û digot:

-Keçê de ka xwarinê bîne.

Jina wî digot:

-Bila

Carekê duduyan weha got, lê êdî sebra mazûvan nehat. Bangî jina xwe kir. Jina wî hat, jê re got:

-Keçê ma ka te çi kiriye?

-Weleh min tirtûm çêkiriye.

-Ê de ka hey tirtûm e, ziqûm e ka bîne.

Jina wî got:

-Wele ma

- Çi? Keçê çi?

- Ma te di min got qey devê mêvanê me tune ye.

Mazûvan bi simbêlê mêvan girt û bilind kir, got:

-Ma ev çi ye, ev ne aşê hawarê ye!" (Mazî, 2014:321).

Di vê pêkenokê de, di ser simbêlberdana êzdiyan re, rexna li dînê wan hatiye kirin. Û di pêkenoka jêr de jî, pêkneanîna şertên îslamê bûye malzeme ji zîlamê îsewî re.

"Yekî mesîhî û misilman li ba hevin bi hev ra mijûl dibin, mesîhî dipirse dibêje:

- Gelo misilmanetî çewa ye?

Yê misilman jî dibêje:

- Divê meriv limêj bike, araqê venexwe, zînayê neke, rojî bigre.. yê mesîhî jî dipirse dibêje:

- Niha îro em bi hev ra çûn meyxaanê te araq vexwar, min nedît te limêj jî kir, em çûn te ji keçikan re jî negot na. Niha tu jî misilman î?

Yê misilman dibêje:

- Elhemdûlîlah lê ez misilmanim.

Yê îsewî jî dibêje:

- Ger wisa be elhemdûlîlah ez jî misilman im, haya min jê tune." (www.tirsik.net).

Di hin pêkenokan de mirov rastî rik, berberî hetta nefreta ji hev jî tê. Ev pêkenoka li jêr mînaka wê ye.

"Rojekê rojnamegerek çûyê gundekî elewî, dîtiye ku jinikek lawê xwe re tim dibêje "lawê min Omer were, Omer here.." Bala rojnameger kişandiye û nêzikî jinike bûye gotiye, bibore lê qasî ku dizanim elewî navê Omer lênekin li zarokên xwe, lê xuyaye ku navê zarokê wê Omer e. Ew çawa dibe. Jinik gotiye, welle navê zarokê min a yekemîn Hûsen bû nexweş ket û mir, ya duyemîn Hesên bû nexweş ket û mir, veka me nav Omer lêkir, ku vê carê nexweş dibe dimire jî qet nebe yekî ji suniyan dimire." (<http://tirsik.net/index.php?mijarid=1404>. 07.12.2016).

B-3. Tîpên Têmsîlkar Zaravayî

Ji ber ku kurd xwedî zaravayên cuda ne, li ser devok û zaravayên hev hene-kan dikin û pêkenokan dibêjin. Kurmanc li ser kirmanc û soranan, soran li ser kur-mancan, kirmanc jî li ser kurmancan pêkenokan dibêjin. Ev pêkenok piranî li ser taybetî û şeweyê axaftina wê devok û zaravayê ye.

Vê pêkenokê piranî kurdên kurmanc li ser kurdên dimilî⁴⁴ dibêjin û henekê xwe bi hezkirina wan a pîvazan dikin.

“Du Kurdên Dimilî li ser xweşbûn û tamdariya xwarinê sohbet dikin. Yek ji yê din dipirse:

-Gelo heval, ji te re kîjan xwarin xweş û tamdar e?

Ewî hîn dawîya pîrsa xwe nayîne, hevalê wî bersivê dide:

-Bi serê min û bi serê te, ku nadim malê dinê; herçî ji min re, ji nêrika pîvazê xweştir û tamdartir tu xwarinek din tune!

Piştî vê bersiva han, her du jî bîstekî bê deng dimînin. Paşê xwediyê bersivê ji yê din dipirse:

-Ka min a xwe got, ma tu ji kîjan xwarinê hez dikî?

Yê din bi qehr:

-Ma malxirab, te tiştekî ji min re nehişt, ku ez bêjim!” (Tîgrîs û Motkî, 1989:77).

Di hin pêkenokên kurdî yê berdest de hat dîtin ku nefamkirina ji zaravayên hev jî bûye sedema pêkenokan. Ev pêkenok jî yek ji wan pêkenokan e, ku li ser yekî kurmancîaxêv û soranîaxêv hatiye sazkirin.

*“Kurdekî Kurmanc û yekî Soran, li welatekî Ewropayê rastê hevdu tên. Û bi trênekê de, bi hevdu re rêwîti dikin. Yê Soran barê wî giran e. Çend bawil û çenteyên wî he-
ne. Pereyê wî jî tune. Ziman nizane. Werhesil perîşan e. Şansê wî heye, ku yê Kur-
manc rastê wî tê. An wî, dê gelek perîşanî bikşanda. Heta bajarekî bi hevdu re rêwîti
dikin. Paşê riya wan ji hevdu diqete. Destên hevdu digirin û xatir ji hevdu dixwazin.
Yê Soran piştî hewqas alîkariyê, ji yê Kurmanc re dibêje:*

-Zor spas kaka!

*Yê Kurmanc matmayî dimîne. Ji xwe re dibêje; “min hewqas alîkariya wî kir û hîn ew
ji min re dibêje, zor spas. Yanî spaskirin jî jê re zor tê.”*

⁴⁴ Kurdên dimilî: Navekî din e kurdên kirmanc.

Li dû zor spasê destê yê soran berdide û:

-Bi xwedê tu kurekî neqenc î. Piştî hewqas zehmetî dîsa zor spas ha!..

Yê Soran şaş dimîne. Nedizane çi bike û çi bêje.

Paşê bi milê yê Kurmanc digire:

-Kakcan min spas dikem! Tu têngîhêştî.

Yê Kurmanc serê xwe dihejîne:

-Belê, belê ez tê gehêştim, ku tu kêma spas dikî!” (Tîgrîs û Motkî, 1989:258).

B-4. Tîpên Temsîlkar ên Neteweyî

Kurd, ermen, ereb, çeçen, tirk û asûrî bi hev re li Rojhilata Naverast dijîn. Ev têkiliya dûrdirêj carna bûye sebeba lec, pevçûn û şerên giran, carna jî bûye mijara pêkenokan. Di van pêkenokan de du tîp bi hev re cî digirin û her yek gelê xwe temsîl dike. Stith Thompson ev pêkenok di polînkirina xwe de, di navbera herfêhmara X600– X699. de bi navê “Pêkeniya derbarê netewe an nijadan de” (vgz Demir, 2016:269) nîşan kirine.

Di yên ku kurd dibêjin de, kurd serketî; di yên tirk û ereb dibêjin de gelê wan serketî ye. Di van pêkenokan, em rastî gelek sembolên neteweyî tên. Ji ber ku em yên kurdan vediguhêzin, di van pêkenokan de tîpê serketî kurd e û yê binketî jî yên din in.

“Kurdek, bi xencera xwe davêje ser Erebeke çekdar û çekê wî jê digire. Eba wî jê dike. Paştî kiras û derpêyê wî. Û herwiha bi hêsayî wî tazî dike. Li serê Erebe egal tenê dimîne. Lê Erebe egalê nade. Kurd xencera xwe lê gij dike û bi ser re diqîre:

-Ka egalê jî bide, an ez dê te bikujim.

Ereb dibêje:

-Nabe! Egal namûsa min e! Destê xwe dirêjî namûsa min meke. Heger tu destê xwe dirêjî egala min bikî, welle bille ez dê xwîn birjînim!” (Tîgrîs û Motkî, 1989:50).

MacHovec, ev cure pêkenok wekî ‘**qerfa etnik**’ bi nav kirine (vgz Uçar, 2005). Van pêkenokan netew li ser hev dibêjin û di van pêkenokan de carna dijîti digihê asta heqaret û nefretê. Di vê pêkenokê de jî kurd xwe mezin dike û tirkên li hember xwe jî biçûk dixê.

“Dibêjin rojekê tirkek û kurdek çûn diziye. Polîs bi wan hesiya û bera dû wan da, yê kurd xwe avêt bin tirimbêlekê û gava polîs hat got; welleh ev tirimbêla min xerab bûye, ez tamîr dikim. Yê tirk jî xwe avêt bin kerekê, yê polîs jê pirsî tu çi dikî? Got ev dêya min e, ez şîrê xwe dimijim û yê polîs meşiya.” (<http://tirsik.net/index.php?mijarid=1404&rpl=3&rpl=2&rpl=2&rpl=1&rpl=307.12.2016>).

B-5. Tîpên Temsîlkar ên Eşîrî

Tîpekî din ku di pêkeninên kurdî de em rast tên, tîpên bi êl û eşîran ve girêdayî ne. Herçend li ser her êl û eşîrê pêkenokên wisa hebin jî, li ser hin eşîran hejmara van pêkenokan pir û pir zêde ye. Hin pêkenokên derbarê eşîran de weha ne: *“Yek ji eşîra Jîrkan⁴⁵ di leşkerîyê de li rasta fermanदार tê, lê bêtî ku silavê bide jê dibore. Ev helwesta wî gelek li zora fermanदार diçe û ban lê dike. Lê ew bi Tirkî nizane. Yekî tercûman tînin. Bi wesîteya tercûman jê dipirsin:*

-Te çima silav nedabû fermanदार û tu çûyî?

-We ji ber vê çendê ban li min kiriye?

-Erê!

-Ji fermanदार re bibêje, vê carê çû, carekek din.” (Bîngol, 2013:186).

Di vê pêkenokê de jî tîpê pêkenokê kesekî ji eşîra teyî ye ku ew di vê pêkenokê de bi kawikiya xwe bûye tîpê pêkenokê.

“Yê Teyî⁴⁶ mabû bê çixare, hedara wî nedihat. Hema rabû û hate ser rê û li benda rêwîyekî sekini. Di dawîyê de rêwîyek hat. Dema yê rêwî nêzîk bû yê Teyî gotê:

-Xalo, te tûtîn heye?

-Erê xalo.

-Te perik jî hene?

-Erê hene. Tûtîn û perik danê.

-Xalo, tu dizanî bipêçî jî?

-Erê, ez dizanim bipêçim jî. Jê re pêça.

-Xalo te agir jî heye?

-Erê xalo, min agir jî heye. Hema yê rêwî çixare kire devê xwe de pêxist û çû.

-Xalo, xalo ka çixarê, te çixare jî bir.

⁴⁵ Jîrkan: Baskekî ji konfederasyona eşîrên ertoşîyan ku li Cîlemêrg û Qilebanê nişteci ye.

⁴⁶ Teyî: Kesê ji eşîra teyan. Ev eşîr li bajarên mîna Cizîra Botan, Silopya û Şîrnexê nişteci ye.

-Erê min bir, madem te perik, tûtin, agir nîn e û tu nizanî bipêçî jî, tu çima çixareyê vedixwî?" (Bîngol, 2013:44).

Êl û eşîrên ku cîranên hev in, têkiliyên wan bi hev re hene; van pêkenokan derbarê hev de dibêjin. Ev tîp û pêkenok, bi piranî, li herêmên dûr nayên zanîn ango îhtimaleke kêr e ku yekî ji eşîra *badikan*⁴⁷ derbarê eşîrên teyan, *kiçan*⁴⁸ û *batûyan*⁴⁹ de bibêje; çimkî erdnigariya ku ev eşîr lê belav bûne; dûrî hev in. Dema ku pêkenokek li ser *mizûriyan*⁵⁰ tê gotin kesên ku herî zêde dikenin kesên ku danûstandina wan bi wê eşîrê re hene, ne. Wekî ku Topal jî dibêje; "pêkenokek herî zêde li ciyekî ku derketiye komik e." (1999:6). Ev pêkenoka li ser beraziyan tê gotin, ango tîpê pêkenokê Berazî ne ku ew bi serhişkî û zoriya xwe navdar in.

"Dibê yekî Berazî⁵¹ serê sibehê rahişt kulingê xwe û hat cem mele, go: Seyda ez dixwazim tu fitûkê bide mi û kulingê xwe li ber mele li erdê xist. Mele got:

-Ka çi mesela te ye?

Yê Berazî got: Pezê min heye û bûye wextê dewkîlanê, meşka me tunebû, lê kûçikekî min î girs hebû, mi rabû kûçik serjê kir û çermê wî kir meşk û em dew tê de dikilên, ma helal e yan heram e û kulingê xwe li ser serê mele dihejîne.

Mele ma heyirî, bêje heram e wê bi kulinga pêkeve, go: Ezbenî helal e!

Mêrik rabû ser xwe, go: Wey saeta te xweş, naxwe, nîfîşkê serê sibehê wê ji melayê mi re be." (Tîrêj, 2015:75).

Di vê pêkenokê de jî tîpê pêkenokê yekî mamxurî ye. Ev eşîra han di pêkenokê de bi dizîtiyê bûye tîpê pêkenokê.

"Li aliye Colemêrgê eşîrek heye navê wê Maxmûrî⁵² ye. Ev eşîreta Mexmûran bi dizîna bizinan navdar e. Zarokên malbateke vê eşîrê bizineke qelew didizin û dikine şîv. Lê bavê malê pîremêr e û tobe kiriye ku îdî goştê heram nexwe. Kebanî dibêje: "De kerem ke were goşt bixwe." Mêrik dibêje: "Na, nexêr ez goşt naxwim, goşt heram e, lê hinek ava goşt bidin min ez bi nanê xwe bixwim." (Sadînî, 2012:27).

⁴⁷ Badikan: Eşîreke ku endamên wê li Silîva, Pasûr û Mûşê dijîn.

⁴⁸ Kiçan: Ev eşîr li bajarên mîna Cizîra Botan, Hezex nişteci ye.

⁴⁹ Batûyan: Ev eşîr li bajarên Cizîra Botan û Şîrnexê nişteci ye.

⁵⁰ Mizûrî: Eşîreke ku li Kurdistanê başûr nişteci ye. Ev eşîr, baskekî eşîra barzan e.

⁵¹ Berazî: Navê konfederasyona eşîrên ku li bajarên mîna Entab, Kobanê, Pîrsûs, Serê Kaniyê û Ri-hayê dijîn. Gelek baskên vê eşîrê hene.

⁵² Îhtimal e ku nivîskar ev nav xelet nivîsiye çimkî li herêma Colemêrgê eşîra mamxuran heye.

B-6. Tîpên Temsîlkar ên Partî û Rêxistinên Siyasî

Tîpekî din ku di pêkenokên kurdî de em rast lê tên tîpên temsîlkar ên partî û rêxistinên siyasî ye û wekî rêgezeke xwezayî ev partiyên siyasî hevdu naevînîn, li dij hev radibin, gotinên hev pûç dikin û ji hev ne razî ne. Hetta zêdetirê vê yekê dijbûna partiyên siyasî gihîştîye wê radeyê ku bibe sedema şer û pevçûnan. Îcar ev partiyên siyasî ji bo têkbirina dijberên xwe pêkenokan vedigêrin li ser yên hemberî xwe. A li ser Byê, B li ser Ayê dibêje. Ev tîp, partî û rêxistina xwe temsîl dikin.

Uçar derbarê pêkenokên siyasî de dibêje ku; “Taybetiya sereke ya van pêkenokan ew e ku pir zû çêdibin û zûka jî tên jibîrkirin.” (2011:317). Ev jî nîşan dide ku ev pêkenokên siyasî ku îro roj piranî ji aliyê partîhezan ve tên gotin dibe ku piştî bîrê jibîrkirin.

“Dîsa divê neyê jibîrkirin ku rêxistinên kurdan li ser hev dibêjin. Wekî Pkkyî li ser Pskyiyan, Pskyî li ser Pdkiyan, Pdkiyî li ser hwd. dibêjin.” (Sadînî, 2012:15). Di vê pêkenoka jêrîn de tîrsa tîpê pêkenokê dibe malzeme ji rêxistin û partiyên siyasî yên dijber re.

“Rojekê komek gerilla ji bo ku tetbîqakê bikin derdikevin dervayî wargehê. Hê ew di rê de dimeşin, qumandar jimarê dixwaze. Jimar ji yekê dest pê dike û wisa digihîje panzdehan. Ew ji yê paş xwe re dibêje “panzdeh”. Yê şazdehan “bazde” fêr dike û ew jî ji yê pişt xwe re dibêje: “Bazde.”

Dema wisa dibêje hemû gerîllayên li paş wî yeko yeko bazdidin û xwe di nav keleman de vedişêrin. Qumandar dibêje qey tiştêk bûye. Dixwaze ku hîn bibe. Hemûyan berhev dike, lê mêze dike ku gerîllayekî ji Başûrê Biçûk “panzdeh” wekî “bazde” fêr kiriye.” (Sadînî, 2012:229).

Li Tirkiyeyê di nav partiyên çepgir û rastgir; di nav partiyên çepgir û çepgir de jî nîqaş û hevdu neecibandî heye û ji vê meseleyê jî gelek pêkenok derketine. Îcar qismek ji wan bi kurdî ne, loma ew vê xebatê jî eleqedar dikin. Ev pêkenoka yek ji wan e:

“1970 de çepgîrê Anqara werteyê xo de persa “sosyal faşist kamî rê vanê” ser nanê hurê. Qese ardo nat, berdo dot, hama kesî besenêkerdo areze (îzeh) bikero. Tayêne

na persî ser o nayê hurê. Kes no hurenayîş de ser nêkuto, hama onca kî jûvîn ra qesê xo nêseviknitê.

Rozû ra jû roze, unîversîteya Anqara de jû çepgîrî besenêkerdo qesû bîyaro pêser. Xo ve xo vato “Gereke ez kî bin de memanî. Ez ke çepgîrane cavê xo bidîne.” Tenê ke fikirîyo, dima vato:

-Uwo ke sono sinema û tîyatro, ey ra “sosyal faşist” vanê.” (Dogan, 2014:21).

C) Tîpên Rasterast

Ev tîp beyî ku temsîla kesekî bikin yan jî beyî ku bên binavkirin, bi rola xwe ya jiyânî bûne tîpên pêkenokan. Di jiyana rojane de, di nav karûbarên ji rêzê de dixuyên. Pêkenokên ku ew tê de tîp in jî qewimîn û bûyerên hergav in.

“Ev tîp, ne tîpên berdewam in. Ji ber ku taybetiyên wan ên berbiçav tune ne ev tîp zû tîn jibîrkirin. Ev tîp, hêdî hêdî cîyê xwe didin tîpên din ên pêkenokan.” (Yıldırım, 1976:28). Tîpên rasterast di pêkenokan de bi sê awayan dixuyên:

C-1. Tîpên Rasterast ên Malbatî

Ev tîp jî endamên malbatê ne. Dê, bav, zarok, xwesû, bûk, nevî, bapîr, dapîr, xal, xaltî, ap û met tîpên malbatî ne. Bi taybetî di nav kurdan de li ser xwesû û bûkan gelek pêkenok hene. Di van pêkenokan de, piranî du tîp bi hev re dixuyên.

“Rojek zilamek û her sê kurên xwe li oda xwe rûniştî bûne. Mêrik tî bûye û zivirîye ser kurên xwe û gotiye:

-Ka yek ji we ji min ra tasek av bîn.

Kurê mezin deng li birayê xwe yê navîn kiriye û gotiye:

-Bavo tî bûye, rabe jê ra tasek av bîne.

Kurê navîn jî deng li birayê biçûk kiriye û gotiye:

- Bavo tî bûye, rabe jê ra tasek av bîne.

Hingê kurê biçûk zivirîye ser bavê xwe, destê xwe bi alîyê her du birayên xwe ve dirêj kiriye û weha gotiye:

-Bavo, tu çima av ji vana dixwazî û dikevî binê mineta wan? Wek mêran rabe here ber cêr û ji xwe ra av vexwe, ji kerema xwe tasek jî ji mi ra bîne! (Bozarslan, 2007:57).

Di vê pêkenokê de tîp bav û kurên wî yên bêxîret in. Di pêkenoka jêr de jî tîp dîsa yên malbatî ne; jinik û peyayê xwe ne.

“Mêrd: Çon nazanîkey le dayîk bûy?

Jin: Ke le dayîk bûm ewende biçûk bûm, webîrim nayet.” (Mukriyanî, 1965:79).

Di vê pêkenoka ku hem bi kurmancî hem jî bi kirmanckî tê gotin de, tîp dapîr û neviyê xwe ne.

“Cêyê ki di yewa dapîr û tornê yê pîya yew keye di ciwîyenî. Dapîr û tornî zî cixarakêş î û tornê yê dapîr a nimitikî ge-ge zî vaşê kûngî(esrar) ûnceno. Rojek dapîr û tornî keye di benî. Dapîr mîyûn hîyatî(salonî) di têştê xû ronena, ayna ki mîrî alawena tornê yê vaşê kûngî keno zerey yew pêlî cixara û ayna ki ha xû rî pîşeno.

Dapîr vênena, ya vûna qey ha cixareyê tûtûnî pîşeno. Dapîr tornê xû ra vûna:

-Tornê mi de hey yewa cixara zî dapîrey xû rî bipîşî, destê mi ha mîr d’ ‘ê, ez nêşkîyeno xû rî bipîşîro.

Torn dapîrê xû ra vûno:

- Dapîr, ina cixara nêmûnena ay cixarayûnî bînûn, inay ti nêşkîyeba biûncira.

Dapîrê yî vûna:

-Qey ti şîyenî biûncî, qey ez nîşkîyero biûnco. De lezi mi rî yewa bipîşî!

Torn ewnîyeno çare yî çîno yo, aya cixaraya ki xû rî pîştê gîyeno dûno dapîrê xû, adirî dê rî panûno û xû rî yewna cixara pîşeno. Dapîr cixara kena mîyûn lêwûnî xû. Sênî yew çendî kufû dûna cixara ri, hişê yê sare ra şûno, bena xîntî û mîr zerey têştî ra erzena dûzê hîyatî. Torn ewnîyeno ekse dapîr mîr eşto dûzê hîyatî û ha alawena, vûno:

- Dapîr ti ha dûz warî di mîr alawena, kûmca wo têştê tû?

Dapîrê yî ageyrena tornî ser û vûna:

-Tornê mi, dapîrê tû rî herg’ ca têşt o!” (Mîrvanî, 2012:123-124).

C-2. Tîpên Pîşeyî û Hunerî

Ev tîp, di pêkenokan de digel pîşeya xwe an jî hunera xwe tên binavkirin. Stith Thompson ev cure pêkenok di polînkirina xwe de, bi herfhejmara “X300–X499.” bi navê “Pêkeniya li ser pîşeyan” (vgz Demir, 2016:269) nîşan daye. Ev tîp di pêkenokan de bi navên wekî çerçî, hesinkar, xerat, bijîşk, feqî, mamoste, xwende-

kar, leşker, bazirgan, gundî, cotkar, celeb, şivan û wd. dixuyên û tîpê vê pêkenoka jêrîn jî şivanek e.

“Şivanek ji çiyê diçe aranê, mala merivê xwe. Diçe dikeve nav bostana qewmê xwe, zeveş hildide û diçe bin dareke gûzê da rûdine û dixwe. Şivan li dara gûzê dinhêre, li gûzêd ser wê, li zeveş û divêje:

-Aqilê Xwedê jî tune, aniye ev gûzêd piçûk derxistiye ser vê dara mezin, ev zeveşêd mezin jî ser vê şaxa zirav.

Şivan zeveşê xwe dixwe û bin darê da radize. Wextekê gûzek jor da dikeve ser serê wî, serê wî dêşe û ew radive ser xwe. Wexta têderdixe wekî gûz ketiye ser serê wî, li darê dinhêre û divê:

-Welle, Xwedê aqil e. Wekî dewsa gûza ser vê darê zeveş heşîn buna, niha ez mirî bûm.” (Celîl û Celîl, 2013 b:203).

Tîpê vê pêkenokê şivan e, nezaniya şivanî bûye sebeb ku bibe tîpê vê pêkenokê. Di vê pêkenoka jêr de jî îcar fêkîforoş bi bersiva xwe ya li ser pîrsa kurikê mizûr û şûm, bûye tîpê pêkenokê.

“Dibêjin rojekê yek dihere ber dikana yekî fêkîfiroş. Radihêle cebeşekî wisa di destê xwe de dibe û tîne! Dûre dibêje:

-Ma qey sêvên we yê herî mezin ev in!

Fêkîfiroş dibêje:

-Ji kerema xwe re dest nede tiriye min ew ê di destê te de biecîqe!” (War, 2013 b:79).

C-3. Tîpên Rasterast ên Neyînî

Ev tîp jî li gor nîrxê giştî yên civatê xwedî tevgerên neyînî ne. Diz, ereqvexwar, hîlebaz, çikûs, nezan, keleş, serserî, vîrek, newêrek, dîn hin mînakên vî tîpî ne.

Tîpê vê pêkenokê du zîlamên vîrek in. Ewçend vîrekên mezin in ku yek ji yê din xerabtir e.

“Merdimêk yewna merdimî ra persa, va:

-To ê bîrî de se kerdêne?

Merdimî va:

-Hîris serrî vere cû, saeta babîyê mi kewtbî enê bîrî, mi eyro vete, çîke pê nêbîyo, zey agirî xebetêna!

Merdimê yewinî va:

-Ew çî yo! Ê mi, babîyê mi hîris serrî verê cû kewtbî enê bîrî, ma vet hema zî sax bî!

Merdimê wayîrê saete va:

-Errik, çî zûre!

Merdimê yewinî va:

-Nê, zûre niya! Çimkî babîyê mi binê bîrî de saeta babîyê to qurmîş kerdêne!” (Licokic, 2016:31).

Di vê pêkenoka din de jî tîpê pêkenokê zîlamê dizêk e ku herçend ew li ser kar hatibe girtin jî ewqas hosta ye ku natirse û bi pisporî karê xwe dike.

“Şewêk le nîwe şewa kabrayek be kolanêka erwatewa bo malî xoy, temaşe eka zêlamêk dîwarî malêk ekenêtewe. Kabra epirsê: Kure kabray Kurde! Ewe çî ekey? Ewîş elê: Dehol lê edem!...Elê: Ey bo çî deng naye? Ewîş elê: Beyanî giwêt le dengî ebê!” (Secadî, 2007:12).

BEŞA ÇAREM

MELA WEKÎ TÎPEKÎ DI PÊKENOKÊN KURDÎ DE

Pêkenok, wekî cureyeke edebiyata gelêrî bi rêya devkî belav dibin û pêvajoya belavbûna wan gelek tiştan li wan kêr û zêde dike. Ev kurtevegêranên ku bi rihetî tên jiberkirin perosî, kelecana û meraqê dertînin pêş û di dawiyê de jî ev hest vedigerin bi ser ken ve. Mirov dikare bibêje ku pêkenok û ken du têgeh in ku mirov nikare yekî bêyî ya din pênase bike. Ku di kurdî de, nîşaneya wê jî diyar e ku peyva ‘kenî’ raya peyva ‘pêkenokê’ ye.

Di pêkenokan de tiştê sereke tîp e, pêkenok li ser van tîpan hatine avakirin. Tîpê ku dibe berdevk û bêjerê gel, carna temsîla xwe; carna jî temsîla êl, eşîr, gund, dever, herêm, netewe, ziman, zarava, ol û mezheba xwe dike.

Bere bere, hin tîp diguherin an jî tên guhertin. Du sebebên vê yekê hene; yek jî ji ber ku bi rêya devkî belav dibin ew di wê pêvajoyê de diguherin, ya duyem jî ji ber ku awa û naveroka xewn, xeyal, daxwaz, rexne û pêdiwiyên gel diguherin, tîp jî diguherin; çimkî gel şikl dide tîpan.

Sakaoğlu derbarê terma tîp de dibêje;

“Di her pêkenokê de kes an jî lehengê sereke heye. Ev kes û leheng carna bi navên nenas ên wekî ‘zilamek’, ‘gundiyeke’ in carna jî navên nas ên wekî ‘Mela Nesredîn’ in. Ji van lehengên pêkenokan re, ‘tîpê pêkenokê’ tê gotin.” (2008).

Mela jî yek ji wan tîpan e ku ew bûye temsîlkarê gel. Gel li ser navê wî digel tiştên xweş û baş, tiştên ne xweş û nebaş jî gotine. Di civat, xweşbêj û sohbetên kurdan de, gotin digere û hew tê dîtin ku yekî got: ‘Rojekî melayek...’ û bi vê destpêkirinê berê sohbetê diqelibe ciyekî din û pirqinî bi kesên hazir dikeve. Carna mela, tiştên ku guhdar ne li bendê ne dikin, carna tiştên ku li wan nayên dibêjin; carna jî bi fikr û zanîna xwe guhdaran diheyirînin. Bi xweşî û ne xweşiyên xwe, ew bûne tîpên pêkenokên kurdî. Tarinî, derbarê rola melayan a di perwerdekirina zarokan de dibêje;

“Zarokên Kurdan⁵³, beriya ku biçin feqitiyê, diçin ba seydayê gund û dest bi xwendina ‘Erebî û Quranê dikin. Gava ku tu ji kê bipirsî, wê her kes teqez

⁵³ Herhal mebesta nivîskar Tarinî jê kurdên misilman e.

çûbe ba mela ji bo xwendinê, lê hinekan nîvço hiştine û jê reviyane, hin kes jî ji ber lêxistina seydayan îdare nekirine û terikandine.” (Tarinî, 2011:97).

Wekî ku Tarinî jî dibêje; kurdên misilman di biçûktiya xwe de diçin ber seydayan û bandoreke wan a zêde -erênî, neyînî- li ser zarokan çêdibe.

Peywira melayan a olî ji kesayetiya wan a şexsî bêhtir derketiye pêş; mijar, karakter, cî û dema van pêkenokan bêhtir li dor vê peywirê ye. Bi taybetî perwerdehiya melayan a li medreseyan û gera wan a di dewra feqîtiya wan de, bûye kaniya zanîna wan û teşe daye kesayetiya wan.

Tîpê mela di pêkenokên kurdî de bi sê awayan dixuyê. Geh bûye tîpekî bi-navkirî yê berbelav mîna Mela Nesredîn û Mela Meşhûr, geh bûye tîpekî temsîlkar ê ola xwe ya misilmaniyê geh jî bûye tîpekî rasterast.

Di vê beşe de hûrguliyên van pêkenokên ku mela tê de tîp in, hatine veçîrandin û mînak hatine dayîn. Digel mînakan li ser pêkenokên melayan; ji aliyê ken, zîman, peyam, rist, dem, cî û karakteran ve dê analîzeke binyadî bê kirin.

4.1. KENÊ PÊKENOKÊN MELAYAN

Pêkenokên derbareyê melayan de, xwedî qewareyeke mezin in. Di van pêkenokan de, geh mela dikevin nav bûyereke kenokî, geh mela bi gotineke xwe dibin sedema ken, geh jî ew bixwe karekterekî kenokî ne.

Beriya ku hûrguliyên vê beşê bîr nîşandan divê bi kurtayî qala konteksta pêkenokan bê kirin. Uçar derbarê lêkolîn û lêkolînerên pêkenokan de dibêje ku; “Piraniya lêkolînerên pêkenokan, ji ber hin rihetiyên, deqa pêkenokê kirine navenda xebata xwe. Famkirina karîgeriya deqeke pêkenokan bêhtir hêsan e; lê pêkenokeke ku li civatê û ji aliyê kesên cuda ve bê gotin dibe ku xwedî karîgeriyên cuda be (2011:101).

Pêkenok bi awayekî xwezayî tîpê gotin -ango kes nabêje hela ji me re pêkenokekê bibêje- û guhdar jî li gor rewşa xwe ya ruhî ya wê kêlîkê carna dibişirin, carna dikenin carna jî dikin hîrehîr. Xaleke din jî heye ku, pîvana kenê guhdaran carna hostatiya parav jî diyar dike. Ku parav pêkenoka xwe xweş bibêje hostayê vegotinê be, helbet dê asta ken bêhtir be; lê ku parav ne hosta be dibe ku kes nekene jî. Ev her du xal jî derveyî çarçoveya xebata me ne.

Kenê ku di vê beşê de tê qalkirin avakirina hêmana ken a di nava pêkenokê bixwe de ye. Ango kenê di deqa pêkenokê de bixwe ye, ne kenê peywenda vegêrana pêkenokê ye.

4.1.1. Rewş û Bûyera Kenokî

Di van pêkenokên ku mela tê de tîp in, bûyer û rewşa mela kenokî ye. Mela ne di roleke lebat, berovajiyê wê di roleke tebat de ne. Bûyer û rewşa ku tê serê melayan, yan jî mela bêyî daxwaza xwe dikevinê kenokî ne. Çotuksöken dibêje ku; di van pêkenokan de zîq⁵⁴ li ser xala rewş û bûyerê ye (2003:14).

“Melle Nasirdîn carekê te, divê: "Ezê herim gund, virekê bikim" Kî rast tê, divêje: -Olo Heso, Misto, Beko, Elo, bazirganek hatiye piştta vî çiyayî daniye, pez şerjê kirine, birinc çê kirine, kî diçe tê têr didinê. Dixwe û fereqa wî jî tijî dikinê, didin dive mala xwe. Gundî çev hev ketin, giliyê Melle Nasirdîn kirin. Çûk û mezin hemû fereq hildan, ber bi çiyê revîn. Melle Nasirdîn dîna xwe dayê gundî bi carekê va çûn, hat gote jina xwe, go:

-Jinê, fereqê bide min, ez jî herim tera pelawê bînim, qeliyê bînim.

Jinê go:

-Tuyê ji ku bîni?

Melle got:

-Min gundî xapandin, min virek ji wan ra kirye, gundî ber bi çiyê çûn. Min ew xapandin, lê belkî rast be.” (Cindî, 2009:87).

Di vê pêkenokê de bawerîpêanîna gundiyan a bi vira⁵⁵ Mela Nesredîn; hal û rewşa wan bûye sebaba kenê pêkenokê. Nexwe mela bixwe, di vê pêkenokê de ne gotineke kenokî gotiye ne jî tîpekî kenokî ye. Bi giştî ev bûyera han, mirov dikenîne.

4.1.2. Peyv û Hevoka Kenokî

Di van pêkenokên melayan de, jîrbûn û zanîna melayan berbiçav e. Melayên van pêkenokan herçend di rewşên nexweş û tengazar de bimînin jî, bi peyvekê yan jî gotinekê wekî mûyê ku ji nav mastî tê kişandin, xwe derdixin pakîyê. Ev peyv û

⁵⁴ Zîq: Zûrbûna tişteki. Focus.

⁵⁵ Vir: Derew, gotina nerast.

hevoka bi bandor a melayan hemû caran li dawîya pêkenokê ye û bi wê gotin û hevokê pêkenok bi dawî dibe.

“Rojek melleyek li camiyê weza dide û dibêje; haya we ji qîzê we hebe, bira devê xwe boyax nekin. Cilê/kincê milqol û şelê qot li xwe nekin gune ye. Yek ji nav cemaetê dibêje;

- Seyda qîza te jî li xwe dike.

Melle ji dibêje:

- Ê heyra anha xwedê heye bi bêbavê dikeve.” (<http://tirsik.net/index.php?mijarid=1404&rpl=3&rpl=2&rpl=2>. 07.12.2016).

Ev pêkenoka han di nav kurdan de pêkenokeke berbelav e û ev hevoka mela wekî biwêjekê jî tê bikaranîn. Mela bi jîrî û zanîna xwe, xwe ji rewşa dijwar xilas kiriye. Bi qewlê Bayrak, “xelkê bi afirandina vê pêkenokê mela dane ber tîrên rexneyan û peyam daye wan.” (2001:29).

4.1.3. Tîpê Kenokî

Di van pêkenokan de ji karakterên pêkenokên yek dertê pêş û bi taybetiyên xwe dibe tîpekî kenokî. Di pêkenokên melayan de jî mela dibe tîpekî kenokî. Wekî ku Çotuksöken jî dibêje, “di hin pêkenokên tîpên kenokî de, ji carekê zêdetir hêmanê kenî hene.” (2004:31). Di vê pêknokê de ji ber ku mela tîpekî kenokî ye, ji serê pêkenokê heta bi dawîya wê ne carekê tenê, du sê caran mirovan dikenîne.

“Rojekê Xocê Menşûr diçe bajêr û li çarşiyê digere. Li bazarê şalwarek diecibîne. Dest avêtiye ku wî şalwarî bigire dîsa biryara xwe guhertiye. Ji firoşkar re gotiye;

“De ka tu di dewsa şalwar de cibekî bide min, ez şalwar nastînim.”

Froşkar tîne cibeyekî dide Xoce. Xoce cibe hildide û diçe. Froşkar bi dû wî dikeve û jê re dibêje;

“Xoce de ka te heqê wî neda!”

Xoce lê vedigere û dibêje;

“Min şalwar danî di dewsa wî de cibe girt!”

Froşkar dibêje;

“Te perê şalwar jî nedabû!”

Dema ku froşkar wisa dibêje Xoce xwe aciz dike û dibêje;

“Tu çi qas firoşkarekî ecêb î! Ma ez ê çawa perê şalwarê ku nestandibe bidim! Tu dîn î çi yî!” (Diyadînî, 2011:15).

Mela Meşhûr, di vê pêkenokê de tîpekî kenokî ye. Dan û standina wî ya bi firoşkar re, jixwe bi awayekî ecêb e; ev ecêbî jî ji kesayetiya Mela Meşhûr pêk tê.

4.2. ZIMANÊ PÊKENOKÊN MELAYAN

Pêkenok herçend di van sedsalên dawîn de derbasî nivîsê bibin jî, rêya wan a sereke ya belavbûnê devkî ye. Ji ber ku di civatên curbicur û ji aliyê kesên curbicur ve tîn veguhastin, di zimanê pêkenokan de jî em nîşaneyên van taybetiyan dibînin. Hizra Özcan a di derbarê zimanê pêkenokan de wisa ye;

“Zimanê pêkenokan zimanekî xwerû û fesîh e. Bûyerên di nav jiyana rojane de tîn serê xelkê, bi awayekî qerfî û espriyan dibin pêkenok. Ji ber vê xwerûbûna wan; di pêkenokan de, gelek caran biwêj, gotinên pêşiyên û gotinên qetanî tîn bikaranîn.” (Özcan, 1999).

Ji dijûn û gotinên qetanî heta bi gotinên helbestî di pêkenokan de tîn dîtin. Ev yek ne tenê di pêkenokan de herweha di hemû cureyên edebiyata gelêrî de jî wisa ye.

Di pêkenokên melayan de, digel vegêraneke rasterast diyalog jî hene. Hetta hin pêkenok bes li ser diyalogan ava bûne. Wekî ku di vê pêkenokê de jî tîn dîtin piraniya diyalogan jî pirs û ferman in.

“Cînarê Melle Nasirdîn diçe mala wî, divê⁵⁶:

-Kerê bide me, em herine aş.

Melle Nasirdîn divêje:

-Kerê hêja cînara bir.

Xeberê devê Melle da kerê tewlê da dike zîqe-zîq.

Cînarê divê:

-Melle, ne kerê tewlê da ne?

Divê:

-Heyran, hun min bawar nakin, zîqînya kerê bawerê dîkin?” (Cindî, 2009:96).

Ji ber ku mela tîpekî nav xelkê ne, zimanê pêkenokan jî zimanê nava xelkê ye. Piraniya hevokan, hevokên lêkerî ne. Emedov alîgirê wê fikrê ye ku, “piraniya

⁵⁶ Divê: Dibêje.

lêkerên pêkenokan li gor dema boriya dûdar tên kişandin.” (2004:116). Ji aliyê saz-bûna xwe ve jî bêhtir bikaranîna hevokên xwerû li pêş e. Digel hevokên xwerû, hevokên têkel jî hene.

Yıldırım jî derbarê zimanê pêkenokan de weha dibêje: “Karakter û tîpên pêkenokan li gor karakterên xwe diaxivin; xebardana wan jî li gor aqil e, ne deraqil e.” (1976:52-53).

4.2.1. Gotinên Pêşyan û Biwêj

Gotinên pêşyan yan jî gotinên mezinan ew awa gotin in ku ji nav ruhê gel derketine bûne qalib û heta îro wekî xwe mane. Öztürk di gotara xwe ya derbarê mijarê de dibêje ku;

“Gotinên pêşyan, texlîdeke ji wêjeya gelêrî ye ku, serborî, tecrîbe û rabirdûya civakan bi awayekî edebiyata gelêrî û bi bandor rave dike. Gotinên pêşyan; raman û hestên raya giştî, nexşerêya helwesta jiyana neteweyî, rengvedana zanîst û çanda gel, paşxaneyê daneheva civakî û hilberînên binehişê kolektîfî ye. Gotinên pêşyan, bi kurtî û bi puxtedarî tên avakirin. Herçend awarteyên wê hebin jî, bi piranî ji hevokekê yan jî du hevokan pêk tên. Ji bilî van gelek taybetmendiyên wan ên din jî hene. Ravekirina ramanên gel ên hevpar, xwedîbûna nirxdarazên neteweyî, helwestên misoger, vegotinên xwerû, dîdaktîkbûn û wd. hin taybetmendiyên din ên gotinên pêşyan in.” (Öztürk, 2015:321-322).

Biwêj û gotinên pêşyan pirî caran navê wan bi hev re tê hildan. Biwêj jî wekî gotinên pêşyan, gotinên qalibî ne û di jiyana rojane de gelek caran wekî wan tên bikaranîn. Zeraq di pêşeka xebata xwe ya di derbarê biwêjan de weha qala girîngî û taybetiyên biwêjan dike;

“Biwêj hêman û dînamîkên herî girîng û bibandor ên zimanekî ne. Ji bo diyarkirin û têgihîştina têgihan, bi mantiq û qalibên arizî yên wî zimanî hatine dîtîn û afirandin. Ji aliyê wate, wesf û çawaniyê ve xweserî xwe ne; zêdetir ne di wateya ku pêşî tê fêmkirin, di wateyeke din de tên bikaranîn. Derfetên vegotinê yên cur bi cur ên zimanekî di nav biwêjan de bi hostetî hatine bicîkirin. Wateyên kûr û fireh, bi riya biwêjan di nav hevok û komên peyvên de hatine derbirîn. Mantiq û qalibên zimanekî, di biwêjên wî de xweştir tên xuyakirin û fêmkirin.” (2005:5).

Di pêkenokan de herçend ken û qerf li pêş be jî şîret û rexne jî wekî peyameke veşartî xuya dikin. Ev peyamên di van pêkenokan de, ji ber ku bi awayekî herî kurt hatine ristîn, bûne biwêj, bûne gotinên pêşyan û ketine devê xelkê.

Emeksiz, di gotara xwe ya derbarê Mela Nesredîn de, balê dikişîne ser xaleke girîng û dibêje; “herçend bingeha hin biwêjan pêkenok bin jî, îhtimal e ku hin biwêj jî bi demê re bûne pêkenok.” (2013:326).

Derbarê heman mijarê de, Türkmen jî dibeje ku, “gelek pêkenok kurt bûne, bûne biwêj. Gelek pêkenokên Mela Nesredîn ji ber ku ji aliyê pîrî kesan ve tên zanîn, êdî hewceyî bi vegêrana pêkenokê nemaye; tenê bikaranîna wê biwêjê jî mirovan dikenîne.” (2008:154).

Çaçan jî bi taybetî qala alegorîkbûna gotinên pêşyan dike û dibêje ku ew kêrdar û kêrhatî ne ji bo dîtina kêmasiyan û perwerdekirinê (2015:10). Jixwe bi hûrgilî li pêkenokan bê nêrîn, tê dîtîn ku şîret û rexne ketine şiklê pêkenokan. Wekî ku di vê pêkenokê de jî dixuyê gotina **‘devê xelkê ne doxîna te ye’** bûye biwêjek.

“Dibêjin rojekê Mele Nisredîn û lawikê xwe li kerê xwe siwar bûne û vedigerin tên malê. Bi rê de yek li wan rast tê û dibêje:

-Mele Nisredîn hûn ji Xwedê natirsin tevî vî barî hûn her du jî li kerê siwar bûne! Li ser vê gotinê Mele Nisredîn ji kerê dadikeve û dimeşe. Li yekî din rast tên ew jî dibêje:

-Hela ji xwe re li vana binere, Mele bi vî emrê xwe dimeşe lawê wî jî li kerê siwar bûye!

Mele îcar jî radibe lawê xwe ji kerê dadixe û ew siwar dibe! Îcar yekî din li wan rast tê, ew jî dibêje:

-Tu ji xwe re lê binere fedî nake ew siwar bûye û zarok dimeşîne!

Mele li ser vê gotinê îcar dadikeve bi rişma kerê digre û bi lawê xwe re dimeşe. Yekî din li wan rast tê ew jî bi wan dikene û dibêje:

-Hela ji xwe re li wan binerin çi ehmeq in! Ker bi wan re ye lê siwar nabin û dimeşin!

Mele Nisredîn li ser vê dikene û dibêje:

-Devê xelkê ne doxîna te ye!^{57 58} (War, 2013 a:16).

⁵⁷Li hin herêman domahîka vê gotinê heye. Biwêj bi vî awayî ye: “Devê xelkê ne doxîna te ye ku tu bigirî.”

⁵⁸Ev biwêj di zimanê tirkî de jî heye û bi awayî tê bikaranîn: “Milletin ağzı torba değil ki büzesin (veya dikesin). [http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com_gts&arama=gts&kelime=milletin %20a%C4%9Fz%C4%B1%20torba%20de%C4%9Fil%20ki%20b%C3%BCzesin%20\(veya%20dikesin\)&cesit=1&guid=TDK.GTS.5296154a69e930.27754620](http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com_gts&arama=gts&kelime=milletin%20a%C4%9Fz%C4%B1%20torba%20de%C4%9Fil%20ki%20b%C3%BCzesin%20(veya%20dikesin)&cesit=1&guid=TDK.GTS.5296154a69e930.27754620). 20.12.2017. Derbarê wekhevîyê an jî nêzbûna biwêj û gotinên pêşyan de lê binerin: Chyet, M. (2015). Xwedîtiya Hevbeş û Zargotina Kurdî. R. Pertev (Ed.). *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*. 315-328. Stembol: Avesta.

Biwêj û gotinên pêşyan ên ku di materyalên berdestî de, ji pêkenokên mela-
yan hatin tespîtîkirin ev in:⁵⁹

1. Garis û weris (Bozarslan, 2004:14).
2. Ku ew bifilite, xirabtir e (Bozarslan, 2004:61; Cindî, 2009:94).
3. Rastê mirina mela hatine (Bozarslan, 2004:77).
4. Mereqa qiloçên gamêşê ye (Bozarslan, 2004:110).
5. Ma qiyamet li serê berxa min tenê radibe (Bozarslan, 2004:157).
6. Devê xelkê ne doxîna te ye (War, 2013 a:16).
7. Qey sûcê diz tune ye (War, 2013 a:31).
8. Li bêbavê tê/dikeve (<http://tirsik.net/index.php?mijarid=1404&rpl=2>. 8.12.2016).
9. Karê xorta dikim (<http://tirsik.net/index.php?mijarid=1404&rpl=2&rpl=3&rpl=4>. 12.02.2017).
10. Dibî dibî/dibe dibe (<http://tirsik.net/index.php?mijarid=1404>. 8.12.2016).
11. Ev lo-lo ye, lê-lê hêj maye (Bozarslan, 2004:18).
12. Li kerê siwar e, li kerê digere (Bozarslan, 2004:125).
13. Ji rûyê min ê spî bawer nakî, bi zirîna kerê bawer dikî⁶⁰ (Cindî, 2009:96).
14. Navê me jî nav xelkê de hebe (Cindî, 2009:107).

4.2.2. Gotinên Qetanî û Dijûn

Gotinên qetanî, argo an jî zimanê girdegewran di jiyana rojane de ji aliyê ge-
lek kesan ve tên bikaranîn û xwedî wateyên taybet in. Herweha ev gotinên bi vî
awayî, ji ber ku afirîner gel bixwe ye, derbasî nava edebiyata gelêrî û pêkenokan jî
bûne. Bozarslan ku navê ‘gotinên qebe’ li van gotinan dike û dibêje;

“Ji aliyekî dî ve, mirov dibîne ku di hin pêkenokan da hin peyvîkên wisa qebe
hene ku, li derê sînore edebî û nezaketê ne. Di peyvîkên cidî da peyvîkên wisa
qebe nayên gotin. Lê gelê Kurd ew pêkenokên bi wan peyvîkan jî afirandine û
belav kirine. Bi wî awayî ew jî bûne beşek ji folklorê kurdî, beşek ji edebiyata
kurdî ya devkî. Mesela, pêkenoka “Gû şêx nas nake” yek ji wan e. Di wê
pêkenokê da tê gotin ku li gundekî Xerzan, şêxek li ber derê avrêja mizgeftê
paye. Mazûvanê wî li derê avrêjê xistiye û deng li kesê hundir kirîye, gotîye
“Bileze, şêx li ber derê dipê.” Hingê zilamê di avrêjê da jî wir bersiv daye û
gotîye “ev gû ye gû, ma gû şêx nas dike!” (Bozarslan 2007:12-13).

⁵⁹Yek bi yek wate û pêkenokên ku ev biwêj tê de derbas dibin nehatin dayîn, ji bo agahiyên berfireh li
çavkaniyan binêrin. Wekî mînak tenê pêkenokek ku tê de biwêj heye hat dayîn.

⁶⁰ Ev gotin bi vî awayî jî tê zanîn; ji melê bawer nake, ji kerê bawer dike (Bozarslan, 2004:48).

Di vê pêkenokê de peyva ‘gû’ gotineke qetanî ye. Ev peyv gotineke qetanî ye û nabe ku li her ciyê bê gotin, lê di pêkenokan de gel ji van gotinan aciz nebûye û gotinên qetanî, dijûn û gelek peyvên derbarê zayendiyê de hatine bikaranîn. Helbet ev taybetî, ne tenê di pêkenokan de, di hin cureyên din ên edebiyata gelêrî de jî he-man tişt e.⁶¹

Hin pêkenok dibe ku qebe û ji navtengê xwartir bin. Ev taybetiyên wan pêkenokan, derbarê zimanê wê serdemê de agahiyan dide me. Derbarê jiyana taybet a karakterê û tîpên pêkenokê de agahiyên girîng didin me (Karakaya, 2007:201).

Di vê pêkenokê de şêx û mela, bi awayekî hostane hevdu dihetikînin û ev hevokên wan mînakên gotinên qetanî ne.

“Şêx û mele li eywana şêx rûniştine. Şêx fetbaz e. Lê mele ji şêx fetbartzir e. Di binê mala şêx re kerekî derbas dibe. Şêx li kerê meze dike. Ji mele dipirse dibêje:

-Mele kerê kê ye?

Mela bala xwe dide ku şêx lewitand. Hinek dirame û ew jî bersîvê dide şêx dibêje:

-Şêx kerê mele ye.” (Akyol, 2006 b:41).

Di derbarê bikaranîna gotinên qetanî û dijûnan a li nav xelkê Anatoliya⁶² ye de Şahhüseyinoğlu weha dibêje:

“Di jîyan û çanda însanên Anatoliyayê de tiştekî veşarî û xef tune ye; berovajiyê wê vekirîbûn û navnetewîbûn heye. Li civatên odeyan, di dawet û sohbetên gundan de jin û mêr digel hev in. Di van şevbihêrkan de henekên wisa tên kirin û pêkenok wisa tên gotin ku jin û keç jî jê kêfê digirin û pê dikenin.” (2011:9).

Hinek lêkolîner hebûna gotinên qetanî û dijûnan di pêkenokan de wekî tiştekî asayî dibînin hin lêkolîner jî berovajiyê wê dibêjin. Ji wan yek jî Türker Eroğlu ye. Eroğlu di wê baweriyê de ku, “bikaranîna gotinên qetanî û dijûnan pêkenokan de jenerere dike û wan jî qedr dixê.” (2001). Helbet ciyê nîqaşê ye ev yek, lê di rastiya wê cureyê de dixuyê ku qewareyeke zêde ya pêkenokan an argo an jî cinsî ne. Hetta Uçar di wê baweriyê de ye ku peyva pêkenokê bixwe tiştên cinsî tîne bîra mirovan (Uçar, 2011). Di vê pêkenokê de jî peyva ‘qûn’ê gotineke qetanî ye.

⁶¹ Ji bo agahdariyê li van her du çavkaniyan binêrin: Alakom, (2013). *Di Folklorê Kurdî De Serdestiyeke Jinan.*; Çifçi, (2014). *Di Kilamên Evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê (Kilam û Jin).*

⁶² Anatoliya: Navekî coğrafîk e li Tirkiyeyê ku jê re bi tirkî ‘Anadolu’ tê gotin.

"Melle Nasredîn carekê diçe cîkî û xwe mirîti davêje- "çika cimeta min kî ber min dikeve?" Xortek rast tê, vî alî, wî alî diqulibîne, dinhêre Melle Nasredîn miriye. Tê he-warê li cimeta gund dadixe, divê:

-Welle, Melle Nasredîn filan derê miriye.

Cimeta gund radive, dicive, dike herine ser. Diçine ser.

-Erê, miriye.

Radivin çardara wî girê didin, Melle Nasredîn datînin ser. Şeş hevt merî dikevin bin çardara wî, hiltînin. Tê cîkî herrî bûye, de îja riya yek meriyê bûye.

Zef li hevdu diçin, têt, serê hevdu gêj dikan.

Wî çaxî Melle Nasredîn radive ser çardarê, qûn rûdinî, pêçiya xwe dirêj dike, divê:

-Saxya xwe da ha, ez dera han ra diçûm, dihatim." (Cindî, 2009:108).

Helbet gotinên qetanî hinekî deredetî bin jî, dîsa siviktir in ji pêkenokên cinsî û dijûnan. Di kurdî de, gelek pêkenokên melayan hene ku rasterast li ser mijarên cinsî ne û mela yan bi dijûnekê yan jî bi awayekî çalak di nav karen cinsî de ye. Di vê pêkenokê de jî tê ditin ku mela çawa dijûnan dikan.

"Melê gund dereng diçe mizgeftê. Çi qas diçe dimêzîne gundiyek li mizgeftê ye. Mele jê dipirse, dibêje:

-Gelo tu çawa zû radibî û têtî mizgeftê. Heya jina min şorbê dide min, heya ez dixwim, ez dereng dimînim. Mêrik dibêje:

-Seyda ez destê te ramîsim. Yên min du jin in. yek şorbê dide ser. Yek cilên min amade dike. Yek sola min rast dike. Yek mesîne min tije dike. Loma ez zû têt mizgeftê.

Mele dibêje:

-Tu bawer bikî, ez ê jî bikim du jin. Mele digere ji xwe re jinek jî dixwaze. Heyva mele naqede, mele ji ber xir û cira wan xwirîniya xwe jî nake ji mal derdikeve. Rast diçe mizgeftê. Dimêzîne mêrikê her gav nehatiye. Hinek dimîne mêrik jî diçe mizgeftê. Mêrik çav bi mele dixê. Jê re dibêje:

-Seyda te xêr e? Tu zû hatî mizgeftê.

Mele dibêje:

-Ez di wî nim ku bike du jin." (Akyol, 2005:8).

“Qewareya pêkenokên cinsî di nav pêkenokan de qewareyeke fireh e. Hetta navê pêkenokê bixwe, rasterast pêkenokên cinsî tîne bîra hin kesan. Pêkenokên cinsî, li her derê dinyayê û di nav her civatê de hene.” (Uçar, 2011:161). Divê ev jî li vir bê gotin ku, bi qasî hatiye tespîtkirin kevintirîn pêkenoka dinyayê a nivîskî **‘pêkenoke-ke cinsî’** ye û beriya mîladê di salên 1900î de derbasî nivîsê bûye ji alî Simeran ve (Bayatlı 2013:33).

Wekî ku di vê mînaka jêrîn de jî dixuyê, ev pêkenok bi tevayî pêkenokeke cinsî ye û zimanê pêkenokê jî bi tevayî argo ye.

“Dilê mele di jinikê de ye. Li dora jinikê diçe û tê. Jinik jê re dibêje:

-Seyda eger tu di mizgeftê de cixare bikişînî û kîrê xwe derxî derve, bi soz û peyman ez ê te bikim mêvanê xwe. Heyva rojiyê ye. Mele banga limêjê dide. Diçe hundirê mizgeftê. Şîretan li gundiyan dike. Qutiya xwe derdixe û cixara xwe dipêçe. Cixara xwe vêdixe. Dike devê xwe, helmê li cixarê dixê. Ji gundiyan re dibêje:

- Gelê gundiyan delal û hêja. Dema mirov dîyê cixarê nekişîne nava xwe, bike devê xwe û berde rojiya mirov pê naşikê. Hinek şîretan jî dike. Paşê dibêje:

- Ez pê hesiyam ku hinekan gotiye, “Mele bêsînet e” destê xwe diavêje doxîna xwe vedike. Strê⁶³ xwe derdixe. Ji gundiyan re dibêje:

- A hûn jî mêze kin ez sinetkirî me. Ê şalê xwe dikişîne xwe. Li mizgeftê hem cixarê dikişîne, hem jî strê xwe nîşanê gundiyan dide.” (Akyol, bd.:58).

Lokman Polat derbarê vê mijarê de, di wê fikrê de ye ku, “Di şevbirikên gundiyan de wexta ku çîrokên gelêrî tê qalkirin, di wan çîrokan de seks û erotizm heye.” (2009). Alakom jî destnîşan dike ku, “erotizm bi taybetî di stranên kurdî yên evînê de gelek xurt e.” (2013:99). Bi ya me, mirov dikare heman tiştê jî bo pêkenokan jî bibêje.

4.2.3. Gotinên Birîtm

Gotoxên keresteyên edebiyata gelêrî, di vegêrana keresteyên xwe de gelek caran zimên bi hosteyî bi kar tînin û gotinan li hev tînin. Di vê lihevanîna zimên de rîtm an jî newayê didin gotinê. Bozarslan di derbarê van gotinên birîtm de dibêje ku;

⁶³ Tê dîtin ku di vê pêkenokê de sansur tune ye, sansurkirina peyvan piranî girêdayî fikr, bawerî û zanîna gotox, berhevkar û weşangeran e. Carna gotox sansur dike deqa xwe, carna berhevkar bixwe sansur dike û carna jî di pêvajoya çapkirina berhemê de weşanger vê yekê dixwazin ji berhevkar.

“Celebek pêkenokên gelî jî hene ku, beşek ji peyvên wan helbestkî û strankî ne; yanî wek helbest û stranan bi qafiye hatine gotin. Dema mirov li wan peyvên helbestkî û strankî yên wan pêkenokan dinêre, mirov dibêje qey hozanekî jêhatî rûniştîye û helbestek nivîsîye yan stranbêjekî jêhatî rûniştîye stranek gotîye. Rûmeta folklorî û hunerî û edebî ya wan pêkenokan, bêguman ji rûmeta pêkenokên dî zêdetir e.” (Bozarslan, 2007:16).

Wekî pêkenokên din ên kurdî di pêkenokên melayan de jî gotin an jî beşên birîtm hatine gotin hene. Ev beş piranî li dawiya pêkenokê ne. Sedema vê ristînê jî ew e; ku bila di bîra parav de bimîne. Di van beşên rîtmîk de tê dîtîn ku carna herfek tê dirêjkirin carna jî hin herf dikevin. Ev ji bo pêkanîna serwa û bermaya helbestê ye.⁶⁴ Di vê pêkenokê de tê dîtîn ku sê rist bi rîtm in.

“Rojek Melê dîsa li kerê xwe siwar bûye û li rîyek çûye. Rîya wî gelek dûr bûye. Demek çûye, kerê wî di rê da birçî bûye û maye, êdî nekarîye here. Melê kirîye-nekirîye kerê lingekî xwe jî ber bi pêş navêtiye. Paşê jî ji birçîtîyê ketîye û li erdê dirêj bûye. Melê li dora xwe nihêrtîye, da ku tiştek peyda ke û bide kerê xwe. Lê belê ji bil erda hişk û biring⁶⁵ çû tiştek nedîtîye. Li qeraxê rê jî girekî bilind hebûye. Melê ji xwe ra xiyal çêkirîye û di dile xwe da gotîye “Eger Xwedê ev girê ha bikira ka, min’ê kerê xwe bera nava’y bida, kerê min dê tê da kêf bikira.” Paşê fikirîye ku xiyal û rastî ji hev dûr in. Vêca, wek ku deng li kesekî dî bike, weha gotîye:

*Xwedê dikare vî girî bi **ka ke***

*Û devê kerê Melê di **nav ke***

*Lê karê ku nekirîye, **nake**.”* (Bozarslan, 2004:53).

Di dawiya vê pêkenoka Mela Nesredîn de jî beşeke rîtmîk heye. Di vê beşa rîtmîk de peyama pêkenokê, digel rîtmê bandoreke zêdetir çêdike.

“Dibêjin piştî ku jina Mele Nesredîn mir ji xwe re jinek bî anî. Her gava ku dikira raketana, jinikê di nav nivînan de qala mêrê xwe yê berê dikir. Rojekê nema di Mele

⁶⁴Yek ji wan teoriyên forklorê ku jê re ‘teoriya devkî-formulayî’ tê gotin, dikare bibe bingeş ji van cure pêkenokan re. Bi kurtî ev teorî wê diparêze ku, dubare û qalibên di vegêranê de dibin alîkar ji gotoxê vegêranê re. Herçend ev teorî, bi piranî li ser destanan hatibe sepandin jî, hin kesan ev teorî li ser vegêranên pexşankî jî sepandine. Ji bo agahiyeke berfireh li van çavkaniyan binêrin: Dorson, (2017). *Folklor û Teoriyên Folklorê Yên Îroyîn*. N. Keskin (wer). 89-92.; Çobanoğlu, (2012). *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*. (6. Baskı). 259-286.; Eren, (2016). Masal Motifleri, Tekrar Ve Sözlü Kompozisyon Teori. *Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi*. 30. 290-308.; Hikmet, (2016). *Teoriyên Folklorê*. 87-97.

⁶⁵ Biring: Asteke hişkiyê. Ev peyv digel hişkê cotepeyv e û wekî ‘hişk û biring’ tê bikaranîn.

Nesredîn de hiltê û pihînekê di jinikê de lêdixê û wê ji ser doşekê diavêje erdê. Jinik dibêje:

-Mele çima te ez ji ser doşekê avêtim erdê?

-Sê kes di nav nivînên du kesan de hilnayên, ji ber ku ewê cih teng bibe miheqeq ew ê yek bişemite erdê!

-Sê kesê çi Mele ma em ne dudo ne?

- Na, ma em dudoyên çi ne?

*Ez, tu û mêrê te yê **berê**, vaye em bûne **sisê**!*

*Em hersê tê de hilnehatin, loma tu jî ji ser doşekê ketî **erdê**!” (War, 2013 a:27).*

Wekî ku tê dîtin di nav van her sê peyvên diyarkirî de, ji aliyê dengî ve nêzîkiyek heye. Vê nêzîkiya denga jî rîtmek ava kiriye.

4.3. PEYAMÊN PÊKENOKÊN MELAYAN

Pêkenok, herçend wekî amrazê ken, bextewarî, kêfxweşî, kenîn û dembo-randinê bên dîtin jî di paşil û hûrguliyên pêkenokan de tê dîtin ku pêkenok xwedî roleke karîger in; “Ew pîrsgirêkên civakê çareser dikin, hişekî hevpar ava dikin, ji bo karûbarên rojanê rêyên nû li ber kesan vedikin, deriyên nû yên hizirînê didinê ber mirovî. Di binkeya hêza karîger a pêkenokan de, zanîn û kûrbûniyeke hizirî heye.” (Batur, Sîr û Bek, 2012).

“Digel kenandin û kêfxweşiyê roleke din a pêkenokan perwerdekirina mirovan e. Pêkenok ji ber ku vegêranên kurt û xwerû ne; ji bo balkişandinê, ji bo xweşbêjiyê gelek caran tên bikaranîn.” (Kara, 2002). Bozarslan jî di wê hizirê de ye ku armanca vegêrana hin pêkenokan bes şîret ango peyam e. Bozarslan, ev xal weha şîrove kiriye;

“Di pêkenokên gelî yên kurdî da yek ji nuqteyên pîr balkêş ev e ku hin ji wan, ne tenê pêkenok in, lê di eynî demê da hin fikrên hûr û zirav, hin dîtinên di navbera rêzan da veşartî, hin şîretên giranbûna jî digel xwe tînin. Pêkenokên weha, di nava hewayê ken û kêfxweşiyê da, di nava hewayê hengê da, adeta çavê xwe li mirov dişikînin û wê fikrê, wê dîtinê, wê şîretê wek di-yariyeka birûmet hêdika dikin mista mirov.” (Bozarslan, 2007:7).

Şahhüseyinoğlu jî derbarê mijarê de dibêje ku, “Di pêkenok û qerfê de; ken, rexne, hizirîn, huner, vac û xweşbînî digel hev in. Pêkenok, hêza civakê ya afirîner, rexnegir û hizirdariyê derdixin holê.” (2011:9).

Bi giştî mirov digihê wê qinyatê ku di piraniya pêkenokan de peyamek heye, lê di hin pêkenokan de jî ti peyamek tune ye; (Bozarslan, 2007:7-11) ji ber vê çendê mirov dikare wan bike du beş: pêkenokên bêpeyam û pêkenokên bipeyam.

4.3.1. Pêkenokên Bêpeyam

Di van pêkenokan de, bes roleke pêkenokê heye; ew jî kenandin û kêfxweşiya mirovan e. Piraniya van pêkenokan li ser rista peyv û hevokan hatine saz kirin. Bozarslan derbarê vê mijarê de, weha dibêje;

“Celebek pêkenok jî hene ku çu naverokên wan ên civatî tunin. (...) Pêkenokên weha bînaverok jî gelek in. Mirov dikare bêje ku pêkenokên weha tenê pêkenok in û tenê ji bo ku mirov bikenînin, dilgeş û kêfxweş bikin hatine afirandin. Pêkenokên weha gerçî naverokên wan ên civatî tunin, lê karekî wan ê civatî heye: Ew karê wan, kêfxweşkirin û dilşakirina mirovan e.” (Bozarslan, 2007:11-12).

Di vê pêkenokê de, aciziya meleyan a ji ehmeqiya şivanî dibe sedema kenî. Mela, ne wekî tîpekî erênî ne jî wekî tîpekî neyînî nebûne veguhezêrên peyamekê. Ji bo sebebên ken a di van pêkenokan de pêdivî pê heye ku mirov hinekî hay ji ‘toeriyên ken û qerfê’ hebe.

“Rojek sê mele bi hev re diçin gundekî. Bi rê de rastê şivan û pez tîn. Diçin nêzî şivan. Dimêzînin. Şivan keşçiya xwe li tasê dixê dike devê xwe û dibêje:

-Ya Yezdan şukur ji te re. Mele ber pê diçin. Dimêzînin ku nan hûr kiriye dew. Û dibêje, şukur.

Melayek gampolê xwe bilind dike li paşika stûyê şivan dixê û jê re dibêje:

-Yezdan gan⁶⁶ê te bistîne. Tu çawa ji nan û dew re şukur dikî? Ew qas xizîna Yezdan heye. Tu tiştêkî din naxwazî, ji dew re şukur dikî.” (Akyol, 2005:15).

4.3.2. Pêkenokên Bipeyam

Pêkenok, tenê ji bo kenandina mirovan nayêne gotin, tê de hin armanc hene. Ev armanc carna şîret û pêşniyar carna rexne carna jî biçûkxistin û reşkirin e. Uçar derbarê mijarê de amaje pê dike ku “di pêkenokan de karîgeriyeke eşkera û girtî heye” (2011:102) û dibêje;

“Di karîgeriya eşkera ya bingehîn de kenandin, kêfkirin û di binê vê eşkerebûnê de jî karîgeriyên mîna rexne, êrîşê hene; di karîgeriya girtî ya bingehîn de jî têkilîdanîn, veguhastina çand û edetan; û perwerdeyê hene û di binê van

⁶⁶ Gan: Can, ruh. Ev peyv, peyveke zaravê kirmanckî ye.

de jî hin karîgeriyên mîna hevsengkirinê, cezadan, gazinc û lomeyan dixuyên.” (Uçar, 2011:102).

Di pêkenokên ku peyamek tê de hene de, tîpê pêkenokê veguhezêr an jî am-razê vê peyamê ye. Herwekî ku berê jî hatibû gotin, karîgeriya pêkenokan di çêkirina pergala jiyanê de xaleke berçav e. Ev pergal jî bi du awayan saz dibe; rexneya tiştên nebaş û pesindana tiştên baş.

4.3.2.1. Rexnekirina Tiştên Nebaş

Di van pêkenokan de, rexne bêhtir li ser bûyer û rewşên ku ji hêla civaka heyî de nebaş û derehleqî tînin, e. Tîpên van pêkenokan jî ‘tîpên neyînî’ (Çotuksöken, 2003:17) ne. Melayên van pêkenokan xwedî van taybetiyan in: Nezan, derewkar, durû, çavbirçî, bênamûs, zînakar, fêsad, hîlebaz, berjewendperest û ezezok in. Di vê mînaka jêrîn de jî ev yek tê xuyakirin ku mela çawa bûye yekî xwehez û hilebaz.

“Rojek, mitribekî nesax (nexweş), di xwe de diçe. Mirovên wî dilezînin, gazî mele di kin. Mele, li pêş mitrib disekine. Yasînê vedike û bi dengê bilind dixwîne. Bistekî paşê hişê mitrib tê serê wî û çavê xwe vedike. Çi bibîne baş e? Ku mele kurana xwe vekirîye û li ba serê wî yasînê dixwîne. Mitrib, ji tîrsa mirinê, mîz bi xwe de dike. Ew hewar dike û ji mirovê xwe re dibêje:

-Zû zû çend qurîşan bidin vî rezîlê han, bila zû here; an dê rihê min bi zorê ji min bi stîne.

Mele dengê xwe hin jî bilind dike:

-Yasîn, Kuranel hekîm ...Murselîm ...

Mitrib, li jina xwe hêrs dibe;

-Ma ker bavê, tu jî mirina min dixwazî. Welle, ew bi zorê rihê min, ji min digire. Ha heta çokê jî hat. Bilezîne zirna min bîne. Jinik zirnê tîne. Mitrib dest bi pîfkirina zirnê dike. Mele riya derî digire û direve. Pê re diqîre:

-Yasoyê mitrib qûnmilun buye! ... Milun buye...Birevin!” (Tîgrîs û Motkî, 1989:69-70).

Peyamê vê pêkenokê ew e ku, gelek meleyên çavbirçî û perehez dikarin ji bo standina pereyan -îsqata miriyan, heqê şûştin û veşartinê wd.- kesên sax jî bikujin. Bi veçirandina vê taybetiya melayan, afirandoxê/a vê pêkenokê xelkê hişyar dike li hember van melayan bi vî awayî û kesên din ên çavbirçî.

Di vê pêkenokê de jî tê xuyan ku mele bîbûna jinikê ji xwe re wekî delîveyekê dibîne û dibe melayekî berjewendparêz û hilebaz. Hewceyiya jinikê bi nêteke nebaş dibîne, divê sûdeke bi dest bixe. Xelkê bi afirandina pêkenokên wisa rexne li van melayan kiriye.

“Mêrê jinikê dimire. Jinik diçe cem meleyê gund jê re dibêje:

-Seyda dilê min heye ez ji xwe re mêr bikim. Mele jê dipirse, dibêje:

-Te çend mêr kirine? Jinik dibêje:

-Seyda tu bawer bikî min hew heft mêr kirine. Mele ji jinkê dipirse û dibêje:

-Di nav heft mêrên te de mele hebûn, tunebûn? Jinik dibêje:

-Na seyda, di nav mêrên min de mele tunebûn. Mele dibêje:

-Mala min bi gorî. Ku te mele nekiribe, tu hê keç î. Tu ji min çêtir kesî nabînî.” (Ak-yol, 2005:89).

4.3.2.2. Pesindana Tiştên Baş

Di pêkenokên kurdî yê derbarê tîpên mela tîpên gotin de, ku peyam rexnekirina tiştêkî be, ew di ser melayekî bînav re tê gotin heke pesindan an jî peyameke erênî be piranî tîpên wekî Mela Meşhûr, Mela Nesredîn tîpên bikaranîn. Melayên ku tîpên pêkenokên peyamên erênî ne; di van pêkenokan de zana, bîrbir, dinyadîtî, namuskar (xwedînamûs), xwedîwijdan, çavtêr, rastgo û destvekirî ne. Melayên di van pêkenokan de piranî xwedan taybetiyên xwe yê pîşeyî ne jî.

Mela Nesredîn bi vê pêkenokê peyamekê dide civakê ku divê tevdir ji bo dahatûyê bîr girtin. Di vê pêkenokê de awayê hizirîna mela ji ya civakê cudatir e; ev jî nîşana zanabûn û bîrbiriya wî ye.

“Melle Nesredîn diçe dinhêre, wê jinekê werisek avitiye darê, wê xwe darda dike.

Gundî dinhêrin, wekî Melle Nesredîn ber wê darê sekiniye. Divê:

-Melle Nasredîn, wê jinê ji darê bide xilas kirinê, wekî xwe nexeniqîne.

Melle Nesredîn digihîjê çiqlekî dinê dibire. Jinik dixeniqe.

Gundî divên:

-Melle, xwedê dîwana te bike, te çira wê çiqê darê nebirî, wekî jinik xilas bûya?

Melle Nasredîn divê:

-Hemîn ew çûye, min ev çiq birî, wekî jina min xwe darda neke.” (Cindî, 2009:96).

Di vê pêkenoka Mela Meşhûr de jî peyam ev e: Herçend bûyerên nebaş bîn serê we jî, ti car bedbîn û reşbîn nebin; her û her geşbîn bin.

“Xocê Menşûr rojekî ku ji çiyê daran tîne, linge kerê wî dişiqite û tilolê newalê dibê.

Xocê Menşûr li kerê xwe yê perçe perçe bûyî dinhêre û dibêje;

-Kerê min firînê hîn bûye lê hê danînê hîn nebûye.” (Diyadînî, 2011:9).

Di hin pêkenokan de jî mela, bi zanîna xwe kesên ku dixwazin wan bihetikînin, dihetikînin. Di vê pêkenokê de mela peyamê dide ku heta tiştek bi dest mirovî nekeve, ne hewce ye ku mirov li ser wê pirsan bike yan gengeşyan bike.

“Kabrayek le Mela Mehmûdî Hacî Elî pirsî: Mamoste⁶⁷ qazî quling çon ser ebirêw ekrê be biryanî? Ewîş wî: Le pêşa to bigire ca ew wexte pîşanî edem!” (Secadî, 2007:454).

4.4. RISTA PÊKENOKÊN MELAYAN

Di piraniya pêkenokan de bûyerek an jî rewşeke bingehîn heye û pêkenok li dor wê bûyer û rewşa sereke û bingehîn dizivire. Vegêran ji rabirdûyê ber bi dahatûyê ve diherike. Di vê herikîna dema bûyera pêkenokê de herikîneke rasterast heye.

Yıldırım pêkenokan ji aliyê rist û sazûnê ve dişibîne çîrokên gelêrî û weha dibêje “di pêkenokan de jî eyn wekî çîrokên gelêrî destpêka bûyerê, geşedana bûyerê û encama bûyerê heye.” (1976:49).

4.4.1. Destpêka Pêkenokên Melayan

Di destpêka pêkenokan de; qala dema pêkenokê, ciyê pêkenokê û qala tîpê pêkenokê tê kirin. Di vê beşê de, navê tîpan derbas dibe û heke hebe taybetiyeke wan a ku pêkenok li ser hatiye ristîn tê vegotin.

“Di destpêka pêkenokan de, bi du sê hevokên kurt behsa cî û dema bûyerê tê kirin, karakterên pêkenokê digel taybetiyên wan -nav, pîşe û erk- tên nasandin.” (Çotuksöken, 2003:13).

“Rojekê meleyekî musulmanan û rahibeyeke filehan li hev rûdinên û li ser olê gengeşiyê dikin. Gotin dizivire û tê ser çêbûna Adem pêximber!”

⁶⁷ Di hin pêkenokên bi zaravayê soranî de, peyva ‘mamoste’ wekî peyveke rêz û hurmetê ya bangê, ji bo melayan tê bikaranîn.

Rahîbe, ji mele dipirse, dibêje:

- Mele madem tu alimekî ewqasî xurt î, ka ji min re bêje, dema heriya adem sitiran, ka xistin navê yan na?!

Mele diponije û dibêje:

- Wele ez bawer nakim ku ka xistibin navê!

Rahîbe awirên xwe tûj dike û dibêje:

- Mele, weha nabe! Hişê xwe bîne serê xwe! Ma heriya bê ka, hevûdu digre? Ji ber vê yekê, ez dibêjim, sedî sed ka xistine navê.

Mele vê carê di ber xwe de dibêşişe û bi xwe bawer dibêje:

- Ez bawer nakim ku ka di nava heriya Adem de hebe.

Pê re mele radihêje gopalê xwe û bi ber şeqê⁶⁸ rahibeyê ve dirêj dike, dibêje:

- Ger ka di nava heriya Adem de hebaya, ev dera te ji hev nedişeqitî!” (Denîz, 2005:30).

Di vê pêkenokê de ew beş **‘Rojekê meleyekî musulmanan û rahibeyeke filehan li hev rûdinên û li ser olê gengeşiyê dikan. Gotin dizîvire û tê ser çêbûna Adem pêximber!’** destpêka pêkenokê ye. Wekî ku dixuyê tê de dema pêkenokê **‘rojekê’** ye û tîpê pêkenokê **‘mela’** û karektera pêkenokê jî **‘rahibe’** û mijara pêkenokê **‘gengeşiya li ser çêbûna adem pêxember’** hemû hatine diyarkirin.

4.4.2. Geşedana Pêkenokên Melayan

Di geşedana pêkenokan de, diyalog dest pê dikan; kitekit û hûrguliyên bûyer û rewşê diyar dibin. Di hin pêkenokên melayan de, hin hêmanên ken jî di vê beşê de cî digirin lê ev hevok û hereketên kenokî, ne yên eslî ne; amadekariyek e ji bo encama pêkenokê. Bi giştî mirov dikare bibêje ku ev beş, beşa amadekariya encamê ye.

Çotuksöken di pirtûka xwe ya derbarê *Pêkenokên Bektaşîyan* de weha dibêje: “Di beşa geşedanê de, pirs û bûyera ku tê serê Bektaşî tê vegotin, karakter û guhdêr jî di mereqa bersiva Bektaşî yan jî berteka wî de ne.” (2004:26).

Di geşedana pêkenokan de, mijara niqaşê û diyalog cî digirin. Tevger û hewldanên karakterên pêkenokan bi awayên kurt di vê beşê de dixuyên (Yıldırım, 1976:49).

⁶⁸ Îhtimal e ku li vir sansurek heye, mebest ji vê peyvê q... rahîbeyê ye. Îcar kê sansur kiriye ev deq – gotox, berhevkar, weşanger- ew bi serê xwe mijareke din e.

“Mele Qaso⁶⁹ her tim ji gel re digot: “Bi ya şeytên nekin. Hûn bi ya şeytên bikin hûnê herin dojahê.”

Rojekê yekî gundî, li ser benderan zikata wî amade kiribû. Bangî mele kir û jê re got:

-Mele, tu zanî şeytan ji min re dibêje: “Îsal para mele nede.”

Mele:

-Tobe tobe, tu kafir dibî kuro...!

Yê gundî:

-Mele a niha şeytan dîsa ji min re dibêje: “Divê tu para mele du qat bikî û bidêyî.”

Mele:

-Heke mirov salê carekê bi ya şeytên bike, tu zirara wê tune ye!” (Mazî, 2014:297).

Di vê pêkenokê de ji ciyê diyarkirî heta bi hevoka dawî geşedana pêkenokê ye. Tê dîtîn ku diyaloga mela û zilamê gundî bûye geşedana pêkenokê. Herweha tevger û hereketên mela û zilamê gundî jî di vê beşê de ne. Wekî ku Çotuksöken jî gotî, afirandina mereqa guhdaran jî di vê beşê de ye.

Geşedana hin pêkenokan dirêj a hin pêkenokan jî kurt e. Hetta di hin pêkenokan de geşedan ewçend kurt e ku nayê ferqkirin. Di van pêkenokên weha de destpêk û encama pêkenokê li pêş e; lê geşedan nixamtî ye. Di pêkenokên ku beşa wan a geşedanê hinekî dirêj e de hûrgulî û diyalog zêdetir in. Ji bo famkirina geşedana dirêj û kurt berawirdiya van her du pêkenokên jêrîn dê mifadar be.

“Mela dema ku ji mizgeftê derket, nihêrî ku kerek li ber derî ye. Hinekî bi ecêbmayî û hinekî jî bi henek dibêje:

-Ev xêre, ev kera hanê li vê derê çi digere? Weleh min heta niha sofîyê ker dîtiye, lê min kerê sofî nedîtiye!” (Mazî, 2014:288).

“Şerebvexwarek û meleyekî dîndar li ser helal û heramiya şerebê munaqêşe dikin. Şerabvexwar ji melê re dibêje:

“Mele, bi Qurana ku te xwendiyê, şerab ne heram e. Çima dê şerab herem be? Ma ew ji demûşa tiriye çêdibe, na? Dema miro tirî dixwe ne heram e. Demûşa wê ve-

⁶⁹ Navê mela ye.

dixwe, ne heram e, lê dema şerabê vebixwe heram e? Her du jî, ji tirî çêdibin. Bi Qurana ku te xwendîye, di nav wan de tu ferq tune lo!”

Li ser van gotinan, mele dike ku dîn bibe û êrîşê şerabvexwar dike:

“Ma zindîq herê welle, dema her du jî, ji tirî bin dibin yek? Wê çaxê şîr û mîza diya te jî yek in, her du jî ji laşê diya te derdikevin. De here mîza diya xwe vexwe!”

(<https://occomahabad.wordpress.com/2012/07/12/pekenoken-kurdi/19.04.2017>).

Ku berawirdiyeke ji aliyê beşa geşedanê ve di navbera van her du pêkenokên derbarê melayan de bê kirin, tê dîtin ku di pêkenoka ewil de beşa geşedanê pir kurt e û di pêkenoka duyem de bêhtir dirêj e. Ku mirov ji geşedana pêkenoka duyem hin hevokan derxe jî vegêran xera nabe, çimkî hebûna van hûrgûliyan, ne esasê rista pêkenokê ye, dikare bê gotin ku ew ‘xemla pêkenokê’ ne.

4.4.3. Encama Pêkenokên Melayan

Encam, beşa dawîn a hemû vegêranan e; herçend pêkenok kurtevegêran bin jî ew jî xwedî encamê ne. “Ji beşa destpêkê heta beşa encamê pêkenok deqekê di mêjiyê guhdar û xwendevanan de ava dikin û herweha encama vê deqê jî bixwe deqeke serbixwe ye. Lê ev deq nelihev û nakok in; ev nelihevî û nakokî dibin sedema ken.” (Ülper, vgz Kılınç, 2010:13).

“Encam, beşa derbê ye û meraq di vê beşê de bi dawî dibe; bertek û gotina tîpê pêkenokê dibe sedema kenokiyê.” (Çotuksöken, 2003:23).

Özkan jî di wê baweriyê de ye ku “di beşa encamê de peyama pêkenokê tê dayîn, pêkenok bi hevokeke kenokî bi dawî dibe.” (1983:159).

“Dibêjin Mîrşa⁷⁰ li deştê bostanekî dajo, gava meha havînê ya dawiyê tê, bostan diximxime, Mîrşa kurê xwe dide ber bostan. Rojekê ji rojan melayê gund û gamêşekî har bi hev re dikevin nav bostan. Lawik bang Mîrşa dike:

“Bav, bavo! Bi aliyekî ve melayê gund ketiye nav bostan, bi aliye din ve jî gamêşê har ketiye nava bostan. Ez çi bikim? Ez gamêş ji nav bostan derbixim, yan?!”

Mîrşa bi hêrs û denge bilind,

“Na lawo! Gamêş cîh bihêle, melayê gund ji nav bostan derxe!”

(<http://dengema-mostec.com/xiyar-u-miyar,-mela-u-bostan.html>.18.04.2017.)

⁷⁰ Navê zîlam e.

Nakokiya di navbera encam û her du beşên ewil -destpêk, geşedan- bûye sedema kenî. Nakokî jî ew e ku, mirov dipê ku Mîrşa ji kurê xwe re bibêje, gamêş derxe, çimkî gamêş ajalek e û zirara ku ew bide bostan ji mirovekî zêdetir e. Lê bersiva Mîrşa guhdar û xwendevanan diheyirîne û ew bi gotina xwe mela dixe bin asta ajalan. Wekî ku Özkan jî gotî, encama pêkenokê di heman demê de dibe peyama wê pêkenokê.

Dîsa di vê pêkenokê de tê xuyan ku encama pêkenokê hevokeke kurt û bandorker e. Jixwe berê jî hatibû qalkirin ku ji pêkenokan çawa biwêj û gotinên pêşyan dertên. Biwêj û gotinên pêşyan ên ji pêkenokan derketine bi piranî ji beşa encama pêkenokan hatine girtin.

"Melle Nasredîn sivê radive, diçe cot dike. Wextekî şûnda tî dive. Kanî dûr bûye. Melle Nasredîn ga bi cot va dihêle, diçe avê bîne. Heta vedigere tê cem cotê xwe, dîna xwe dide da -gayê wî birine, serê cotê wî hevraz kirine.

Wî çaxî Melle Nasredîn difikire û divêje: "Heve, tuneve xwedê gayê min dizîne, lema serê cot hevraz bûye." (Cindî, 2009:115).

4.5. DEMÊN BÛYERÊN PÊKENOKÊN MELAYAN

Ji têgeha demê mebest 'bûna bûyerên pêkenokan' e; demên îcrakirina pêkenokan bi serê xwe mijareke din e û ew ne di çorçoveya vê xebatê de ye. Artun derbarê dema bûyerên pêkenokan de, di wê baweriyê de ye ku, di hin pêkenkan de dibe ku dem diyar be û di hinan de jî dibe ku nebe (2013).

Dem, wekî hêmaneke vegêranê, digel tîp û ciyên pêkenokê xwedî wateyekê ye. Akçar derbarê dema bûyerên pêkenokan de dibêje ku; "Tê dîtî ku nediyariya demê li pêş e. Lêbelê di pêkenokên ku di ser tîpekî re tên vegêran de ev nediyariya demê ji holê radibe. Heke tîpê pêkenokê kesekî jiyabe, dema pêkenokê jî dema ku ew tîp jiyaye." (2010:95).

Ev pêkenok di ser tîpê Mela Nesredîn re hatiye vegêran û dema vê pêkenokê jî diçe heta bi jiyana Mela Nesredîn û Şahê Îranê ango dîrokeke kevn.

"Go, hebû şahekî îranê. Hespekî wî hebû. Navê hespê Nazilî bû. Ewî digot: -Ez zef ji hespê xwe hiz dikim. Kî bêje "Nazilî gever bûye", ezê wana bikujim."
Melle Nasirdîn guhdariya hespê wî dikir. Ew duşurmîş bû:

"Wekî tiştekek bê serê hespê, ezê çawa xwe bidim cem şah?"

Rojekê jî çû tewla hespa, nihêrî Nazlî serê xwe daniye erdê, situkura xwe dirêj kiriye, lingê xwe ber xwe radaye. Ewî îdî zanibû, wekî Nazilî gever bûye, go "Ezê çi cawa⁷¹ şah bidim?" Çû cem şah got:

-Şah xweşbe, Nazlî serê xwe daniye erdê, situkura xwe dirêj kiriye, lingê xwe ber xwe radaye û çevê xwe girtiye.

Şah go:

- Melle Nasirdîn, dive⁷² gever bûye?

Melle Nasirdîn got:

-Şah xweşbe, te got "gever bûye", min ne gotiye. Wekî min bigota -"gever bûye", teyê ez bikuştama." (Cindî, 2009:111).

Di vê pêkenoka jêr de jî dem, hê nû ye; zehf wext di ser re neboriye. Ji peyvên **'telewîzyon'** û **'Îmam Xetîbê'** tê zanîn ku di ser vê pêkenokê re zêde dem derbas nebûye, çil pêncî sal tê heye yan na.

"Melayekî dibistana "Îmam Xetîbê" dihere gundekî, meletiyê dike. Lê belê pir ji gogê (futbol) hez dike.

Rojekê yarî hebûye di televîzonê de. Lê dema wê û nimêjê yek bûn. Mela bi lez û bez azan dide û dihere ser secdê. Mirovên mizgeftê lê ecêb dimînin. Dibêjin: "Ka ji bo çi melayê me ewqas dilezîne." Lê tiştekekî jê fêhmakin. Mele zû zû dihere qametê û weha dibêje:

-Zû nimêj bikin maç heye. Elahûekber!" (Mazî, 2014:288).

Boyras di derheqê dema bûyera pêkenokê de kurtedemiya vê cureyê nîşan dike û dibêje;

"Li gorî cureyên din ên edebiyata gelêrî û dema pêkhatina rewş û bûyera pêkenokê, demeke pir kurt e. Di navbera dema destpêk û encama pêkenokê de demeke kurt heye. Di gelek pêkenokan de ev dem 'kêlîkek' e û di hinan de jî hebe hebe hefteyek an herî zêde jî mehek e." (1996:76-77).

Wekî ku di vê pêkenoka jêrîn de jî dixuyê dema pêkhatina bûyera pêkenokê pir û pir kurt e.

⁷¹ Caw: Cewab, bersiv.

⁷² Dive: Dibe

“Rojek Melê berepaş li hêstira xwe siwar bûye û li rê çûye. Kesên ku ew wisa dîtine, têra xwe pê kenîyane û paşê jê pirsîne, gotine:

-Êra tu çima wisa berepaş li hêstirê siwar bûyî?

Melê gotîye:

-Ne ku ez berepaş siwar bûme, hêstir çewt hatiye binê min.” (Bozarslan, 2004:26).

Di navbera dema di bûyera siwarbûna berepaş a mela û dîtina xelkê de, demeke dirêj tune ye; dikare bê gotin ku ev kurtedemek, **‘kêlîkek’** e. Lê di vê pêkenoka jêrîn de ev dem hefteyek e.

“Dibêjin zemanê berê gava ku mirov dimirin hinek kesên dewletî li hinda mezelan kon vedigirtin meytê miriyê xwe datanîn binê kon û heta êvara îne meleyan bi heqê xwe li ser miriyan dixwendin. Roja îne jî miriyê xwe vedişartin. Qey rojekê dîsa yek dimre û hîna ji rojan şemî ye. Mele bi qasî hefteyekê li ser mirî dixwîne. Herçiqasî bi heqê xwe be jî qey Mele jî vê kirinê aciz e. Wexta ku mirî tînin û dikin veşêrin Mele devançeya xwe ji ber xwe dikişîne û çend derban bera mezêlê vala dide. Ji ber ku li ser mezelan pir mirov hene herkes ditirsîn û dibêjin qey hinekan berdan hevdu. Gava ku fêma dikin Mele devançe berdaye mezêlê vala, dibêjin:

-Mele mala te bişewite, te em bizandin⁷³ ev çi bû îcar!

-Mala we bişewite law, qey qencî jî bi kêrî we nayê?

-Qenciya çi mele, te em tirsandin!

-Hûn nizanin, nedihîştin miriyê we binax bibe loma min devançe berda wan!” (War, 2013 b:58).

Di hinek pêkenokan de jî mirov bi hebûna demê nahese encax bi saya hin peyvan têderxe ku ka dema pêkenokê çi wext e. Dikare bê gotin ku ‘demeke veşartî’ heye di van pêkenokan de. Di vê mînakê jêrîn de, bi xêra peyva **‘tirî’** mirov tê derdixe ku dema pêkenokê yan havîn yan jî payîza ewil e.

“Meleyê gundê Belaxurê bi navûdenge. Li sûka Erxenî digere, dê ji xwe re çend kilogram tirî bikire. Ji nişkave girminiyeke ji paş stûyê wî tê. Bi hêrs vedigere, ka çi bibîne? Mêrikek bilind û xurt wekî gayê biharê li paş wî sekiniye.

⁷³ Bizandin: Bizdandin, tirsandin.

Mele dipirse:

“Ew tu bû te li min xist?”

“Erê ez bûm. Êê çi bû?”

“Te bi rastî li min xist an bi henekî?”

“Bi rastî li te xist. Ka tu yê çi bikî?”

“Tobe tobe, min jî got qey te bi henekî li min xistiye. Ez ji henekan hîç hez nakim.”

(Ustun, 2017:61).

Wekî nirxandinekê mirov dikare bibêje ku di hinek pêkenokên melayan de dem diyar e û di hinekan de jî dem ne diyar e. Di dabeşkirina vê beşê de sûd ji xebata Civelekoğlu (2010:56-57) hat wergirtin. Di vê binbeşê de dê qala demên diyar û ne-diyar bê kirin.

4.5.1. Pêkenokên Melayan ên Demdiyar

Diyarbûna demê ya van cure pêkenokan bi hin awayan e. Yek jê ew e ku bi saya tîpê pêkenokê û karakterê/ên pêkenokê ye. Bikaranîna navê padîşah, beg û serokeşîran dibe delîveyek bo tespîtîkirina dema van pêkenokan. Duyem jî behskirina bûyerên girîng ên dîrokê jî dibe derfeteke tespîta demên pêkenokan.

*“Le dewrî Muhmu Şada qaziyek nêrraye Helebce, Mela Ehmedî naw bû. Remezan be sera hat, ew sale bîst û no roj bû, salî diwayî remezan le Hewlewee rojêkî lê xurabû le axidîş be bîst û no roj, qazî Fitahî Cejnî derkird, remezanî ew sales bû be bîst û heşt roj! Inca Mehmud Paşa nardî mezbeteyekyan kirdewew nardî xoyîş morî bika. Qazî pirsî: Paşa eme çiye? Wîfî: Qazyefenî mezbeteye kirdumetewew eynêrim bo **Ebdulhemîd** le Estembol. Wîfî: Boçî? Wîfî: Bo ewe ta bîst û heşt salî tir to lêre bimênîtewe îtir remezanman be tewawî le kol exey, çî leme çaktire?!”* (Secadî, 2007:181).

Bi saya peyva ‘**Ebdulhemîd**’ê padîşahê Osmanî tê zanîn ku bûyera vê pêkenokê di navbera salên 1876-1909ê de ye. Ev salên han salên desthilatdariya Ebdilhemîd e li ser textê dewleta Osmanî. Di vê pêkenoka jêr de jî bi qalkirina bûyereke dîrokî dema pêkenokê hatiye diyarkirin. Derketina Tevgera Hîzbullahê li Farqînê piştî sala 1992yan e.

“Mele Salihê ji Gomê Îndarê li gundekî navçeya Farqînê meletiyê dike. Du salên wî li gund diqede. Rojekî hevalê wî jê dipirse, dibêje:

-Mele Salih çawa ye? Te pir genim da hev. Mele Salih dibersivîne, dibêje:

-Malava çi çawa ye? Salekî zîpik û salekî hîzpik tişteki tune ye. Hevalê wî dîsa dipirse, dibêje:

- Çi? Mele Salih dibêje:

- Salekî zîpikê li debra gundiyan xist. Bac nêdan min. Sala dinê jî Hîzbollah ketin gund. Wan jî bac ji gundiyan stendin. Ji min re nema. Du salên min badilhewa çûn.” (Akyol, 2005:91).

4.5.2. Pêkenokên Melayan ên Demnediyar

Di van pêkenokan de demeke teqez nayê diyarkirin, ji bo temamkirina hêmanên vegêranê demeke nediyar tê bilêvkirin. Di pêkenokan de gotinên wekî **‘rojekê, havînekê, carekê, di meha remezanê de, şevêkê, rojeke havîna germ, rojeke sar, dema mela xort bû, dema mela ne li malê bû, piştî ku jina wî mir’ û ‘dema li filan gundî mela bû’** tînin bikaranîn. Di hin pêkenokan de jî dema pêkenokê bi bûyerên rojane hatiye diyarkirin. Di vê mînakê jêrîn de dema pêkenokê nediyar e; bes bûyer piştî mirina keyayê gund e.

“Li gund keyayê gund dimire. Wî dibin goristanê wê veşêrin. Meleyê gund jî zekat necivandiye. Gundî her yek çûye bajarek. Ji bo ku keyayê gund miriye, gundî diçin gund. Eza fam dike wê mele here goristanê. Eza ji mela re dibêje:

-Seyda tu neyê goristanê. Dema em zivirîn, ez ê zekatê ji gundiyan bistînim. Gundî diçin goristanê. Mele radibe cilê diavêje ser piştî tajiya xwe. Heqîbê jî diavêje ser. Berê tajiye dide nav goristanê. Diçe goristanê. Gundî tev dikenin. Eza dibêje:

-Mele min ji te re got neyê goristanê. Dema em werin malê em ê ji gundiyan bistînin. Mele dibêje:

-Filankes ez ê we li ku bicivînim ser hev. Bi zor hûn civiyan e. Kanê zekata min bidin min.” (Akyol, 2008 b:73).

Yıldırım di wê qinyatê de ye ku nediyariya demê ya di pêkenokan de ne kêmasî û qelsiya vê vegêranê ye; berovajiyê vê, wekî xaleke ku taybetiya pêkenokan dibîne û dibêje; “ji ber ku pêkenok bi devkî belav dibin di bîra xelkê de tîpê pêkenokê dimîne, lewre ji bo wan ne girîng e ku ev bûyer kengî qewimiye.” (1976:62).

Wekî mînak di vê pêkenoka jêrîn de, gotin, kirin û tevgera mela di bîra guhdar û xwendevanan de dimîne, çiku zanîna demê tiştêkî li vegêranê zêde nake.

“Jû îmam newe şono jû dewe de îmamtiye keno. Her çî rind o, la îmam meyîtan zaf rew şuno û rew defn keno. Dewijî na lerza îmamî de ecêb manenê, tayê zî şik kenê. Seba ke wazenê naye bizanê, jû kesî qesta kenê meyît benê leweyê îmamî. Îmam na reye giran şuweno. O wext her kes vano “ma guneyê îmamî giroto, mêrik nê karî rind keno.” Îmam vecîno teber dewijan ra vano:

-Gelê dewijan! Naye ra tepîya, jû kes ke heta ke rind nêmerd meyarê. Mi heta ke no meyît kişt, rind kerd meyît û şut, ez zaf qefelîyaya.” (Sertkaya, 2014:31).

4.6. CIYÊN PÊKENOKÊN MELAYAN

Cî, digel hêmanên din ên vegêranê -bûyer, kes, dem- xwedî ciyekî girîng e di sazkirina vegêranê de. Di hemû vegêranan de ne di heman astê de be jî, hebûn û nîşana cî bandorê li deqê dike. Nêrîna Narlı ya derbarê mijarê de wisa ye;

“Berî hemû tiştî qet nebe cî, dekora bûyeran e. Ku bi giştî lê bê nêrîn cî ew der e ku bûyer û karakter li wir dijîn û hay ji hebûna xwe dibin. Digel vê jî cî derfet dide ku derbarê aborî, awayê hizirîn û derûniya tîpan de agahdariyek çê bibe. Cî, wekî hêmaneke bûyerê bandorê li çêbûna aksiyon û çarçoveya aksiyonê dike. Herweha hin cî, dibin alîkarên tîpan hin jî dibin asteng jê re.” (2002).

Çoban jî di gotareke xwe ya derbarê tîpekî deverî de, derheqê ciyê pêkenokan de dibêje ku, ciyên ku rojane mirov diçinê yên mîna qehwe, loqante, berber, çayxane di pêkenokan de pirî caran wekî ciyê bûyera pêkenokê tên xuyan. Ev cî dibe ku rêyek be jî (2014).

“Berhemên li ser bûyeran ava bûne çawa ku pêdivî bi ristîna bûyeran, kadroya karakteran, dem û vegêr heye wisa pêdivî bi cî jî heye. Cî jî herî kêr bi qasî wan hêmaneke girîng e.” (Temizkan, 2012).

Di hin pêkenokan de ciyê pêkenokê ciyek e, di hinan de jî ji yekê zêdetir e. Di van pêkenokên ku cî diguherin de, carna destpêka pêkenokê li mizgeftê, geşedana wê li kolanê, encamê wê jî li malê dibe; yan jî ji malê dest pê dike û li kolanekê bi encam dibe. Bi van du mînakên dê mijar hinekî din zelal bibe.

“Şevêk xêzana Melê ji xew hişyar bûye û ji şûyê xwe ra gotîye:

-Mela, find li alîyê te yê rastê ye. Ka ji kerema xwe bide min, da ku ez pêxim.

Melê hêrs bûye û qîrîyaye ser xêzana xwe, gotîye:

-Jinë, ma tu dîn bûyî? Ez'ê di vê tarîfîyê da çawa rast û çepê xwe ji hev nas bikim!"
(Bozarslan, 2004:24).

Di vê pêkenokê de ciyê pêkenokê 'mezel'a mela û jina wî ye. Heta dawiya pêkenokê jî cî qet naguhere; lê di hin pêkenokan de cî guherbar e. Bûyer li ciyekî dest pê dike û li ciyekî din diqede. Di vê pêkenoka jêrîn de jî cî, ewilî 'rê' ye û paşê jî bûye 'newal'ek.

"Rojek Melê di rîyek da çûye. Rîya wî rastê newalek hatiye. Bi ser newalê ra qavz daye û xwe avêtîye wî ceberî. Şansê xirab, di qavzdanê da ji zoran, çima ba bi ber'ê neketîye! Hingê axînek kişandîye û xwe bi xwe gotîye:

-Aaaax extîyarîyê, ax!

Paşê li dora xwe nihêrtîye, dîtîye kesek li wan deveran tune. Vêca deng li xwe kirîye û ji xwe ra gotîye:

-Bi Xwedê tu di ciwanîya xwe da jî ev bûyî; lê de haydê, sûc bavêje stûyê extîyarîyê."
(Bozarslan, 2004:33).

Ji bo ku bi giştî ciyên pêkenokên melayan bên diyarkirin, pêdivî bi polînkirinê heye; lewre li gor diyarkirin û nediyarkirina van ciyan polînkirinek hat kirin.

4.6.1. Pêkenokên Melayan ên Cîdiyar

Çi rasterast, çi jî ne rasterast be di van pêkenokan de, ciyê pêkenokê hatine diyarkirin û cî wekî hêmaneke vegêranê xwedî bandor e li ser pêdaçûna pêkenokê. Di hinek pêkenokan de navê gund, bajar an jî herêmê derbas dibe.

"Şeveka havînê Melê û xêzana xwe razayî bûne. Hewa jî gelek germ bûye. Jinik ji german hişyar bûye û ji şûyê xwe ra gotîye:

*- Pirr germ e; xwe piçek wir ve bide. Melê ji wê peyva jinekê hêrs bûye û ji nava nivînan rabûye, ji malê derketîye, li kerê xwe siwar bûye, çûye û çûye, heta **deşta Mûşê** sekinîye. Li wir rastê gundîyekî xwe hatiye û jê ra gotîye:*

-Dema ku tu bigijî gund, here ji xêzana min bipirse ka gelo bes e yan ez hinek ji wir ve herim?" (Bozarslan, 2004:38).

'**Deşta Mûşê**' ciyekî diyarkirî ye vê pêkenokê ye ku rasterast hatiye binavkirin. Ev cî, pirî caran li gor vebêjerê pêkenokê diguherin. Ku vebêjer ji Herêma Bo-

tanê be, navê deşta Mûşê diguhere navê herêma xwe yan jî herêmeke nêzî herêmeke xwe datîne.

Ciyên diyarkirî yên di pêkenokên melayan de hatin tespîtkirin ev in: Aş, axur, kolan, qad, gund, rê, rêl, sûk, çiya, zevî, baxçe, çem, goristan, mezat, newal, mehke-me, xanî, qesr, xan, mizgeft, himam. Ev cî jî di nav xwe de dibin du kom; ciyên girtî û ciyên vekirî. Ji bo ciyên girtî û ciyên vekirî ev her du pêkenok mînak in.

“Xocê Meşhûr ji xwe re rezekî danîbû. Rezê wî şîn bû, lê pir ecêb çêbû ku tiriye wî awha tevde belek, xweşik û kes bûye.

Rojekê Xoce radibe diçe nava rezê xwe, gava dibîne ku wisa bittir bûye kêfa wî pir jê re tê û xwe bi xwe hesab dike, dibê: “Wê ewqa tirî jê bê, em ê bikelînin û bi dims kin. Ez ê dimsa xwe bifroşim û wê ewqas pere jê bê, ez ê pê filan îşî bikim, bêvan îşî bikim...”

Xoce hêj li nava rez bû, hema carekê nerî ku ewr li ser serê çêbûn û asîman tarî bû; bû mij û dûman û baran hat. Xocê kurk ji xwe kir û avête ser mêwekê, ket binî. Ewran kire girregirr û baran û zîpik bi hev re zorî danê, qederekê barîn. Piştî dinya ji hev xêz û sêz bû, ewr firrikîn û roj derket, Xoce jî bi binê kurkê xwe derket û li rez nerî, bala xwe dayê ku mêwên wî tev weke tiliyan rût bûne; ne pel bi mêwan ve maye, ne weşiyek tirî maye. Lê ew mêwa ku Xoce kurkê xwe avêtibû serê û ketibû binî de tişteke pê nebûye û tiriye wê pê ve ye, pelên wê jî şîn dikin. Xoce carekê weha li wê mêwê vegeriya û lê nerî, li wan mêwên rût nerî, hema şivekê hilda û got “şerp û rep, şerp û rep...” lê xist û lê xist heta ku pel û tiriye bi wê mêwê ve jî tev weşandin û got: -De bila dilê Xwedê axa qenc bi min rihet bibe!” (Zinar, 1996:133).

Ciyê vê pêkenokê diyar e û ev cî, ciyekî vekirî ‘nav rezekî’ ye. Bûyera pêkenokê li vî ciyê vekirî diqewime û li wir bi dawî dibe. Di vê pêkenoka jêr de jî ciyê bûyerê ‘mala mazûban’ e. Mal jî ciyekî girtî ye.

“Dibêjin rojekê Mele Nisredîn dihere mêvantiyê. Kî were mala mazûbanê wî, mazûban sênîkek hunguv datîne ber wan. Heçî kesên ku li wî zilamî dibin mêvan piştî çend kevçiyên ji hunguv tahm dikin nema hunguv dixwin! Lê mazûban dinêre ku Mele Nisredîn xwarina hunguv naterikîne û dike giştikî biqedîne! Li ser vêya mazûban dibêje:

-Mele Nisredîn hindikî bixwe ew ê hundurê te bişewite gidî!

Mele Nisredîn hin xwarina hunguv didomîne him jî lê vedigerîne û dibêje:

-Xwedê zane bê ew ê hundurê kê bişewite!” (War, 2013 a:13).

Di hin pêkenokan de jî ciyên girtî û ciyên vekirî digel hev hene; wekî ku berê jî hatibû qalkirin, ev pêkenok dibin ‘pêkenokên pirciyî’. Di vê pêkenoka Mela Nesredîn de ciyê ewil ‘mala Mela Nesredîn’ e û ciyê duyem jî ‘rê’ye. Guhertina cî, ji ciyekî girtî ber bi ciyekî vekirî ye.

“Dibêjin rojekê Mele Nisredîn bi şev bi xwe dihesê. Dinere ku diz ketiye mala wî. Ji tirsê ruhê xwe newêre deng bike! Diz malê dide hev û li kerê dike û dihere. Mele Nisredîn jî destê wî ji eşyayên mala wî nabe û bi dizîka dide dû diz. Çima diz lê hay nabe. Lê vedigere û dibêje:

-Ev tu kî yî? Çima te daye pey min?

-Mala ku te barkiriye ez xwediyê wê me! Ma ne em bardikin derek din?” (War, 2013 a:37).

4.6.2. Pêkenokên Melayan ên Cînediyar

Di van pêkenokan de bi ti awayî cî nehatine diyarkirin. Ji hevok û peyvên ji nayê derxistin ku bûyer li ku qewimiye. Di van pêkenokan de, diyarkirina ciyê pêkenokê ewçend ne girîng e.

“Rojek zilamek ji Melê ra gotîye:

-Îro dawiljenek û zirnevanek mirine.

Melê kenîyaye û gotîye:

Nexu dê di dojê da şênayî bê çekirin.” (Bozarslan, 2004:23).

Dibe ku ciyê vê pêkenokê ‘mal’, ‘mizgeft’, ‘rê’ an jî hin ciyên din bin. Bi ti awayî serwextbûneke di derbarê cî de tune ye; lewre jî ev pêkenok, pêkenokeke cînediyar e.

4.7. KAREKTERÊN PÊKENOKÊN MELAYAN

Karakterên pêkenokan, dibin alîkarê tîpê pêkenokê û di destpêkirin, geşedan û encama pêkenokê de xwedî roleke alîkar in. Ji ber ku pêkenok di nav gel de hîn jî pir zindî ne, gelek kes wekî karakterên pêkenokan dixuyên. Boyraz weha qala karakterên pêkenokan kiriye; “Bi giştî tê dîtin ku kadroya karakteran(şexsan) di pêkenokan

de pircure ye. Yek ji wan sebebên qîmetdana gel a ji bo pêkenokan jî ew e ku, tîpên rasteqîn ên jiyanê di pêkenokan de jî bi heman awayî hene.” (1996:78).

Lîsteya karakterên pêkenokên melayan lîsteyeke dirêj e, lewma her karaktereke ku carek du caran derbas bûne me wekî karakter nenivîsîn. Ev karakterên hatine nivîsîn ne di sê çar pêkenokan de, di gelek pêkenokan de bûne karakter.

Bi giştî ku lîsteya karakterên pêkenokên melayan tê nêrîn du cure karakter dixuyên. Karakterên mirov û karakterên ajal. Herçend roleke tayînkir a karakterên ajal tune be jî di van pêkenokan de, ew alîkarên tîpê pêkenokê ne.

4.7.1. Karakterên Mirov

Karakterên mirov, ew kes in ku di pêkenokê de dibin alîkarê pêdaçûna pêkenokê. Karakterên mirov ên di pêkenokên melayan de li der û dora wî ne; an endamê/e malbata wî ne, an derûcîran û hevpişeyên wî an jî di nav jiyanê de ew têkil-darê jiyanê mela ne.

Divê pêkenokên ku mela tê de tîp in û pêkenokên ku mela tê de karakter in ji hev bîr cudakirin. Di hin pêkenokan de, mela hene lê ne tîpê pêkenokan e; herçend tevlihev bixuyê jî ne wisa ye, riya çareseriyê ew e ku bi baldarî li encama pêkenokê bê nêrîn. Bi vê mînakê dê mijar zelaltir bibe.

“Mele diçe gund, meletiya gund dike. Cîranê mele şivanê gund e. Mele dimêzîne şivan limêj nake. Tim di nava pezê xwe de ye. Ji gomê dernakeve. Ji jina xwe re dibêje:

-Jinê cîranê me limêj nake. Ez êvarê herim mala wî. Jê re qala limêj û desmêjê bikim. Guneh e. Bila ew jî limêj bike.

Êvarê diçe mala şivan. Şivan li gomê ye. Mele diçe nava pez. Dest pê dike ji şivan re qala desmêj û limêjê dike. Şîretan li şivan dike. Dimêzîne hêsirên şivan diherikin. Mele qure dibe. Di dilê xwe de dibêje: “Min wî anî îmanê. Dilê wî şewitî. Ji heybeta şîretên min digirî.” Mele ji şivan dipirse, dibêje:

-Cîran tu bi navê Yezdanê Dilovan bikî. Tu çima digirî? Şivan dibêje:

-Seyda şeva berê nêriyê min li dewsa te mexel ketîbû. Dema kayin kir, rûyê wî dileqiya. Serê sibê nexweş bû. Min serjêkir. Rûyê te jî leqiya, nêriyê min ket bîra min. Min di ber xwe neda. Ez giriyam.” (Akyol, 2005:69).

Di vê pêkenoka jorîn de ‘şivan’ tîpê pêkenokê ye, ‘mela’ jî karakterê pêkenokê ye. Di vê mînaka din de jî ‘mela’ û ‘gundî’ karakter in û tîpê pêkenokê ‘zarokên gund’ in.

“Berê li gundan di meha Remezanê de gundiyên hal û wexta wan di cî de bun mewlud didan. Di mewludan de xizmeta herî zêde zarokan dikir. Di van mewludan de, xwarina ji ber mezinan dima didan zarokan. Yanî xwarina bermayî heqqê zarokan bu.

Di mewludê de piştî ku şorbe tê xwarin, Seyda ji cemaetê re dibêje: “Bila kes şorba xwe nehêle, lewra israf heram e. Qedandina xwarinê sunnet e.

Bi vî awayî hemu şorbe xelas dibe.

Di pêy şorbê re xwarin û pêxwarin tê, Seyda dîsa ji cemaetê re dibêje: “Bila kes xwarin û pêxwarina xwe nehêle lewra israf heram e. Qedandina xwarin û pêxwarinê sunnet e.

Bi vî awayî cemaet xwarin û pêxwarinê jî xelas dikin.

Di piştî xwarin û pêxwarinê de şêrînayî û di pêy şêrînayê de jî fêkî tê. Seyda dîsa dest pê dike dibêje: “Tişteki nehêlin tevî bixwin, lewra israf heram e û sunnet jî maqbul e.”

Bi vî awayî zarok wê rojê birçî dimînin,, lewra ji ber yekî tu tişteki xelas nebuye. Di piştî xwarinê de Seyda gazî zarokan dike û dibêje misîn bînin avê li destê min bikin da ku ez destê xwe bişom.

Dema ku Seyda destê xwe dişo ji zarokan dipirse, dibêje:

“Xwarzê navê we çi ye?

Ji zarokan yek bersiva wî dide dibêje:

“Seyda navê me ferz e.

Seyda şaş dimîne dibêje:

“Malneket ev çi nave, ma navê însanan qe dibe ferz?

Zarok bersiva wî dide û dibêje:

“Seyda ma bila navê me sunnet be û tu me jî bi gundiya bidî xwarin.”(<http://fikramedmizah.blogspot.com.tr/2016/06/em-bibejin-sunnet-tu-me-bi-gundiya-bidi.html#more>. 06.12.2016)⁷⁴

⁷⁴ Di lênêrîna 21.12.2017an de blogê hişyarî da ku ev blog hatiye rakirin.

Di hin pêkenokan de karekterek tenê heye digel tîpê mela, di hinan de jî du sê karekter bi hev re hene. Mînak; hem jina mela heye hem jî cîranên mela hene an jî hem diya wî heye hem jî gundî hene.

Dabeşkirina karekterên mirov di pêkenokan de mijareke girîng e. Akçarê di xebata xwe ya derbarê pêkenokên *Încilî Çavuş*⁷⁵ de karekterên mirov di bin şeş beşan de nîşan dane:

1. Rêvebirên dewletê
2. Kesên ku nêzî Încilî Çavuş⁷⁶
3. Biyanî
4. Kesên dîndar
5. Jin
6. Kesên nediyar (Akçar, 2010:71-91).

Dursun Yıldırım jî di xebata xwe de karekterên mirov dabeşî sê koman kirine:

1. Rêvebirên dewletê
2. Kesên dîndar
3. Kesên ji rêzê, ji nav xelkê (1976:54).

Ev karekterên mirov ên di pêkenokên melayan de li gor daneyên berdest hatine polînkirin, dibe ku di hin pêkenokên melayan ên nehatine çapkirin de hin karekterên din jî hebin. Polînkirina me ya karekterên mirov bi vî awayî ye:

4.7.1.1. Lawê Mela

Lawê melayan di pêkenokan de bi sê navên cuda derbas dibin: ‘kur, law û ge-de.’ Yek ji wan karekterên herî girîng ê pêkenokên melayan e. Mela û lawê xwe geh bi hev re xwarinê dixwin geh bi hev re bi rêyekê de diçin geh jî diçin mêvanetiyekê. Lawê mela, di pêkenokên melayan de bi taybetiya xwe ‘zaroktî’yê cî digire. Kar û barên hêsan dike yan jî digel bavê xwe yê mela diçe karekî û berdestiyê bavê xwe ye.

Lawê mela, di piraniya pêkenokên melayan de, xwedî rolekî tebat e; bes di hin pêkenokên de lawê mela bi roleke lebat radibe. Di pêkenokên ku lawê mela lebat e de, bi tenê navê wî derbas dibe, qet naaxive û tişteki nake. Di pêkenokên ku lebat e

⁷⁵ Tîpekî pêkenokên tirkî.

⁷⁶ Mebest jê malî, xizm û dostên wî ne.

de, ew bi bavê xwe re dide û distîne, diaxive û dipirse. Ev her du pêkenokên li jêr mînak in ji rola lebat û tebat re. Di pêkenoka ewil de tebat e ango figuranê pêkenokê ye; di ya duyem de lebat e.

“Rojek Melayê Meşhûr li ber derê mala xwe cerê malê yê vala daye destê kurê xwe û jê ra weha gotîye:

-Kurê min ê xweşdivî, cêr bigire here kanîyê, tijî ava sar bike û bîne.

Paşê jî gotîye “çelp” û heta ku hêza wî hebûye şeqamek li şatika stûyê kurik xistîye û qirîyaye, gotîye:

-Tu cêr neşikînî, haaaa!

Cîranekî Melê jî hingê li ber derê mala xwe bûye û dîtîye ku Melê şeqam li kurê xwe xist. Mêrik ji wê yekê şaş bûye û deng li Melê kirîye, gotîye:

-Malava, kurik cêr neşikandîye, tewr hêj bi rê jî neketîye. Vêca çi sûcê wî hebû ku te ew şeqama bêîman lê xist!

Melê bişirîye û ji cîranê xwe ra gotîye:

-Divîya ku min nuha şeqam lêxista, da ku şîreta min di bîra xwe da bigire û dîqet bike, cêr neşikîne. Eger cêr bişikîne, hingê ez lê xim çi jê derdikeve!” (Bozarslan, 2004:62-63).

Di vê pêkenokê de lawê mela, xwedî roleke çalak e, di bûna bûyerê de para wî heye, dikare bê gotin ku wî pêkenok biriye heta dawî û radestî tîpê pêkenokê ‘mela’ kiriye.

“Rojekê Melle Nasredîn diçe paletiya xwe, ew kurê xweva. Jina wîya firavîna wî tîne, xaşîlê tîne. De îja ser xaşîlê, bê mene, rû digire. Kurê Melle Nasredîn tîne tê kevçî rûyê serî sar dixê, dike devê xwe. Kurê wî divêje:

-Inê, te çira xaşîl usa sarkirî mera aniye?

Melle Nasredîn dilê xweyî sax kevçî binra dike û dadiqurtîne.

Gewirya wîya dişewite û hêşir çewara tîn. Kurr divêje:

-Bavo, çira digrîyî?

Divê:

-Lawo, tu mirî, ez jî ser te digirîm.” (Cindî, 2009:110).

4.7.1.2. Jina Mela

Jinên melayan jî digel zilamên xwe ciyê xwe di pêkenokên kurdî de girtine. Karektera ku herî zêde di pêkenokên melayan de ciyê xwe girtiye, ev karakter e. Ji bo vê karakterê di pêkenokan de navên ‘jin’, ‘pîrek’, ‘xêzan’, ‘kilfet’ û ‘jinseyda’ hatine bikaranîn. Herçend di gelek pêkenokan de jineke melayan hebe jî, di hin pêkenokan de jî du, sê jinên melayan hene.

“Rojek xêzana Melê şorba nîskan pehtîye û bê ku bihêle sar bibe, kela-kel anîye daye ber’ê. Daxwaza jinikê ew bûye ku ew şorba germ devê Melê bişewitîne. Lê belê ji bo ku şûyê xwe gumandar neke, berê wê bi xwe kefçîyek li şorbê xistîye û kirîye devê xwe. Tebû devê wê şewitîye û ji ber wê şewatê histir ketine çavên wê. Melê gotîye qey jinik digirî. Semedê girîna wê pirsîye û gotîye:

-Jinê, Xwedê xêr ke, tu çima digirî?

Jinikê gotîye:

-Dîya min a rehmetî şorba nîskan pirr dievand. Nuha ew hat bîra min û ji derdê wê hêstir ketin çavên min.

Melê ji peyva xêzana xwe bawer kirîye. Wî jî kefçîyeke li wê şorba kelandî xistîye û firîqet kirîye devê xwe. Tebû devê wî jî şewitîye û histir ketine çavên wî jî. Vêca ji jinikê jê pirsîye, gotîye:

-Ê min, dîya min hat bîra min, loma ez girîyam. Lê gelo xêr e, tu çima digirî?

Melê gotîye:

-Ez jî digirîm ku çima di şûna wê dîya xwe ya bêyom da tu nemirî!” (Bozarslan, 2004:79-80).

Di pêkenokên ku jina mela hene de, ciyê ku jina mela lê dixuyê ‘mal’ e. Ew pirî caran li malê yan xwarinê çêdike, yan malê dide hev yan jî cilan dişo. Lê digel van karên navborî di hin pêkenokan de bi karê ‘olî’ jî radibe. Ew dersê dide keçên quranxwîn, ew miriyan dişo, xêr û xêratan belav dike. Herçend wekî karektereke lebat be jî di van pêkenokan de dîsa tîpê pêkenokê mela ye, ew karakter e.

“Jinike gundî, dimire. Jina melê cenazê dişû û melayê gund jî nimêja wê ya cenaze dike û wê vedşêrin. Piştî ku merasima veşartinê qediya, kurê jinikê ji melê pirsyar kir:

-Seyda rewşa diya min a wê dinyayê çawa ye, ji min re bibêje.

Mele dibêje:

-Kurê min ew cenazeya ku jinseydaya te şûştiye û seydayê te li ser de nimêj kiriye, ez hêvî dikim ku cihê wê esfelessafilîn e, înselleh!

-Xwedê ji te razî be, seyda.” (Bîngol, 2013:66).

4.7.1.3. Yara Mela

Digel jina mela, karektereke din a jin jî yara mela ye. Yara mela ew jin e ku ew mela bi hev şa dibin û hev dievînin yan ji dilê mela di wê de ye. Di pêkenokan de ev karakter wekî karektereke neyînî tê şayesandin. Pirî caran mela peywira xwe ya olî wekî hacetekê ji bo nêzikiya yara xwe bi kar tîne. Mela bi dek û dolaban carna yara xwe dike jina xwe, carna jî mêrê yara wî bi wan dihesê. Di vê pêkenokê de wekî tê dîtin herçend ew û jinika bî ne evîndar bin jî, dilê mela di wê de ye û mela mexsed û miraza xwe tîne cî.

“Mêrê jinikê dimire. Jinik diçe cem mele. Ji Mele re dibêje:

-Seyda mêrê min miriye. Ez jinek ciwan im. Ez ter û teze me. Ez dixwazim ji xwe re mêr bikim. Gelo ez yekî çawa bikim.

Mele dibêje:

-Ez ji te re bibêjim. Eger tu yê bi heqî bikî, feqî bike. Feqî ciwan in. Eger tu yê bi Ellah bikî, mela bike. Û ku tu bi min jî dikî, min bike: jinik jî wî dike.” (Akyol, 2005:7).

4.7.1.4. Melayên Din

Di van pêkenokan de melayeke tîpê pêkenokê ye, melayê/en din jî karakterê/en pêkenokê ye/ne. Bûyera di van pêkenokan de piranî li mizgeftê diqewime. Mijara van pêkenokan jî piranî ol û mijarên bi olê re eleqedar in. Carna mela dikevin qirika hev, carna jî alîkariya hev dikin. Ev pêkenoka ha di nav melayên hevpîşe de qewimiye.

“Li bajarê Amedê meleyê mizgefta mezin şîretan li mirovan dike. Ji wan re dibêje:

-Em mele jî dirist nîn in. Em dixwazin mirî pir bin. Em ji wan re bixwînin û diravan ji xwediyên wan bistînin. Em dixwazin tim em sela wan bixwînin. Dirav ji me re bin. Hişê me li ser mirî û xwendina bi diravan e.

Ew li wan şîretan dike. Melayek dikeve hewşa mizgeftê. Têdigihîje ku mirî tune. Ke-virê şuştinê vala ye. Dikeve hundirê mizgeftê. Ji devê derî mele bi tenê dibîne. Di ber xwe nade, ji mele re dibêje:

-Seyda qey ezraîl destûr stendiye? Naxebite.” (Akyol, 2005:73).

Herçend mela hempîşeyên hev bin jî, di bin re di nav çavên hevdu de pîvazan hûr dikan, mezelên hev dikolin û hesûdiyan dikan. Ev pêkenoka li jêr yek ji wan mînakên e.

“Dibêjin ku du melle bûbûn destbirakê hev, çawa tê gotin ku “mû di navbera wan re derbas nedibû.” Çendak derbas bûye agir bi xanîyê yekî ji wan ketiye û serobin kirîye, xelk bi temamî hatine serdan û berdilîya wî, û helbet di teqezeyên wisa de mirov çavnêrê dost û heval û destbirakên xwe ne, lê melleyê destbirak bi ser neket û ne jî pirsî. Çendak derbas bûye herdû melle li kûçekê pêrgî hev bûn. Melê xanişewitî ji hevalê xwe re got: Ho birawo, xanîyê min şewitî û mala min serobin bû, ma çima tu bi ser min neket?

Ev çi dostanî û destbiratîya kelê bû?! Mellê din lê vegerand û got: Xwedê li ser be seyda, min xwe ji bîra kiribû, de bixêr careke dîtir agir bi xanîyê te keve ez ê bêm.” (Heydo, 1996:30-31).

4.7.1.5. Feqiyên Mela

Feqî angû şagirdên melayan jî karakter in di van pêkenokan de. Feqî, li medreseye dimînin û li wir perwerde dibin û pêl bi pêl xwendina xwe dikan. Zinar, derbarê peyva feqî û hemwateyên wê de dibêje ku;

“Bêjeya feqî yan feqe xirabkirina bêjeya fîqha(şerîet) erebî ye ku li Kurdistanê dihate bikaranîn. Eynî sînonîm di kurdî de, çewa ku mamosteyê nemir Ehmedê Xanî di Nûbihara xwe de gotiye, şagird e. Lê bêjeya şagird çewa ku li hin hereman tenê ji feqiyên piçûk re dihate gotin, herweha ji feqiyên re ‘suxte’ jî dihate bikaranîn.” (1993:39).

Ji bo vî karakterî navên ‘feqî, feqe, suxte’ û ‘şagird/t’ hatine emilandin. Ew û seydayê xwe an li mêvanetiyekê ne, an li mizgeftê li ser dersê ne. Di vê pêkenoka xwarê de mela û feqî di dersê de ne.

“Rojekê dema mele dersê dide feqeyên xwe, yek ji wana destûrê dixwaze û dibêje: -Melayê min destûra te hebe, ez dixwazim derkevim der ve, ezê vê bêhnê vegerim. Mele dibêje qey tengav bûye, wê biçe avekê birijîne û were. Destûrê dide feqe û feqe derdikeve der ve. Lê bêhnek, du bêhn, sê bêhn derbas dibin, venagere. Li ber xelaseka dersê feqe tê û destûrê dixwaze, dikeve dersê. Mele meroq dike û dipirse ku çima dereng maye. Feqe dibêje:

Melayê min ez derketim der ve, min bihîst ku dûpişkê bi dayika min vedaye. Ez pêwîst bûm çûm serdana wê. Tu dizanî ku dûpişkên gundê me dijwar in. Dema bi yekî vedidin an bi bin xwe de dike, an jî dimre.

Mele, li ber feqe dikeve û dibêje:

- Qey dayika te mir?

Feqe dibêje :

- Na!

Hîn feqe gotina xwe dewam nekiriye Mele dibêje:

- Baş e, ya din nebêje. Me ya din fêhm kir, hema nebêje!” (Denîz, 2005:48-49).

Feqîti ji ber ku wekî asteke civatî di bin melatîyê re ye, feqî gelek caran pirsan ji melayê xwe dikin û mela jî bersiva wan dide. Ev pirs û bersiv didome heta ku mela wekî tîpê pêkenokê bi derbekê pêkenokê bi encam dike.

“Rojek Melê û feqîyên xwe rabûne bi rê ketine û berê xwe dane gundek. Feqîyên wî hemî peya meşîyane. Melê berepaş li kerê xwe siwar bûye û li pêşîya wan çûye. Feqîyên wî meraq kirine ku çima berepaş li kerê xwe siwar bûye û semedê wê yekê jê pirsîne. Melê weha bersiva wan daye:

Eger ez berepêş li kerê xwe siwar bibûma û li pêşîya we biçûma, hingê pey min dê biketa alîyê we û me'yê nekarîya em hev bibînin. Na, eger ez berepêş li kerê xwe siwar bibûma û li pey we bihatima, hingê jî dê pey we dê biketa alîyê min û dîsa me'yê hev nedîta. Aha ji bo ku berê min û we bikeve alîyê hev, min biryar da ku ez berpaş li kerê siwar bim û bidim pêşîya we.” (Bozarslan, 2004:39-40).

4.7.1.6. Cîranên Mela

Cîranên mela, cîranên bînav in; derbarê jiyan, kesayet û taybetiyên wan de agahiyên zêde nayên dayîn; ku taybetiyên mîna ‘çikûsî’, ‘diz’, ‘kêmaqîl’ û wd. hebin jî ew taybetî xwedî wateyekê ye di pêkenokê de. Pîrî caran ew û mela bi hev re diaxivin li ber deriyê malê, carna jî her du alî diçine serdana hevdu. Ji aliyê zayenda cîranên mela de dikare ev bê gotin, hem cîranên wî yên jin hem jî yên mîr wekî karakter hene di pêkenokan de.

“Dibêjin rojekê cîranekî Mele Nisredîn dinere ku Mele li hewşê li tiştêkî digere! Bang lê dike û dibêje:

-Cîran te xêr e, te çi wenda kiriye tu wisa lê digerî?
 -Min hungulîska xwe wenda kiriye.
 Cîranê Melê derbasî hewşê dibe û tê jê dipirse:
 -Ka te li ku wenda kir bibêje ez jî alî te lê bigerim!
 -Min li hundur wenda kiriye!
 -Mele, Xwedê ji te razî tiştê ku te li hundur wenda kiriye çima tu li derve lê digerî?
 -Hundur tarîbû loma ez li derve lê digerim!” (War, 2013 a:46).

4.7.1.7. Cimaeta Mela

Cimaet, karekterê sereke ya pêkenokên melayan e. Jixwe ew û mela rojê herî kêr pênç caran di wexta nimêjê de rûqalî hev tînin, bivê nevê di navbera wan de hin tişt rû didin. Herwekî ku di vê pêkenokê de jî diyar e, ciyê van qewimînan jî sedî nod û neh mizgeft e.

“Melakî di mizgeftê de wez dida. Di navberê de mela dît ku qismek ji cemaetê bawîş tîne wan, qismek bi xew ve çûne. Ji ber vê çendê mela weza xwe holê berdewam kir:

-Sibehekê ez derketibûm derveyî bajêr. Min li qeraxa çem ordekin dîtin, çar lingê wan hebûn;av vedixwarin.

Dema cemaetê ev gotina ordekan çar ling ji melê bihîstin, çavê xwe baş vekirin û li melê guhdarî kirin. Melê gotê wan:

-Yaw, ev hûn çi mirov in? Ev qederek bû ku min ji we re rastî digotin we li min guhdarî nedikir û hûn bi xew ve diçûn. Lê belê dema min dest bi virê kir, çavê we hemûyan vebû.” (Bîngol, 2013:153).

4.7.1.8. Hin Karakterên Din

Karakterên din jî ew karakter in, ku di pêkenokên melayan de wekî karakter hene, lê qewareya van pêkenokan li gor ên din kêmtir e. Ev karakter sofî, şêx, axa, xulam, dikandar, diz, zarokên cîran û taxê, mêvan, mazûvan, qazî, deyndar û diya mela ne. Ev karakter jî nayên şayesandin, yan navê wan derbas dibe yan jî ew digel tîpê pêkenokê diaxivin û tev digerin. Diya mela bi vî awayî bûye karekterê pêkenokê.

“Melle Nasirdîn diya wî pîr bû, emirê xwedê hat ser, diya wî mir. Melle Nasirdîn rabû diya xwe li kerê kir. Cinyazê diya xwe da pêşiya xwe, çû. Aşek kete pêşiyê. Rabû kera xwe girê da û bi xwe jî çû hundurê wî aşî. Ji aşvan ra got:

-Boy xwedê, kiloçekî lêxe ji diya min ra, birçî ye.

Aşvan go:

-Here diya xwe bîne.

Ewî go:

-Ez nikarim,- go,- xorto, xorto, kerema xwe, here bîne.

Gede çû gotê:

-Dayê, were em herin kiloçê bixwe.

Dîtin wekî cawê nade. Defek li kerê dan, û jinik ket. Dîtin jinik miriye û hatin gotin:

-Melle, diya te ser kerê miriye.

Ewî jî go:

-Wey li min, bavo, diya min kuştine. Ez xûnê dixwezim!

Avîtine şiriyatê, go:

-Diya min çar-pênc zarê wê hene, zarê wê hûr in, kes xwey nake. Ez dewa xûna diya xwe dikim. Ewê çaxê jî axa hebûn. Hatin, ser xûna diya wî birîn - sed pez. Diya xwe veşart, sed pezê xwe jî hilda, hate mala xwe.

Xelq hat pêşiyê, go:

-Melle Nasirdîn, te ev pez ji ku aniye?

Go:

-Min diya xwe kuşt, ev pez jî anî.

Go:

-Ji kê derê?

Go:

-Ber devê berê⁷⁷, -go, -diya we kî pîr e bivin bavên hundurê berê, wê wera pêz derxe.

Xelqê rabû, herçê diya wan pîr bû dane pêşiya xwe, çûne devê berê, avîtine berê.

Xêlek şûn da gazî kirin:

-Dayê, de were..., -ê wê ji ku bên?

Vegeryan, Melle ra gotin:

-Melle, xwedê mala te xirav bike, ha-ha qewimî.

⁷⁷ Ber devê berê: Ber devê behrê.

-E,-go:

- *Diya we qurbana we bin, de bera banyana, kulê ketibûn?*” (Cindî, 2009:100).

Li gundan di rêvebirina gund de, mela alîgirên axa; di rêvebirina eşîran de jî digel serokeşîran in. Pîrî caran mela gotina axa û serokeşîr ji aliyê dînê ve piştrast dike û berginda vê qenciya wan jî zikata mal û milkê van dewlemendan e. Axa jî bûne karakterên pêkenokên melayan. Pêkenoka axa û seyda wisa ye:

“Rojekê axayê gund bangî mele dike û jê dipirse:

-Seyda ezbenî! Şeytan dibêje hema îsal zekata malê xwe nede tu kesî.

Seyda dihizire. Ger axa zekatê nedê, dê birçî bimîne. weha bersivê dide axayê gund.

–Xwedê jê razî ma mirov tu car bi gotina şeytan dike. Zekat ferz e û bi ya şeytan neke.

Çend roj di ser vê sohbetê re derbas dibin axayê gund careke din bangî mele dike û jê re dibêje:

-Seyda ez xulam. Şeytan dibêje hema îsal zekata malê xwe tevî bide seyda.

Seyda hinekî difikire, riya xwe difirkîne û dibêje:

-Bi rastî Şeytan jî melaîketekî Xwedê ye. Mirov dikare carna bi ya wî jî bike.” (Aza-diya Welat, 2016).

4.7.1.9. Karakterên Bênav

Ev karakter jî ne xwedî navekî ne. Di pêkenokan de bi navên **‘xelk, yek, zilamek, gundiye’** û **‘jinekek’** derbas dibin. Di vê pêkenokê de karakter ‘zilamek’ e.

“Carek Melê çûye bajarek. Dema ki di sûka wî bajarî da gerîyaye, zilamek deng lê kirîye û jê pirsîye, gotîye:

-Birako, gelo îro çi roj e?

Melê gotîye:

-Bibûre, ez ne ji vî bajarî me; ez rojên vî bajarî nizanim.” (Bozarslan, 2004:25)

Hin caran jî em hebûna van karakterên bênav bi saya lêkeran hîn dibin. Rastest peyvek ji bo van karakterên bênav nayê bikaranîn, lê dîsa jî hebûna wan dixuyê.

“Rojek ji Melê pirsîne, gotine:

- Dema mirov di golek da yan di liçek da xwe bişo yan avjenî bike, gelo divê mirov berê xwe bide kîjan alî?

Melê gotîye:

-Cilên mirov li kêderê bin, divê mirov berê xwe bide wî alî.” (Bozarslan, 2004:25).

Bi saya van her du lêkeran **-pîrsîne, gotîne-** hebûna van karakterên bînav dixuyê. Dîsa bi peyva **‘mîrov’** wateyeke giştî û nenas li pêkenokê bar bûye.

4.7.2. Karakterên Ajal

Ajal nêzîktirîn candar e ku têkîliya wan bi mirovan re hene. Bi taybet piştî kedîkirina ajalan ev têkilî zêdetir bûye û bi hezar salan e ku didome. Ajal digel cureyên din ên edebiyata gelêrî di pêkenokan de jî dixuyên. “Dema qala qadroya şexsên di pêkenokan de tê kirin, divê em mirovan tenê nefikirin. Di çîrokeke gelêrî, destan û romanekê de carna ajalên wisa hene ku ji kesên dekoratîf bêhtir xwedî rolekî ne û mihetabê leheng bi xwe ne.” (Boyras, 1996:79).

Ciyê pêkenokên kurdî ji ber ku piranî gund in, bivê nevê hebûna ajalên karakter di pêkenokan de jî zêde ye. Piraniya karakterên ajal, ajalên kedî ne, kêmbê jî, ajalên kovî jî hene. Di vê pêkenoka han de du ajalên karakter hene; yek ajaleke kovî ye (teyr), a din jî kedî (mirîşk) ye.

“Li gundekî teyrê qesidîbû mirîşkên gund. Rojê du sê mirîşk dixwarin û gundî li hemberî êrîşên teyr bêçare mabûn. Rabûn berê xwe dane cem meleyê gund û gotin:

-Mele ji me re çare û hêviyekê bibîne.

-Ezbenî ew jî tebayekî Xwedê ye ku qismetê xwe dixwe. Çendak derbas bû rojekê ew teyrê nêçîrvan rastî mirîşka melê hat, nêçîra xwe hilanî û firîya çû. Melê gazî gundiyan kir û got: “Ev teyrê hanê qetla wî helal bûye. Hûn wî ji min re bigirin.”

Gundiyan tevî jin, mêr, keç û kurên xwe dane piştî teyr, ha li vir û ha li wir lê geriyan û teyrê nêçîrvan zêft kirin. Melê got: “Ezbenî ka wî ji min re bînin.”

Teyr anîn ber destê mele, mele hişk bi qirika teyr girt, hêdîka şaşîka xwe ji serê xwe kir û terîşek ji şaşîka xwe jêkir û bi lingê teyr ve girêda. Dûvre teyr berda. Gundi şaş mabûn, gotin: “Xoce ma te çima wisa kir? Me ew qasî tehb û eziyet xwar ji bo em wî teyrî zêft bikin. Te çima ew berda?” Xoce got: “Ezbenî ev îş ne îşê we ye, hûn dev jê berdin. Min mala wî xerakir. Heta emrê wî hebe ewê çavê wî li deriyê xelkê be.” (Sadîni, 2012:162).

Di hin pêkenokan de karektereke ajal tenê heye, di hinan de du sê heb hene. Di piraniya pêkenokan de ajalek tenê heye. Di vê pêkenokê de, du karekter hene: Gur û ker.

“Rojek ji rojan Mele Nisredîn li kerê xwe siwar e û berê xwe daye Deşta Mûşê, bi riyekê ve diçe. Hema carekê xewn ramana mirinê dike û xwe ji ser kurtanê kerê davêje erdê û li keviya rê xwe pîj dike, herwekî ku miribe xwe bêrih dike. Wê demê gurek jî tê, kerê wî dike û dixwo. Melê hêdîka di ber xwe de dibêje: “Herê Guroooo, herê Guro! Pa tu jî dizanî ku Mele Nisredîn miriye û tu hatî kerê wî dixwî. Bila wisan be, heta ez ji vê mirinê rabim, ez ê ji te re zanibim...” (Zinar, 2017).

Ajalên ku bûne karekterên pêkenokên melayan ev in:

4.7.2.1. Ker

Di pêkenokên melayan de, ji karekterên ajal para herî mezin a kerê ye. Bi taybetî di pêkenokên Mela Nesredîn û Mela Meşhûr de, mirov pir û pir rastî vê karekterê tê. Ev karekter bûye parçeyekî pêkenokên wan. Di vê pêkenokê de tê dîtin ku kerê mela heye û rojekê wenda dibe.

“Rojek kerê Melê winda bûye. Melê ji alîyek ve li kerê xwe gerîyaye, ji alîyek ve jî her ku gavek avêtîye ji Xwedê ra şikir kirîye û gotîye:

-Şikir ji Xwedê ra, şikir ji Xwedê ra, şikir ji Xwedê ra.

Xelk ji wê yekê şaş bûye û pirsîye:

-Mela, ne kerê te winda bûye. Ma ev tiştê baş e ku tu ji Xwedê ra şikir dikî!

Melê gotîye:

-Ez ji Xwedê ra şikir dikim ku di dema windabûnê da ez li kerê xwe ne siwar bûm.

Eger hingê ez lê siwar bûma, ez jî dê digel wî winda bibûma.” (Bozarslan, 2004:25).

